PEYAMA kurd

Hejmar 50 | 19.08.2005

Kurdish weekly newspaper

Abîde Kurdistanek azad û serbixwe

Nûrî Dêrsimî: TOLHILDAN! TOLHILDAN! TOLHILDAN!..



Rûpel 14



Çima Navenda PENa Kurd ne li Kurdistana azad be!?

Selwa Gulî

Rûpel 10

‚Em jibo mafên Kurdan derneketine‘

■ Orhan Dogan di hev-peyvîna xwe ya di 15ê mehê de bi rojnameya Tirk Radikal re kir îdia dike ku gava dem hat wê Abdullah Öcalan serbest bê berdan.



Rûpel 4

Li Sûriyê şoreşa modê Rûpel 2

Koroya muzîka Xanimên Amedê ranaweste Rûpel 3

Kurdan Düsseldor de rejimî Îran protesto kerd Rûpel 15

Bela zivistana we kesk û sor be!



Rûpel 13

D 1.50 EUR, A 1.70 EUR, B 1.70 EUR, NL 1.70 EUR, CH 2.60 SFR
LUX 1.70 EUR, I 1.70 EUR, S 19.00 SKR, DK 14.00 DKR,
N 16.00 NOK, GB 1.10 £, GR 1,70 EUR

4 196577 401503 50



Erdogan li Diyarbekirê starta berdana Evdila Öcalan da...

Ew Erdoganê ku beriya çend mehan li Norveçê gotibû “Li Tirkîyê kêşeya Kurd nîne”, jiber hin sedeman çû Diyarbekirê û got ku, “Kêşeya Kurd, kêşeya me ye”...

Ew Kurdên me yên mejîdagirkirî ku baweriya xwe pir bi Tirkan tînin û naxwazin ji sîstema wan ya kolonî derkevin û bi tenê doza hinek merhametê li wan dikin nişkava dest bi şahiyê kirin û jibo Erdogan çepik lêdan.

Rûpel 7

Hin qaîdeyên jiyanê

PK - Jibo ku mirov fam bike ku ezman li herderê şine, pêwîst nake ku li seranserê dinyê bigere.

Binêre, lê tiştê ku tu lê dinere bibîne.

Nebe ew kesê ku valahiyekê dadigire, bibe ew kesê ku cihê wî nayê dagirtin.

Jiher tiştê ku tu dibihîze bawer meke, hemû tiştên ku di destê tede ye xerc meke û qasî ku dixwaze ranezê.

Bi bawerî bibêje, „Ez ji te hez dikim."

Wexta te lêborîn xwest li çavê mirov binêre.

Qet henekê xwe bi xeyalên kesî neke.

Berî ku tu bizewicî bi kêmasî şeş mehan dergistî bimîne.

Dilê te gelekî tê şikestin û tu liber xwe dikevî. Lê bi her dilşkestinekê tu jiyanê çêtir nasdikî.

Bi lihevnekirinan re bi merdî têbikoşe.

Ji axaftinên ku di derbarê mirovan de tê kirin bawer neke û biryaran negire.

Ger tu mirovan darizînî, tuyê jibo hezkirina wan wextê nebînî.

Bide, netirse û bistîne şerm neke.

Gava te tiştek da yekî wî neêşîne.

Hêdî biaxive, lê zû bifikire.

Qet jibîr neke ku her evînek mezin an hewldanek mezin xwediyê riskên mezin in.

Ger te winda kir, aqlê xwe jî pê re winda neke.

Xweditiyê li şaşiyên xwe bike, wan bincilkirî neke ku firseta te ya dersgirtinê çêbibe.

Bi kesekî/ê ku tu pê re ji axaftinê hez dikî bizewice. Di salên pêşiyê de tê gelekî mihtacî hevalekî/ê bibî.

Diya xwe ihmal neke; lê bigere û hezkirina xwe jê re veneşêre.

Jibîr neke ku carna bêdengî çêtirîn bersive.

Gava te bi dost û hezkiriyên xwe re nîqaş kir, tenê di wê demê de bimîne, tiştên berê bûyî tevlihev neke.

Di nivîsan de ne tenê tiştên eşkere hatine gotin bibîne, hewl bide ku yên ne veşartî jî bibîne.

Zanyarî mirov ji şikan, qencî ji êşan, biryarî ji tirsê rizgar dike.

Bifikire, wê te bi hêztir bike.

Ji yarê xweyê ku wexta di ramûsanê de çavê xwe nagire bitirse.

Bêsînor hez bike, di her dilekî de bibe gulek.

Çi ji dilê te derbas dibe wê bike. Xwezayî be.

Bextewarî ne jiyanek bê astenge, lê qebîliyeta bi wan re têkoşîn e.

Jibo kenînê li benda çîrokan nemîne. Ligel hemû serêşiyên xwe ve jiyan bi xwe bextewariye û pê şa bibe.

Li Sûriyê şoreşa modê



PK (Şam) - Li Sûriyê jî Top Modelî destpêkir. Li gor lihevhatinê wê Top Modelên Sûriyê mayo û bîkînî lixwe nekin.

Ev cara yekemîn e ku li Sûriyê Pêşbirka Top Modeliyê çêdibe û16 fînalîstên model derketin pêşberî çapemeniyê. 16 fînalîstên ku di otêla Şeraton a Şamê de ji nav 450 berendaman hatin hilbihartin, xwe amadeyî fînala mezin a 14.12.2005an dikin. Midûrê şîrketa organîzasyona pêşbirkê Enver Beytûnî dibêje" wê ev 16 fînalîst di pêşbirkên navnetewî de mayo û bîkînî lixwe nekin. Pêşbirka Top Modeliyê ji Sûriyê re xerîb e. Me ev pêşbirk ji Ewrûpayê anî û me ew li gor urf û adetên Sûriyê hûna. Wê ev pêşbirk di salên pêş de jî her berdewam bikin. Armanca me eve ku em çand û hunera Sûriyê bi dinyayê bidin naskirin. Ev 16 fînalîstên me her yek bi kêmanî du zimanan dizanin. Gava fînalîst ketin pêşbirkê me yeko yeko ji malbata wan destûr xwest".

Keçên ku beşdarî pêşbirka Top Modeliyê bûne kêfxweşiya xwe tînin zimên û dibêjin "Emê bi vê organîzasyonê modernbûna dewleta Sûriyê pêş dinyayê bikin. Heger em di pêşbirka navnetewî de yekemîn derkevin, wê dinya modernî û jîrekiya keçên Sûriyê bibînin".

Wê di jûriya pêşbirka fînala mezin de nûnerên Sûriyê, Tirkiyê,Fransa, Rûsya, Almanya, Misir û Hindîstanê beşdar bibin.

Jin di nav nivînan de çi ji mêran dixwazin



PK - Pirtûkek bi navê "Jibo evîndaran alîkariya pêşîn" li Almanya ji aliyê Weşanên Knaur ve hat weşandin. Pirtûk, hêviyên ku jin di nava nivînan de ji mêrên xwe dikin û hestên wan dinivîse.

Pirtûk, li bersîva pirsa hemû mêran ya ku dibêjin, "Gelo ez di nav nivînan de çawa me?" dikole û hêviyên jinan yên ji mêran wiha bi rêz dike:

Mêr divê ji bihevşabûna pêşîn kêfê bistîne, lê ne pêwiste ku programekê tetbîq bike.

Di dema seksê de dengê kêfxweşiyê derxe, lê ne qebe be. Mesele mêr dikare peyvên wiha xweş bike: " Ez ji te zewqek mezin distînim. Temama bedena te lihevhatî ye." Lê ji peyvên ku dikare dilê jinê bihêle û wê sar bike bireve.

Di dema seksê de divê mêr çavên xwe nîvvekirî bihêle. Jin ji çavên bi temamî girtî an vekirî aciz dibin.

Divê hisa lezkirinê bi jinê re çênebe. Peyvên mîna, "Pîyê min tevizî, an piyê min ji cîh derket" neyên gotin.

Divê mêr ji jinê re eşkere bike ku dixwaze seksê bike, ne ku tenê jibo parastina parsenga bedena xwe karekî bicîh tîne.

Divê mêr jibîr nekin ku jin ligora rojên xwe yên adetê carna ji bihevşabûna nerm û carna jî ji ya hişk û dijwar zewqê distînin.

Herkes çayê vedixwe,lê..

PK - Gelo heta niha kî ji me Kurdan liser wateya ku çay di jiyana me de dileyize fikiriye. Gava ku mêvanek tê mala me, piştî bixêrhatinê, pirsên hal û xatir, karê yekem belkî çêkirina çayekê ye. Ma li derve jî ne wiha ye? Li qehweyan ji sibê heta evarî em çay ji hevdû re îkram dikin.

Geh em nerazîbûna xwe ji çaya mala ku em lê rûniştine dikin, geh em pesnê wê didin.

Belê, çay perçeyek ji jiyana me Kurdan e. Li Kurdistanê hejmara tiryakiyên çayê belkî bi qasî yên cigarekêşan be.

Başe gelo çayek xweş divê çawa bê demkirin?

Wexta demkirina çayek bi tahm 5-6 deqîqe ye. Piştî wê demê madeya di çayê de tenîn, xwe bera nav çayê dide û tahma wê him tal dike û him jî reş dike. Tiştekî din ya girîng ava çayê ye. Çêtirîn çay, jiber ku di warê mîneralan de gelekî dewlemende bi avên kaniyan çêdibe.

De ka ji niha ve biceribînin û ferqa çaya ku we heta niha çêdikir û ya wê hûnê ji îro pêve çêbikin bibînin..

Xwedî û Damezirên Rojnameyê: Bayram Ayaz, Veysi Efe, Peyama Kurd Verlag

Editor: Ahmed Zeki Okcuoglu

Alikarê Editor: Nizar Caf

Redaksiyon: Fadil Özçelik, Hêvîdar Zana, Loqman Berzenci Mansûr, Sîdqî, Mistafa Çwartayî, Nizar Caf, Seyîdxan Kûrd, Silêmanê Alîxan, Pirkemal, Rezan Diyar, Vînûs Fayiq

Navnîşan: Peyama Kurd, Thomas-Mann-Str. 22, 53111 Bonn / Germany

Fon: +49 (0228) 18 00 654, +49 (0228) 18 00 655

Faks: +49 (0228) 18 00 656

www.peyama-kurd.com

info@peyama-kurd.com

Têbinî: Peyama Kurd xwe mafdar dibîne, ku nivîsên jê re tên şandin, kurt bike. Ew ji aliyê rêzîman û rastnivîsînê de di serrastkirina berheman de azad e. Berhemên ku ji bo Peyama Kurdî tên şandin heke li cîyekî din hatibin weşandin, nayên çapkirin.

Di 6 mehan de 69 hezar tûrîst Wan ziyaret kirin



PK - Li gor agahdariyên serokê Acenteya Wan Zeysin Tûrîzm Ertan Zeytan di 6 mehên sala 2005an de 69 hezar tûrîst bajarê Wanê ziyaret kirin. Ji van 63 hezar tûrîstî ji Tirkiyê û 6 hezar jî ji welatên wek Koreya Başur, Brîtaniya, Japonya û Fransa ne.

Zeytan eşkere kir ku hejmara tûrîstên di sala 2004an de hatine Wanê 14 hezar e.

Tûrîstên tên Wanê kelehên Wan, Xoşav û Çavûştepe, Girava Akdamar, Mala pisîkên Wanê, Goristana Gevaş Selçûkiyan û Tirbeya Halîme Xatûn ziyaret dikin.

Lê tûrîstên tên bajêr gazindên xwe ji bêxwedîtî û gemariya cîhên dîrokî dikin.

Li aliyê din ve xebatên Enstîtuya Arkeolojî ya Avrasya girêdayî Universiteya Stenbûlê ku ji sala 1998an û virde lêkolînan dike encam da. Arkeolog rastî depoya erzakên Ûrartûyan gatin. Di depoyê de 100 kûpên xwarinê û gelek alavên metbaxê hate dîtin.

Avjenî ne bi dorê lê bi pere ye

PK - Li Hekkarî yekem hawiz ji aliyê zarokên bajêr ve vala namîne. Di kelkela germa havînê de zarokên ku perê wan hebe xwe di avê de hênik dikin, yên bê pere tenê tên li dora zarokên ku wê têkevin hawiz dinêrin, hustê xwe duxrînin û bêrê xwe didin malê an dereke din.

Ev rewş bandorek neyênî liser zarokên bê pere dike.

Di 35 derece germiyê de zarok 2 lîre didin û bi saetan xwe di nav avê de hênik dikin û demek xweş diborînin.

Hawizê zarokan 6 rojan vekirî ye.

Dijmanatiya 3 salan bi dawî hat

PK - Ji nuha û 3 sal berê di navbera gundên Abdiçikmaz û Özdilek girêdayî navçeya Hamûr bajarê Agirî, jiber lihevdunekirina erd pevçûnek çêbûbû û sê kes birîndar bûbûn. Dijminatiya ku sê sal berê bi vî awayî destpêkir di 13ê mehê de bi xwarinek lihevduhatinê bi dawî hat.

Terefên herdu aliyan li bajarê Agirî li hevdu civiyan û li hevdu hatin.

Mêvanên beşdarî xwarina wan bûn hêvîkirin ku carek din dijminatî xwe dubare neke û her di nav aştiyê de bijîn.

Koroya muzîka Xanimên Amedê ranaweste

PK - Li Amedê yekem koroya muzîkê ya jinan jibo ku konserê bide bê rawestandin xebata xwe dom dike. Berpirsiyara Mala jinan Kardelen Çaglar Demirel eşkere kir ku jibo qebîlîyetên jinan derxin ortê bê pere xizmeta şêwirgeriya civakî, aborî û tendurîstî didin jinan.

Mala jinan Kardelen li Amedê di bunya Belediya Baglarê de dixebite. Jinên ku cara yekem bi koroyek muzîkê hatin gel hevdu 1.5 meh di perwerdeyiya nota de derbas bûn û niha dest bi xwendina stranên Kurdî û Tirkî kirin.

Jinên ku bi alîkariya mamosteyan bê pere perwerde dibin jibo ku di çalakiyan de konsera bidin xebatên xwe didomînin.

Koroya jinên Amedî ji 21 kesan pêk tê û di nav wan de kesên ku neçûne mektebê jî û yên ku unîversîte qedandine jî hene.





Panorama

Dilbixwîn Dara

Ezberekirina Stranan

Wê rojê ez li ber ekranên televîzyonê bûm. Di wan kanalên kurdî de gelek programên ku ne hêjayî temaşekirinê ne hene. Gelek kesên ku nizanin li kamerayan binêrin, nizanin baş bi kurdî bixwînin, nikarin bi mêvanên xwe re bi rihetî bidin û bistînin, pirsên xwe ji bîr dikin, pirsan di cih de nakin... pirsên ku dikin jî guh nadin bersivan... û hwd., têne dîtin.

Jixwe spikerên kurmancî, hinek ji wan hene "nêr" û "mê" ji hev nakin der. Rêziman tevlîhev dikin. Ez heta niha jî fêm nakim, ew kes çima ranabin ji xwe re li karekî din nagerin.

Di wan ekranan de hinek bûyerên din jî hene gelekî balkêş in.

We qet tu caran dîtiye ku stranbêjekî/ê belkî sed carî stranek gotibe, lê dema ku derkeve pêşiya ekranê, û strana xwe ezber nekiribe?! Dema ku ezber nekiribe çi dibe?

Mixabin gelek stranbêjên me wiha ne.

Hinek ji wan hene belkî bi dehcaran stranek gotine, belkî ji sed carî zêdetir di şev û meşan de pêşkêş kirine û temaşevanan li wan vegerandine, weke neqeratekê dubare kirine, lê hîn jî dema ku derdikevin hember kamerayê, ji deftera li pêşiya xwe dixwînin. Mirov destpêkê texmîn dike ku di wê defterê notaya stranê hatibe nivîsandin, lê ne wiha ye. Ew ji wê defterê strana neezberkirî dixwînin.

Ez hîn jî li pêşiya ekranê me, bi meraq ji kanalekê diçim ya din, kanalan li pey hev diguherim. Di televîzyonên cîhanê de bûyerên pir giring hene, li Kurdistanê pirsa Kerkûk, Destûr, Federasyon û Pêşmergeyan tê gotûbêjkirin... Ereb bi Sunnî û Şîîyên xwe ve, di rojname, radyo û televîzyonên xwe de dest bi gotûbêjan kirine û dîjîtiya xwe li hember federasyona Kurdan tînin ziman, lê televîzyonên me?

Tu kijanê vedikî, yan filmeke li ser heywanên Efrîqa dibînî, yan klîpeke bi kameraya VHS kişandî, yan jî daweteke li seyrangehekê derdikeve pêşiya te... tiştekî seyre ne!

Li dawiyê ez biryara temaşekirina televîzyona Mezopotamya didim. Hunermendeke me, bi kinçên kurdî li ser sehneyê ye û konserekê pêşkêş dike.

Stranên Mihemed Şêxo dibêje. Belkî ev ji deh salan zêdetire ku ew wê stranê distirê. Lê ez çi bibînim, hîn jî xwe nêzîkî defterê dike û ji wir strana „Kurdistana delalim, her kes tê min dixwaze..." dixwîne. Hema piştre hunermendeke din derdikeve, strana ku gotin yên wê ne ji bîr dike ezbere bixwîne, ew jî ji defterê dixwîne.

Diçim ser kanaleke din, piştî nivsatekê careke din li Mezopotamya vedigerim, vê carê hozanekî dibînim, por, simbêl û biriyên xwe weke teniyê reş boyax kirine... wî jî defterek daye ber xwe û dest pê kiriye strana „Stûna Kona Min koçerê..." jî defterê distirê. Şaşxwendin jî li aliyekî, di wan stranan de mirov li hevokeke rast jî rast nayê.

Bi dehan nimûneyên wiha hene, stranbêjên me nikarin stranên xwe ezber bikin. Stranên ku bi xwe çêkirine û melodiya wan danîne, nayê bîra wan, nikarin nakaratan jî durust dubare bikin.

Bûyerên wiha dema ku ez li Med û Medya TV bûm di serê min re derbas bûne, min dîtiye çawa hozanek berî ku derkeve ser sehnê, ji bo ku bixêrhatina mêvanan bike, li ser kefa destê xwe dinivisîne. Nikare bê ku bixwîne, bi çar gotinan ji mêvanên xwe re bibêje „hûn bixêr hatin."

Ezberekirina stranan cidîyeta hozan diyar dike. Hozanekî/e ku nikaribe stranên xwe ezbere bike û her cara ku derkete ser sehnê ji defterê bixwîne, ew baweriya mirov bi xwe zeîf dike. Stran, çiqas ezber were xwendin, ewqas mirov dikare ji dil û bi kêf lê guhdarî bike.

Mixabin piraniya stranbêjên me di vê rewşê de ne. Di xwe re nabînin çend saatan li ser stranekê rûnin û ezbere bikin. Jixwe gelek caran ji bo ku neyê fêmkirin di pozê xwe de dixwînin, weke ku bibêjin, ez çi bixwînim jî, ji guhdaran re ferq nake, ha min gotiye "Çi gundekî di kortê de" yan jî min gotiye "Çi korteke di gundê de..." ha min gotiye "Zûke... Zûke çavreş zûke..." yan jî min gotiye "Bûke... bûke çavreş bûke..."



Nejdet Buldan

DÎMENEK NOSTALJÎKÎ

Meha Tebaxê ye. Em dibêjînê 'çillê havînê'. Dema herî germ ya gund û gelîyên me ye. Li gundan dema gehiştina fêqî, dirûna gîya ye. Rêncber û pale li gundan in, xîha xwe vedimalin.. Em çend kesên betal û bêşol jî li zozanan, li geşt û seyranan in. Bi gotineke dî, karê me yê bêkaran e. Dema herî xweş ya waran, zozan e. Gund û gelî german da qirqijin, zozan hînik û şevê sar e.

Emê liser Geran*. Liser Geran zozana Satîyan e. Emê liser banê dinya yê. Reşmalê** me yê li mêrgê, mêrge li rexê gerê ye. Pişta me yê li kevîyeke befrê, pêşîya me mêrgeke kesk û gûlgûlî ye. Kulilkên mêrgê beybûn in. Şerê rengê beybûnan û rengê mêrgê ya kesk e. Belê kesk serkeftî ye. Kesk û eflatûn bihev ra ne.

Mêrge yê li rexê Gera Mezin. Li nêzûkatîyan ava gerê zelal e, rengê avê ye. Belê, heke mirov sed metran ji gerê dûr bikevît, ji kulavêyên*** hindava gerê berê xwe bidetê, ger şîn e. Şînê esmanî. Mirov dikare bêjît, ger esmane, keskatîya mêrgê û şînahîya gerê dinav yêk da ne. Esman li erdê ye. Parçeyek evr li esmani çinîn e. Esmanê sahî, mêrga kesk, gera mend. Car caran bayek nizim geh li jor û geh li jêr têt, tenê bêhna kulilkan tînit. Her sûyeke ba, ji bêhna kulilkan tejî ye.

Roj, dinava rengê xwe da xelîyaye. Esman şîn û zer e.

Dema mirov diçe serê zinarekê û berê xwe dide dinyayê, hemu Kurdistane û sê dewlet. Berê min yê li başûr. Gelek çîya ji serî heta nîvekê dîyarin. Dol û nihalên wan tarî ne. Hem dûrin bixuman in, hem jî jiber daristanan. Çîyayên nêzûk keskên tarî, yên dûr reşin. Herêma Doskîyan, Mizûrîyan û qismek Barzan dîyarin.

Hêdî hêdî ber bi rojhelat ve dizivirim. Deşta Berazgir, Çîyayê Govendê û herêma Zerzan. Eşîretên Herkî û Gerdîyan yên li bakur li vê herêmê dijîn. Kuncikê sê dewletan. Belê muxabin Çarçelê Herkîyan pêşîya minê girtî. Heke sînorê sê dewletan gelek dûr nîn e. Kevîyên befrê dinava çelên Çarçelan da ne xelîyane. Çarçelan bêrexme, belê dibêjin dema Mela Mistefa û hevalên wî meha Adarê, dinava befir û bagerê da jê derbaz buyî, Çarçel gelek bi însaf bû.

Berê min yê li bakur. Deşta Geverê, Sipîrêzê Dirîyan, li pişt Sipîrêz paşê rojhelata Kurdistanê. Mirgever, Tirgever, Deşta Urumîyê û ya Biradostan-Şikakan. Tenê şînkatî li Deşta Geverê dîyar e. Sipîrêz bêdar û bêşînkatî ye.

Dizivirime rojava. Kêlîya Şîn, Reşko ewqas nêzûkêni tû dê bêjî hema li ber singê te ne. Serê Reşko dîsa bi mij û duman e. Mina şaşikeke sipî. Ji xwe befra wê jî ya sedan salan dîyare ku dibêjinê Kevîye pîra Simaqe. Başurê Reşko, Cêlo ye. Cîhê Feleyî yê, berê heft heşt gundên Asurîyan lê bûn. Reşko bêdar e, rûse e. Çîyayên herêma Cêlo heta nîvekê bidar û daristan, paşê şax û zinarên asê ne.

Ez westîyam lê belê, ez ji van dîmenane têr nebûm.

*Ger: Golên avê

**Reşmal: Kone, bi mûyê bizinan têne raçandin

***Kulave: Şax û zinarên çîya, yên bi tenê

Em jibo mafên Kurdan derneketine



Di 15ê mehê de di rojnameya Radîkal de Orhan Dogan di mijarên PKKê, pirsa Kurdî, siyaseta Tirkiyê de pirsên rojnamevan Neşe Düzel bersîvand. Dogan di mijara serbest berdana Öcalan de îdia dike ku gava dem hat wê Abdullah Öcalan serbest bê berdan. Dogan pirsa Neşe Düzel, „Baş e PKK difikire ku bi şantaja terorê dikare Öcalan serbest bide berdan?" weha dibersivîne: "Ew çi difikirin nizanim lê ez vêya dibêjim. Tê zanîn ku gava dem hat wê Öcalan serbest bê berdan. Gava wexta wê hat muhtemele ku wê serbest bimîne. Gava Hikmet Sami Türk wezîrê edaletê bû ev eşkere kir. Piştî rakirina îdamê bû, wî got: 'Ger aşîtiya civakî ji me avêtina gavek weha bixwaze, em dikarin azadbûna Öcalan jî bixwazin.'

Dogan li gelê Kurd û hemû gelên mayîn navê civaka Tirkiyê dike û dibêje: "Divê civaka Tirkiyê bi wateya hissî ji bona vêya bê hazirkirin. Îro AK Partî xwediyê awantajek mezin e," Bi berdewamî Dogan jî wek Öcalan bê ku navê dayikên Kurd bîne ser zimanê xwe dayikên leşkerên dewleta Tirk bi "dayikên şehîd" binavdike û dibêje: "Li pişt wê ji dayikên şehîdan heta me pişgiriya herkesî heye." Dogan di pêvajoya hevpeyvîna xwe de "xwe" jî bi pirsa, "Bizava we ya Civaka Demokratîk jibo gelê Kurd çi dixwaze?" weha tarîf dike û vekirî îfade dike ku ew jibo Kurdan tu tiştekî naxwaze: "Em tenê jibo parastina mafê kurdan, jibo ku bibin partiyek tenê hîtabî herêmê dike derneketin ortê. Li Tirkiyê siyaseta etnîkî êdî ne siyasetek nûjen (modern) e. Em himbêza xwe ji her mirovekî Tirkiyê, ji her bihustek erdê Tirkiyê re vedikin."

Dogan hewl dide ku artêşa Tirk ji kiryarên xwe yên li Kurdistanê paqij bike û her siyaseta hikûmetan rexne dike. Di derbarê jinûvedestpêkirina şer Dogan dibêje: "Ev şeş salbû ku herdu hêzan şer nedikirin. PKK êrîşî artêşê û artêşê jî êrîşî PKKê nedikir. Artêş li qereqolan disekinî, dernediket operasyonan. Lê hêzek ne operasyonî derket ortê û dest bi taciziyê kir, artêş û PKK xist nav şer. Ev rewş di bin berpirsiyariya AK Partî de dest pê kir. Di nav dewletê de û di nav Kurdan de hin hêzên ku ji statuko û şer xwe xwedî dikin hene. Hêzên kûr, pevçûnan provoke dike, dixwaze ku şer kûr bike. Dibe ku ev hêz li dervî PKK, Öcalan û serpiriştiya artêşê be."

Dogan ji aliyekî bi îsrar, eşkere û samîmî xwe wek terefekî Tirkiyê îlan dike, ji aliyê din ve wek berdevkekî liser navê Kurdan diaxive lê li ciyê ku hewce dike peyva "welatparêz" naxwaze ji devê xwe derxe.

Rêxistinên Kurdistanî doza serxwebûnê kirin



PK (Duhok) - Bi hezaran welatîyên parêzgeha Duhokê di xwepêşandana ku tevgera referandûmê birêxistîbû de daxwaza çespandina serxwebûna mafê gelê Kurd kirin û herweha çespandina sinorên herêma Kurdistanê, belavkirina samanên Îraqê di navbera hikûmeta navendî û hikûmeta herêma Kurdistanê de û çareserkirina pirsa Kerkûkê û herweha pirsa hêza pêşmerge jî kirin.

Xeyrî Bozanî endamê Tevgera referandûmê di vê xwepêşandana ku bi hezaran welatîyên bajarê Duhokê ji hemû pêkhatîyên wê beşdar bûne de got: Ev xwepêşandan jibo piştgirîya şanda Kurd ku niha li Bexdayê ye, hatiye kirin. Em bi vê xwepêşandanê dixwazin çareserkirinek zû ji wan xalên girîng ên ku nehatine çareserkirin û pêwîstîya çespandina benda serbixwebûna gelên Îraqê bi referandûmekê bê kirin. Tevgera Referandûmê di dûrişmên xwe de xwest ku Yekîtîya Navnetewî jibo pêkanîna referandûmek azad şandekê bişîne herêma Kurdistanê û ji daxwazên gelê Kurd re çareserî bê dîtin, Xeyrî bi berdewam got: Eger daxwazên Kurd neyên çespandin wê Tevgera Referandûmê dewleta Kurdî rabighîne.

Ji alîyê din de li bajarê Hewlêrê jî xwepêşandanek lipêş avahîya Encûmena Niştimanîya Kurdistana Îraqê lidarket û bi sedan Kurdên Şebek û Yêzîdî piştgirîya xwe ji daxwazên serkirdên Kurd re sebaret nivîsandina destûra herdemî kirin.

Herweha xwepêşandêran doştnameyek pêşkêşî Parlemana Kurdistanê kirin û têde daxwaza pêkanîna maddeya 58 an,daxwaza vegerandina deverên Şengalê, Kerkûkê, Xaniqîn û Mexmûrê liser herêma Kurdistana Îraqê kirin. Herweha daxwaza federalîya cografî ji herêma Kurd re kirin. Xwepêşandêran xwest ku Parleman van daxwazan bighîne Komera Niştimanîya Iraqê.

Di Medya Tirkan de serlêdana Erdogan ya Diyarbekirê



Serokwezîrê Tirkiyê Receb Teyyîb Erdogan roja 11ê Tebaxê çû serdana bajarê Diyarbekirê. Erdogan li Diyarbekirê, li gora hinekan axaftinên gelekî balkêş kirin, jiber ku wî pejirand ku li Tirkiyê pirsek bi navê "pirsa Kurdî" heye. Li gora hinekên din jî di axaftina Erdogan de tiştekî nû tunebû, wî navê pirsê bê dilê xwe lê kiriye lê riya çareseriyê nîşan nedaye.

Serokwezîrê Tirkiyê Receb Teyyîb Erdogan li Diyarbekirê ji Diyarbekiriyan re got ku Tirkiyê ji vê û şûnve gavên xwe berepaş navêje û ew destûrê nadin ku pêvajoya demokratik berepaş vegere. Erdogan got „Pirsa Kurdî pirsa min e. Navnîşana çareserkirina temamê pirsgirêkan em in.„

Receb Teyyîb Erdogan di berdewamiya axaftina xwe de wiha got, "Li her welatî di paşerojê de şaşî hatine kirin, her welatî di paşeroja xwe de rojên zor bihurandine. Înkarkirina şaşiyên ku berê hatine kirin, ne tiştekî layiqî dewletên mezin e. Ne pêwîste mirov navekî li her pirsgirêkê bike jiber ku pirsgirêk yên me tevan e. Lê heger hûn ilehî bixwazin em navekî lê bikin, pirsgirêka Kurdî ne ya perçeyekî ji vî miletî ye, ew pirsgirêka herkesî ye. Pirsgirêka min bixwe ye. Temamê pirsgirêkan, yê temamê hemwelatiyên Komara Tirkiyê ne, ew Tirk bin, Kurd bin, Çerkez bin, Ebaze bin, Laz bin ferq nake. Ji ber ku tav herkesî germ dike û baran ji bo herkesî rehmet e. Jiber ku herkes mirovê heman axê ye. Milletbûn ev e.

Erdogan jibîr nekir ku felsefeya "yek dewlet, yek milet û yek alê" bîne bîra Kurdan û careke din dûbare kir ku navnîşana çareserkirina temamê pirsgirêkan ew bixwe ne.

Çapemeniya Tirk serdana Erdogan çawa şîrove kir?

Nivîskara rojnameya Millîyet Yasemîn Çongar di nivîsara xwe de nerînên xwe yên di derbarê serdana Erdogan de tîne ziman û gotinên ku wî li Diyarbekirê kirine şîrove dike. Çongar ji bo vê yekê serî li nerîna rayedar û dîplomatên Emerîkî jî daye. Li gora Çongar pisporekî Emerîkî yê navdar wiha gotiye, "lazime Enqere ji neteweparêzên Kurd û grûbên siyasî yên herêmî netirse. Lê bi şertê ku ew grûb li dijî terorîzmê bin".

Çongar radighîne ku li paytexta Emerîkayê, gotinên Erdogan bi balkêşî hatine guhdarkirin û şîroveyên erênî liser hatine kirin.

Çavdêrên siyaseta Emerîkî nerînên xwe wiha anîne ziman,"Me berî niha jî guhê xwe dabû çend daxuyaniyên girîng yên Erdogan, wî gotibû, „Wê krîterên Kopenhagê bibin krîterên Enqerê" û herwiha ji bo pirsa Qibrisê jî gotibû „Li Qibrisê neçarî nabe çareserî" gotinên ku wî li Diyarbekirê jî kirine bi qasî van gotinên din girîng in. Hikûmeta Tirkiyê xwedî li gotinên xwe derket û gelek reformên li gora krîterên siyasî yên Yekîtiya Ewrûpa pêk anîn û piştgiriy pîlana Annan jî kirin. Niha tiştê girîng ewe, ku gotinên serokwezîr yên li Diyarbekirê bi hinek gavên berbiçav werin xurtkirin."

Di derbarê gavên ku pêwîste werin avêtin de, rayedarê Emerîkî gotiye „Ew pirsgirêka Hikûmeta Tirkiyê ye, lê belê hûn dikarin li rapora salane ya Wezareta Karûbarê Derve ya Emerîkayê binerin"

Li gora Yasemîn Çongar, Waşington dixwaze bikaranîna zimanê Kurdî di hemû aliyên jiyanê de hêsantir bibe û çewisandina li ser rabe.

Pisporekî din jî nerîn û pêşniyarên xwe yên ku ji 3 pêvajoyan pêk tên, ji Çongar re wiha aniye ziman, "Pêwîste pêvajoyek bi navê „Bihara Diyarbekirê" destpê bike. Jibo vê yekê lazime şert û mercên ku pirsa Kurdan bi tevlêbûneke berfereh were gotûbêjkirin çêbibin. Divê qedexe û kelemên li pêşiya weşanên Kurdî rabin.

Di gava diwemîn de lazime li Başûrêrojhilat aramî bê zêdekirin: Pêkanîna vegera li gundan û danîna programekî ku aboriya herêmê hinekî xurt bike. Lazime ev program weke yê berî niha - 13 pakêtên aborî- liser kaxetê nemîne.

Di gava sêyemîn de lazime nerîna liser Bakurê Îraqê bê guhertin. Jibo vê jî divê Enqere pêwendiya xwe ligel Kurdên Îraqê xurt bike, bi wan re têkiliyeke pozîtîf deyne ku bikaribe bihêle ew bi hêsanî helwestê li beramber PKK deynin.

Pisporê Emerîkî gotinên xwe wiha berdewam dike, „Heta ku Partiyeke Kurdî ya ciddî cihê xwe di nava siyaseta Tirkiyê de negre, wê ev pirs çareser nebe. Pêwîste Kurd bikaribin, tengasiya di nava xwe de bi riya qenala siyasî vala bikin. Lê belê, dema derbasbûyî, temamê bizavên Kurdî yên dûrî PKK û nerm hatin qedexe kirin. Rê li pêşiya wan hat girtin. Li Tirkiyê, dewleta Kûr, yekser partiya Şerafettin Elçi girt."

Pisporê Emerîkî yê ku navê wî ji aliyê Yasemîn Çongar ve nehatiye dayîn, wiha berdewam dike, „Îro jî li Tirkiyê, gelek kesên cuda û lîberal yên dûrî PKK hene ku bi germî li Leyla Zana jî nanerin û li dijî terorê ne jî. Ew niha di nava hewldana damezirandina partiyên nû de ne."

Nivîskar M. Ali Birand, nivîsara xwe ya di vê derbarê de bi sernivîsa "Kesek nikare pirsa Kurdî çareser bike" nivîsandiye.

Bîrand di nivîsara xwe de dibêje ku, pirsa Kurdî derketiye derveyî sînorê Tirkiyê û ew êdî girêdayî rewşa Îraqê ye. Li gora Bîrand, wê ev pirsgirêk hîna gelek salên dirêj jî berdewam bike M. Ali Birand dibêje, "Dema mirov berê xwe dide van gotûbêjên rojên dawî, mirov dibîne ku wê pirsa Kurdî ne li gora daxwaza me û ne jî li gora daxwaza PKK were çareser kirin. Lazime Tirkiyê fêrî jiyana li gel pirsa Kurdî bibe, daxwazên Kurdan bixwe bide pejirandin û riyeke navîn ji xwe re bibîne. Wekî din tu çareya vê meselê tuneye. Pêwîste em jibîr nekin ku pirsa Kurdî ne pirsa me bi tenê ye, guhertinên ku di dema pêş de li Îraq, Îran û Sûriyê jî çêbibin, wê bandoreke mezin li meselê bikin. Em di vê demê de çiqasî bikaribin demokrasiyê xurt bikin û rewşa mirovên xwe baş bikin, emê hewqasî bikaribin rê liber derbeyên li pey zelzeleya Pirsa Kurdî ya Herêmî jî bigrin.

Nivîskarê rojnameya Radîkal H. Bülent Kahraman jî di nivîsara xwe de balê dikşîne ser şîrove û raveyên seranser yên ku liser gotinên Erdogan têne kirin û bi kinayî wiha dibêje, "Radeya çêbûna bûyeran ne ewe ku mirov bi gotinên weke ‚demokratikbûn', ‚pirsa Kurdî heye' û wekî din rastiyê veşêre. Pêwîst bû nivîskarên bi rûmet yên ku di çapemeniya welatê me de pisporên dîplomasiyê ne ji zû ve ev rastî bigotana ku meseleya Kurdan êdî ne meseleya Tirkiyê bi tenê ye. Heger pêwîst bike ku em li vir bi awayekî vekirîtir bibêjin; Ew tiştê ku em jê re dibêjin Pirsa Kurdan êdî ji herdemê bêhtir bûye pirseke navnetewî. Partiya ku li Tirkiyê desthilatiyê dike, jiber cihê ku lê ye û îdeolojiya ku diparêze (an jî naparêze) ji hundir ve ji aliyê dewletê û saziyên wê ve, li derve jî ji aliyê Emerîka û Yekîtiya Ewrûpa ve tê tengav kirin. Pêwîste mirov bifikire ku bombeyên dawî yên ku li Ingîltere teqiyan, di eslê xwe de di destê AKP de teqiyane. Êdî zehmete ku ev partiya îslamiya nerm, cihekî ji xwe re di nava Yekîtiya Ewrûpa de bibîne. Emerîka dixwaze siyaseta xwe ya li herêmê ya ku dema dawî bi bilindkirina buhayê petrolê tehrîk dike, ji bo demeke dirêj li gora ku Tirkiyê jî di nav de be diyar bike û ji ber vê jî heya jê were wê Tirkiyê tengav bike. Ew tiştê ku em jê re dibêjin pirsa Kurdî, berî hertiştî ev bixwe ye. Wisa diyare ku em bi tenê li pirsa Kurdan dinerin û nêta kesî tuneye ku xwe berde nava hêla xemgîn ya vê rastiyê.

Serokê DYP Mehmet Agar yê ku hîna hesabê kuştin û wendakirina bi sedan mirovên Kurd nedaye, serdana Erdogan ya ji bo Diyarbekirê bi van gotinan rexne kir, " ev sê sal in tu naçî wîlayeteke welat û piştre jî weke ku tu biçî bajarê welatekî xerîb, bi hêlehopê diçî. Tu li wir behsa perçebûnê dikî. Serokwezîr nizane ku wê gotinên wî di dema pêş de bibin bar li ser pişta wî."

www.arsiv.org



hiravetî

Bayram Ayaz

ERDOGAN DIVÊ LISER GOTINA XWE BIMÎNE

Heftiya berê mijara siyasî çûyina serokwezîrê Tirkiyê Teyib Erdogan ya Amedê bû. Çavên herkesî liser Erdogan bû. Ev seredan û ew çend gotinên ku wî kirin, li Kurdistana azad jî bala insanan kişand. Gelek kes pesnên helwesta Erdogan dan û ji wî hêviyan dikin.

Li Amedê hejmarek kêm hevwelatî pêşwaziya serokwezîr û heyeta pê re kirin. Lê helwesta wî ku nav li 'kêşeya Kurd' kir û got 'em dixwazin vê pirsê di riya demokrasiyê de çareser bikin' bi dilxweşî û erênî hat nirxandin. Aliyek dî jiber ku heta nuha siyasetvanên Tirk gelek caran qiseyên wisa kirine, soz dane, lê nekarîne li dû qiseyên xwe rawestin, Kurd bi temkîn in. Helwesta rast jî ev e. Ne rast e, ku em bi nêrîn û analizên çewt hêviyên vala li nik xelkê peyda bikin.

Ev sê salin Partiya Adaletê û Pêşketinê (AKP) înser hukm e û ev du sal û nîv in Erdogan jî Serokwezîr e. Mixabin heta îro vê partiyê jibo çareseriya kêşeya Kurd ti plan û programek pêşkêşî nekiriye. Serokwezîr jî bi vê pirsê ve mijûl nebûye. Em divê bibîrbînin ku ne dûr hêj berî çend mehan Tayip Erdogan, liser pirsa rojnamevanekî, got: 'Eger hûn bi vê pirsê nefikirin, wê pirsek wisa tunebe'. Bersivek wisa jibo siyasetvanekî bêtalihiyek mezin e.

Helbet sedemên vê yekê hene. Em dizanin ku doza Kurd û Kurdistanê li Tirkiyê di nav dezgehên dewletê de karê generalan e, pirsek gelek hessas e. Tirk dibêjin, ev pirs jibo me pirsek me ya netewî serekeye. Bi rastî jî siyasetvanên Tirk û burokrasiya sivîl di pirsa Kurdistanê de ne xwedî desthilatê ne. Jixwe astengiya herî mezin li pêşiya çareseriya kêşeya Kurd û pêşxistina demokrasiyê li Tirkiyê ev e.

Îdeolojiya Kemalîst û ordiya Kemalîst nahêle gelê Kurd mafên xwe bidestxe û bibe welatekî demokrat rasteqîn.

Gotinên serokwezîrê Tirkiyê Erdogan hewildanek nû ye. Ev hewildan di demeke wisa de destpêdike ku Tirkiye di prosesa berendametiya Yekîtiya Ewrûpa de di qonaxeke hessas de derbaz dibe. Roja 3.10.2005 wê biryar bê dayîn, gelo jibo endametiyê bi Tirkiyê re muzakere destpêbikin an na?

Di helwesta Serokwezîr Erdogan de peywendiyên Yekîtiya Ewrûpa û Tirkiyê rolek sereke dilîze. Di encam de ji her çi sedemê dibê bila bibe ev hewildan karekî erênî ye. Wisa xûyaye hemî dezgehên dewleta Tirk ji vî karî agahdar in. Jixwe qise û gotinên ku Erdogan kir, çarçoveya ku pêşniyar dike, naveroka wan ji siyaseta dewleta Tirkiyê ne dûr e.

Tenê dewlet naxwaze di asta fermî de nav li vê pirsê bike û bêjin 'kêşeya Kurd'. Jixwe gotina Kurdistanê hêj bêjeyek tabû ye û heta yek jiber karanîna bêjeya Kurdistanê dikarê bê cezakirin. Çarçoveya 'yek dewlet, yek milet, yek al' ku serokwezîr pêşniyar dike, mafên gelê Kurd dixe dereca mafên mirovan, mafê yek bi yek hemwelatiyan. Lê rêz li van mafan jî nagirin. Kemalîst ji vê re jî ne amade ne. Ferqa navbeyna Erdogan û generalan ev e. Erdogan eger jiber sedemên hundir û navdewlî be jî, amadeye bêje, ev pirs pirsa Kurd e û divê em di çarçoveya peywendiyên Yekîtiya Ewrûpa û Tirkiyê de li çareseriyan bigerin, hin gavan bavêjin. Tevgera Kurdistanê hewceye vê ferqê bibîne û ji Erdogan re astengiyan dernexe. Helbet pirsa herî girîng, divê hêzên Kurd û Kurdistanî yekîtiya xwe bihûnin û programa xwe ya netewî zelal bikin. Ev jî divê di çarçoveya mafê çarenûsî de bibe.

Entelektuel



Yıldırım Türker
Radikal

"Entelektuel bi kêrî çareserkirina krîzan nayên, ew bi kêrî derxistina krîzan tên... wezîfeyeke entelektuelan jî ew e ku di aliyê siyasî de êrîflî dijminên partiya xwe nekin, lê ew li hemberî alîgirên di nava partiya xwe de derkevin."

Umberto Eco

„Ez dizanim, ez berpirsyarên bizava ku dikare weke derbeya hikûmetê were binav kirin dinasim. Ez berpirsên tevkujiya Çileyê 1969an ya li Mîlano jî dinasim. Ez navê berpirsyarên tevkujiyên li Brescia (mehên yekemîn yên sala 1974) û Bologna jî dizanim. Ez navên wan dizanim, ewên ku faşîstên kevin û nû û yên ku hîna bênav in jî bikaranîn û ‚lûtke' (doruk) pêkanîn.

Ez dizanim, jiber ku ez rewşenbîr im, ez nivîskarekim yê ku çavdêriya hertiştê ku diqewime dike, hertiştê ku tê nivîsandin hîn dibe, ez liser hertiştê ku nayê zanîn yan jî bi perdeya bêdengiyê tê veşartin difikirim, ez girêdanê di navbera bûyerên dûrî hev de jî çêdikim, ez perçeyên belawela yên ku siyaseteke baş û wêneyekî pêk tînin tînim cem hev, ez ramana ku dixwaze bibêje keyfîyet, beredayîtî û nehên (gizem) serdestin, datînim." Pier Paolo Pasolini

„Hunermend û entelektuelê serbixwe, yek ji wan çend kesaye ku hejmara wan her ku diçe kêm dibe. Ew xwediyê wê hêzê ye ku dikare li dijî bisînorkirin û kuştina her tiştê jîndar li berxwe bide. Êdî bi rastî jî, divê mirov ji bo afirandin û pêşxistina ramanên nû bikaribe perdeya liser rûyê çirava wan fikrên ku amûrên pêwendiya modern liser me ferz dikin, rake. Lazime mirov xwediyê wê hêza şikandina bandora wan be. Ev dinyayên hunera girseyê û ramana girseyê herkû diçe zêdetir dibe hedefa daxwazên siyasetê. Jiber vê yekê divê navenda piştgirî û hewldanên entelektuelî, siyaset be. "Heger mirovê ramankar, di nava tekoşîna siyasî de nikaribe pêwendiyeke rastexo ligel rastiyê deyne, ew nikare bi berpirsyarî temamê ezmûnan şîrove bike." C. Wright Mills

„Li gora daxwazê pêşkêşkirina şerbetê, li cihê ku pêwîste were axaftin, parastina bêdengiyê, beşdarbûna di merasîmên derxistina gunehan û qebedayîtiya şovenistî de, rola entelektuelekî ya girseyî di bin siyê de dihêlin û dixin nava gumanê." Edward Said

„Di encam de tiştê herî girîng weke kesayeteke temsîlkar, entelektuel bixwe ye; ku vê an jî wê nerînê bi awayekî vekirî tîne ziman û nûneriya wê li beramber temamê astengan jî, bi navê wê girseya ku muhatab digre, dike.. Entelektuel ew in yên ku hunera nûnertiyê (dikare bi riya axaftinê, nivîsandinê, mamostetî, derketina televizyonê û hinek şêweyên din be) kirine wezîfeya xwe. Dema ku ev wezîfe liber çavên raya giştî were pêkanîn, ew girîngtir dibe jiber ku hem xeterî têde ye hem wêrekî û hem jî dilşikandin. Dema ku ez Jean-Paul Sartre yan jî Bertrand Russel dixwînim, ji gotinên wan bêhtir dengê wan yê taybetî ş hebûna wan bandorê li min dike jiber ku ew baweriyên xwe tînin ziman. Ne gengaze ku mirov wan û memûrekî bênav yan jî brokratekî bi tedbîr tevlîhev bike." Edward Said

„Dema ku entelektuel doz yan jî fikrekî xwe ji civakê re beyan dike, armanca wî ne ewe ku ezeziya xwe bihêz bike yan jî kêfa xwe liser bingeha statuya xwe bike. Her wiha armanca wê nûnertiyê ne ewe ku xizmeta brokrasiyên desthilatiyê bike û weke xizmetkarên comerd kar bike. Xebatên nûnertîkirina entelektuel liser bingeha guman, xwe avakirineke bêdawî û dadgeriyeke exlaqî pêk tên û pişta xwe didin zanistê. Ev yek jî dihêle ku mirov herdem hazir û amade be. Du taybetmendiyên bingehîn yên çalakiya entelektuelî, zanîna bikaranîna ziman û di wextê minasib de mudaxelekirina ziman e... Li gora wateya ku ez didim gotinê, entelektuel ne di taya haşkirina mirovan û çêkirina konsensûsan de ye. Ew temamê hebûna xwe datîne holê ku formulên erzan, klîşeyên hazir û gotinên xwediyên desthilatiyê û dşvikên wan nepejirîne. Ew bi awayekî pasîf doza hinek tiştan nake, lê daxwazên xwe bi awayekî aktîf ji rayagiştî re jî dibêje." Edward Said

„Lê belê entelektuel herdemê ji aliyê dijberiya dijwar ya pirsgirêka girêdanê ve hatiye dorpêçkirin. Bê îstîsna heryek ji me girêdayî komeke millî, olî yan jî etnîkî ye. Herçiqasî bi dengekî bilind dijberiya wê bibe, bela bibe, kesek ne di ser girêdana organîk re ye, ya ku kesayetê bi malbatê ve, bi komik û nijadê ve girêdide. Grûbên ku xwe dinepixînin, yan jî ji çar aliyan ve hatine dorpêçkirin –wek nimûne Bosneyî yan jî Filîstîniyên roja mepê dihisin ku di aliyê siyasî de û hinek caran jî di aliyê cesedî de di bin gefa (tehdîd) mirinê de ne. Ev yek dihêle ku ew grûb xwe biparêze, jibo parastina xwe hertiştî bike û xwe di riya şerkirina li dijî neyaran de feda bike. Bêguman li vir behsa neteweperestiyeke di rewşa xweparastinê de tê kirin, lê belê weke ku Frantz Fanon di dema herî dijwar ya şerê rizgariya Cezayir de li dijî Frensa (1954-1962) gotibû, ne bese ku mirov tevlî koroya pejirandina neteweperestiya li dijî dagirkeriyê bibe ku di kadroyên pêşeng yên partiyê de cî girtiye. Di dema şerê herî dijwar de jî lazime rê û rêbaz werin şîrovekirin û pirsa 'ka ev xizmeta kîjan armancê dike' were pirsîn. Em bi tenê ji bo xelasbûna ji dagirkeriyê ku armanceke mecbûriye şer dikin, yan em difikirin ka piştî ku polîsê sipî yê herî dawî jî here emê çi bikin?

Di encam de jî çend gotin liser awayê mudexeleya entelektuel. Kesên entelektuel dernakevin serê çiya û kursiyan û gotinên ji jor ve nakin. Bêguman hûnê bixwazin gotinên xwe ji dereke wiha bikin ku herî baş werin bihîstin û hûnê bixwazin ku gotinên we bandorê li doza edalet û aştiyê bikin. Belê, entelektuel bi tena serê xwe diaxive, lê dema ku ew xwe ligel rastiya bizavekê, daxwazên miletekî û armanceke hevpar bike yek, wê dengê wî vede.

Li Rojavaya ku terora Filistîn û bêsînoriya wê bi her awahî tê rexnekirin, oportunîzm ferz dike ku hûn jî Filîstîniyan şermezar bikin û pesnê demokrasiya Îsraîlê bidin. Heger hûn piştre di derbarê aştiyê de jî çend gotinan bikin, wê ne xerab be. Berpirsyariya entelektuelî ferz dike ku hûn van tiştan tevan ji Filîstîniyan re bibêjin, lê pêwîste hûn derdê xwe li deverên ku hûn bikaribin bandorê lê bikin, li cihên weke New York û Londonê bînin ziman. Divê hûn fikra daxwaza azadiya Filîstînê û rizgarbûna ji terora hemû aliyan jî bînin ziman, ne bi tenê behsa aliyê herî zeîf ku bi hêsanî dikare were çewisandin bikin. Gotina rastiyê jibo desthilatiyê ne îdealîzmeke bi şêweya Panglos e (Panglos: mamosteyê Voltaire û Candide ye). Ev yek ewe ku mirov rê û rêbazan li mêzênê ke, ya herî rast hilbijêre û wê bi awayekî baş, li cihê ku rê liber guhertineke rasteqîn veke, bi hişyarî temsîl bike." Edward Said

Erdogan li Diyarbekirê starta berdana Evdila Ocalan da...

Ahmed Zeki Okçuoğlu

Gotinek Tirkan heye, dibêjin, "Yekî Qeyserî diya xwe boyax kiriye frotiye bavê xwe. Ne bi tenê Qeyserî dewleta Tirkan jî di viya de gelek pispor e. 15 sal bû Şerê Sar dawî lê hat, Sovyetîstan û pêyikên wî hilweşiyan, yên dinê jî yek bi yek hildiweşin diçin. Lê li Tirkiyê Kemalizm Hê liser piyan ne. Tirk bi viya jî namînin, bi vê rejîma xwe dixwazin bibin endamê Yêkîtiya Ewropa. Wê bibin jî.

Piştî rûxana Şerê Sar berê bloka Sovyetîstanê hilweşiya. Niha jî rejîmên totalîter û otorîter yên dinê yek bi yek hilldiweşin diçin. Digel viya gelo Tirk çawa dikarin bi sîstema xwe totalîter ya herî kevn bi Kemalizmê liser piyan bihêlin û bi viya jî nemînin bi vê rejima xwe bikevin Yêkîtiya Ewropa?.. li dinyayê wekî ku sistema xwe ya faşîst diguhêrin nîşan didin û bi vî avayî sîstemê didomînin. Panzdeh sale Tirk bi dek û dolaban dinyayê dixapînin.

Tirk zêdeyî panzdeh sal e bi dinyayê dileyizin. Rojavahî biz anîn dihêlin Tirk biwan bileyîzin. Rojavahî bûn edu qet. Emrîka ketiye nav şerekî giran, naxwaze di nav vê rewşê de Tirkan jî bigire hemberî xwe. Ewropî dixwazin li hemberî Emrîkayê Tirkan bikarbînin. Jibo ku namûsa demokrasiya Ewropiya bê xalî kirin Tirk wekî ku xwe diguhêrin dikin û Ewropî jî bi hevre liçepikan dixin.

Di vê nivîsê de armanca min ne nivîsandina rewşa rojavahiyan e, armanca min nivîsandina rewşa Kurdên reben in. Ew Kurdên ku bi Tirkan dixapin û di her guhertinên sexte de xwe hildiavêjin û xwe diavêjin dest û lingên wan... Ne bi tenê Kurdên Kurdistana navendî, Kurdên perçeyên Kurdistanê yên dinê jî mixabin mêldarê lêbawerbûna Tirkan in.

Dema Kurdistan TV hê nuh ava bû bû, bêtir bi bûyerên li Tirkiye û Kurdistana navendî diqewimîn re mijûl bû. Ber viya jî carna bi telefonê liser van bûyeran raya min jî pirs dikirin. Rind tê bîra min, Ahmet Necdet Sezer bûbû Serok Komar. Sezer serokê Dadgeha makzagonê bû. Bi nasnameya xwe ya zagonî bûna wî ya serokkomar ne bi tenê ji aliyê rojavahiyan ve wekî şoreşek hatibû pejirandin. Mixabin çi navendî çi başûri û yên dinê jî Kurd jî ketibûn bin bandûra vê pîsîkolojiyê . Di wan rojan de berpirsiyarê programa nûçeyan wekî hinek kesan telefonê min jî kiribû û liser vê bûyerê şiroveyê min ji min xwestibû. Diyar bû ku ew jî ev raya piraniyê diparast. Jiber vê yekê jî gotinên min ne li gor dilê wî bû. Min gotibû ku, "Ev lîstikên Kemalîstan e. Hûnê bibînin wê tu tişt nehê guhartin. Rejima Tirkan bi guhartinên piçûk nahê guhartin. Hakimên Hitler û Mûsolînî jî hebûn. Ferqa wan û Hitler û Musolînî tunebûn. Ferqa Kemal û Sezer jî nîne. Heke ne wer bana Kemalî wî nedikirin serokkomar".

Mixabin Kurdên me yên ku demekê çawa baweriya xwe bi Sezer, bi Demîrel, bi Çiller, bi Ecevît, bi Yılmaz, bi Erbakan hanîbûn niha jî bi Erdogan tînin. Ma qey Demîrel jî neçûbû Diyarbekirê û negotibû, "Em realîteya Kurd nas dikin". Ma qey Çiller carekê jibo çareserkirina pirsgirêka Kurdistanê qala "modela Bask" nekiribû. Ma qey nayê bîra Kurdên reben yên mêjîdagirkirî, jibo ku Kurdan bixapînin heya îro çend Serokkomar û Serokwezîrê Tirkan çav li Kurdan miçandin.

Ew Erdoganê ku beriya çend mehan li Norveçê gotibû "Li Tirkîyê kêşeya Kurd nîne", jiber hin sedeman çû Diyarbekirê û got ku, "Kêşeya Kurd, kêşeya me ye"...

Ew Kurdên me yên mejîdagirkirî ku baweriya xwe pir bi Tirkan tînin û naxwazin ji sîstema wan ya kolonî derkevin û bi tenê doza hinek merhametê li wan dikin nişkava dest bi şahiyê kirin û jibo Erdogan çepik lêdan.

Heya ku jeopolitîka dinyayê (ku Tirk nêzî dused salin bi saya wê dijîn) lidar be û heya ku ev Kurdên meyên reben yên mêjîdagirkirî baweriya xwe bi Tirkan bînin wê Tirk pir Kurdan bixapînin.

Wekî me li jor jî got wekî her carê sedemên çûyin û axatina Erdogan li Diyarbekrê ya yekê, jibo endamiya Ewropayê ya Tirkiyê, Ewropî karibin tarîxa berafiyê (muzekkere) bidin wan qe nebe piçek be jî pê namûsa demokrasiya Ewropayê bê paqijkirin. Yek jî xapandina Kurdan e.

Lê armancek dinê a çûyina Erdogan li Diyarbekrê jî heye îro kes qala wê nake(ya min armanca sereke jî ev e): Pêşamadeya berdana Evdila Ocalan kirin...

Di demeke kin de diyarbûbû ku Tirk Ev dila Ocalan ne jibo dadgehkirinê û kuştinê, jibo paqijkirin û meşrûkirinê hanîbûn û li girava îmraliyê nîştecîh kiribûn.

Li Diyarbekirê Erdogan di axaftina xwe de bi peyva xwe ya "Em bi prênsîbên Komara Demokratîk ve girêdayî ne" jî mesaj da Evdo û peyrevên wî. Wekî ku çend roj şûnde Orhan Dogan jî di rojnameya Radîkala de (15.08.05), di hevpeyîvîna xwe ya bi Neşe Duzel re de jî bivekirî qal dikir (Orhan Dogan di hevpeyîvîna xwe de weha dibêje: Em pê dizanin ku kengê dema wî bê wê Evdila Ocalan bê berdan.") mesaja Erdogan bo Evdociyan ev bû: "Em liser soza xwe ne dema ku roja wî bê emê Evdo berdin derve," Bi gotinek dinê Erdogan jibo ku mizgîniya berdana Evdila Ocalan bide çû Diyarbekirê.

Çi heyf jibo Kurdên ku jiyana xwe ya siyasetê bi çûyîna Evdila Ocalan ve girêdane re. Piştî vî şerê sexte ketibûn nav xiyalê "wê îcar Komara Tirkiyê dev ji Evdo û Evdociyan berde û baweriya xwe bi me bîne." Kurdên reben yên mêjîdagirkirî çiqas jî omidwar bûbûn bi viya. Ketibûn rêzê diqêriyan, "Tirkno êdî bi me bawerbin, Evdo ne dostê we ye, ew terorvan e, xortên we dide kuştin, em şer mer naxwazin, firsendekê bidin me, em xizmeta we bikin."

Lê diyare ku Tirko îcar jî guh neda wan. Em Kurdên mêjîdagirkirî beşa didoyan bihêlin di halê xwe de û carek din vegerin ser mijara berdana Evdila Ocalan.

Wekî ku Orhan Dogan jî got, wê "dema ku roja wî hat wê Evdila Ocalan bedrin". Erdogan li Diyarbekrê starta berdana wî da. Niha dora PKK ye.

Wekî tê zanîn du PKK hene: PKKya legal, PKKya îlegal. Wê herdu jî xwe fesh bikin û bi îmajekî nuh derkevin holê. Bi xwefesîhkirina DEHAPê PKK jî gava yekê avêt. Dûra cardin dora dewletê ye, wê bi navekî dinê zagona lêborîna Evdoiyan bê derxistin. Dûra jî PKK xwe fesih bike û bên teslîm bibin. Beşekî wan di dest da, beşekî wan jî piştî demek şûnde bên berdan û di bin xizmeta serokê xwe de dest bi siyasetê bikin. 'Ev wê hema wek lihevhatina İRAyê û İngiltereyê bên meşrû kirin.

Gelo birastî jî wê PKK bê fesih kirin?

Ji alîkî ve erê. Piştî demek kin PKKa ku em pê dizanin wê ji holê bê rakirin û wek li jor jî me got wê gerîlla û hemû kadroyên bên teslim bibin. Gelo ji vê û wêda wê dewleta Tirk dev ji metoda "bi destê Kurdan liser Kurdan teror kirinê" berde?

Na!. "Bi destê Kurdan liser Kurdan teror kirin" ewlehiya rejima Kemalîzmê ye. Dewleta Tirk sih sale bi Evdila Ocalan û bi PKK polîtikaya xwe dimeşîne. Di polîtîkaya wê de tu guhertin çênebû, jiber vê yekê bêyî PKK nabe. Piştî anîna Evdila Ocalan li Tirkiyê ji rewşa dinyayê îstîfade kirin û PKK heya îro paraztin. Lê êdî ev nameşe. Wusa xuyaye Erdogan çûyîna xwe ya Emrîkayê ji rûyê paraztina PKK "firçeyek" xwar. Ew jî bêgav man senaryoyek dinê biserxin.

Beriya gavavêtinê Komara Tirk tedbîra PKK û ji niha ve ciyê PKKyê, "Kürdistan Özgürlük Şahinleri" (Bazên Azadiya Kurdistan) hat avakirin û wekî bi kuştina Hîkmet Fîdan, bi bombeteqandina li Kuşadasıyê û bi kiryarên dijwar xwe da naskirin. Îro şûnve wê dewleta Tirk liser Kurdan terora xwe ne bi destê PKK, bi destê KÖŞê bimeşîne.

KÖŞ, wek PKKyê ne bi rîsk e. PKK çiqas di bin kontrola Tirkan de ba jî dîsan jî bi rîsk bû. Bi gotinek dinê îhtimala ji bin kontrola wê derketina PKK tim hebû. KÖŞ wekî "Türk İnTikam Tugayları (Tugayên Tirk yên Tolhildanê) îstîxbarata Tirkan bi xwe ye. Îro şûnve dewleta Tirk kengî bixwaze derbekî li Kurdan bixe wê viya liser navê TİTê bike.

Wê Çaxê wê rola Evdila Ocalan û Evdociyan çibe?..

Evdo û Evdocî di legalîteyê de bi metodên demokrasiya Tirkan wê Kurdan kontrol bikin. Wiya wê wekî iro qaşo liser navê neteweparêziya Kurdan bikin, lê di rastiya xwe de wê xizmeta nijadperestiya Tirkan bikin.

Heta meriv dikare bêje Evdila Ocalan wê rola Alparslan Türkeş, partiya ku liser navê "Demokratik Toplum Partisi" (Partiya Demokrat ya Civakê) jî rola MHPye.

Qedera nijadperestiya Tirkan e, serokatiya wêya tim ne Tirk dikin. Ya herî dawiyê Türkeş Ermen bû. Niha jî doran Kurdan e.







Sernivîskarê kovara Huner çû ser heqiya xwe

Kawe Alîxan- Duhok

Li roja 14/8/2005 li nexweşxaneyek bajarê Bexda ji sedema nexweşiyek giran, hunermend Îbrahîm Îsa sernivîskarê kovara huner ku kovarek huneriya mehaneye û li bajarê Duhokê derdikeve, çû ser heqiya xwe.

Îsa li sala 1968 li bajarê Duhokê ji dayik bûye, li sala 1984 bûye endamê koma şoreşvan ya hunerên gelêrî "millî" û beriya çend salan bû serokê wê, ev bêtirî deh salane programa hunerî li K.tv Duhok amade û pêşkêş dike, li 1998an kovara huner damezrandiye û bûye sernivîskarê wê, Îsa yek bû ji damezrênerên Komeleya Hunermendên Kurdistanê li bajarê Duhokê û herwusa endamê civata hunerî bû li parêzgeha Duhokê.

Li bajarê Zaxo.. Festîval

Guhdar Ismayil- Zaxo

Li rojên 4 û 5 yên vê mehê û li jêr çavdêriya Samî Şoreş wezîrê rewşenbîriya hikûmeta Kurdistanê, festîvala rêzgirtinê jibo seyda SALIH YUSIVI li bajarê Zaxo hat sazkirin. Ev festîval ji layê Rêveberiya Rewşenbîrî û Huneriya Duhokê ve hat berhevkirin û li hola liqa 8 ya PDKê hat pêşkeşkirin. Programa fistevalê ji çend semînar û behs û lêkolînan liser jiyana siyasî, rewşenbîrî û xebata şehîd Salih Yûsivî pêkhatibû.

Li dawîya vê festîvalê xelatên wezareta rewşenbîrî liser binemala şehîd û saziyên ku harîkarî jibo sazdana vê festîvalê kirine û pêşkeşkarên semîneran hatin dabeşkirin.

Hêjaye em bêjin, seyda Salih Yusivî li sala 1918an li bajarê Bamernê ji dayik bûye û li 25/6/1981ji layê hikûmeta Sedam li Bexda hat şehîdkirin û paşê li Zaxo hat veşartin. Şehîd Salih Yusivî hemî jiyana xwe bi karên siyasî û rewşenbîrî borand jibo ku civaka Kurdistanî bigihîje armancên xwe yên berz û pîroz.

Jinên Kurd dev ji mafên xwe bernadin



PK - Yekitiya Jinên Kurdistanê li parlamentoyê jibo parastin û xwedîlêderketina mafên xwe di 9ê mehê de dest bi grevê kirin. Jinên Kurd daxwaz dikin ku mafên wan di destûra Iraqê de cîh bigire.

Yekitiya Jinên Kurdistanê daxuyaniyek pêşkêşî Parlamentoya Kurdistanê kirin. Jinên Kurd di daxuyaniya xwe de daxwaz dikin ku ola îslamê di dereceya yekem de bibe çavkaniya referansê û mafên jin, zarok û mirovî bidestkevin.

Serokê Parlamentoya Kurdistanê Adnan Muftî piştgiriya daxwazên jinan kir û got ku ewê daxuyaniya jinên Kurd bigihîne komiteya amadekariya destûrê.

MIZGEFTÊN GUND Û MISYONERÊN TIRK



Kadim Kan

> Kurd u Kurdistanîtî nayê wê manê ku meriv dîn û urf û adetên xwe bixe çuwalekî û bavêje çemê Dîyarbekir û bişîne cem Ereban yan jî bidin postê û bişînin Enqerê. Em bixwe gerek li dîn xwedî derkevin.
>
> **(ji kalekî li qehveyek Diyarbekirê)**

Xanîyên kerpîç yan ên prîket, merivên westîyayî ku hêdî hêdî ' bêmecal dimeşin, kolanên xwaroxîçiko û xuloxwarî,çend çêlek û kerên hejar û bêhal. Lê belê Mizgeftek ji çimento, ji kevirên rengê spî û qahweyî yan jî reş, minareyek gewr wek şîr li kenarê gund bilind dibe.

Li mizgeftê 10 kanî jibo destmêjê amadene lê li gund zarok bi tenekan avê dikşînin malê. Hebûna kanîyek avê li malê hênjî jibo wan xeyale.

Meriv wê kontrasê li navbera gund û mizgeftan de li gelek cîhên Kurdistanê dibîne. Mizgeftên ku dewletê finanse kirîye yan jî jibo finansa wan hinekan bikaranîye.

Medresên Kurdan ku bi sedan alim,melle û seyda derxistine,hatin talankirin, li cîhê wan dewletê mizgeftên xwe çêkirin. Mizgefta ku îmam û muezzînê wê meaşê xwe ji dewletê distînin...

Ew bixwe nîşandide ku yek ji referansa helandina Kurdayetîyê li Komara Tirkan bikaranîna Îslamiyetê ye.Tirkan herdem xwestîye ku bi rîya misilmanîya sunnî jibo Kurd û Tirkan nasnameyek hevbeş çêkin . Yanê nasnama Kurdî bixin nav çerçewa nasnama dînî û bihelînin. Yan jî pirsgirêka netewa Kurd bikin wek nasnameyek dînî-etnîk kulturî.

Bi vî hawayî bi kevirekî li du çûkan dixin.

Kurden Alewî, (bi taybetî Dêrsimî û Maraşî) ku bi salan ji alî PKK,ve wek "Alewiyên Kemalist" hatin lanse kirin, ji Kurdan û ji Kurdewariyetê durxin û wan dehfî xefika dewletê bikin daku bibin xwedîyê nasnameyek Alewî-Zazayên nêzî Tirkan (ne Kurd).

Wek tê zanîn cemaetên Îslamî yên Tirk, li Kurdistanê bi piranî çalakîyên xwe li mizgeft, kûrsên quranê,weqif û li civînên „sohbetên Îslamî" didomînin.

Bi riya dayîna burs û pansiyonan li bajarên wek Wan, Erzirom, Xarpêt û Ruhayê di destê wan weqif û kûrsan de bi hezaran zarok, xort û keçên Kurd hene.

Tiştekî balkêş e: Serokên wan kûrsên quran, an weqifan, dergah û tekyayan kesên mîralay û efserên jikarketî (teqawît) yan profesorên tenê xwediyê nîşan lê ne xwediyê ilmê, an jî fermanber-memûrên dewletê ne.

Gereke ji alî her Kurdên Sunnî û Alewî ve bê zanîn ku armanca wan kesana ne muslimanî ye. Ew misyonerên Tirkkirinê ne.

Gelek law û keçên Kurd yên di dezgehên jorîn de derbas dibin, eger baş hatibin helandin û di peyda wek Tirk dixwazin hatibin „şekilandin" jibo bibin kadirên dewletê, wan dişînin "cihekî" nû.

Di salên 90î de siyaseta dewletê ew bû ku, li cihên „korucî" peyda nedikirin „hizbulahçiyên xwe" bi cîh dikirin.Cihê ku hizbulahçî hebûn pêwîstî bi koruciyan tunebû.

Li gelek ciha Kurdên dîndar ku nediketin nav hîzbulah an jî ligel wan hevkarî nedikirin dihatin kuştin.

Di wan salan de tenê li Dîyarbekirê 14 îmamên Kurd ku camiyên xwe teslîmî hîzbulah, yanê dewletê nekirin hatin kuştinê. Li Batmanê ji 60 mizgeftan dewletê 40 mizgeft xistibûn destê hîzbulahçîyan.

Waliyê Diyarbekir yê wê çaxê Cemîl Serhatlî digot: "Raste hemi mizgeftên bajêr û yên qezên derdor di bin kontrola me daye" nexwe Tirk bixwe zanin û dibêjin „camiler karargahimiz kubbeler migferimiz„ -Mizgeft biryargehên me, Gûmêz kumzirxenên me ne-

Tiştên herî balkêş ku diqewime: lipey operasyonên hizbulahçiyan de 73 imamên herêmê tayina xwe jibo cihê din xwestin û dewletê wan şiyand cihê wan xwestiye.Yanê dewletê di pey ``xizmeta`` wan a li himberî Kurdan wan şiyand cihe bêhnvedanê.

Cihê mixabiniyêye ku hê jî bi hezaran zarokên Kurdan di nava sîstema dinî ya dewletê daye.Hem tên helandin hem dibin dijminê qewmê xwe.

Wek pê tê zanîn Tirken Osmanî zarokên qewmên derdora xwe bi talanê ji wan distend, wan wek Tirk û Îslam perwerde dikirin û di peyda jibo zilm û zora Osmanî dişandin ser qewmê wan bixwe.

Bi kurtayî: Heta haya me ji kirinên Tirkan tunebe û bawerîya xwe bi „biratiya dîn" û „Komara Demokratîk" bînin, wê sîstema modern a „yeniçeriyan" û „dewşîrman" berdewam bike



Pêkhatiyên Kovara «Vate»: Mînaka Hejmara 24an ya Bihara 2005an -1-



Dr. Zorab Aloian

Pêşgotin

Xebatkarên kovara çandî "Vate" ji zû de barê standardkirin, bipêşxistin û berfirehkirina bikaranîna Kirmanckî (Kirdkî, Zazakî, Dimilkî) hildane ser milên xwe. Hetta van yekezanayên hêja di jiyana rewşenbîriya Kurdî de ber çavan e: Malmîsanij, Munzur Çem, Seyîdxan Kurij, Mehmet Uzun (Selîm), Deniz Gündüz, J. Îhsan Espar, Roşan Lezgîn û yên din. Cihê gotinê ye, ku berî çendekê navenda weşana "Vate"yê derbasî Stenbolê bûye. Li gor agahdariya xebatkarên kovarê , di destpêkê de nêzîkî temamiya nivîsan ji aliyê kesên li dervayê welêt dihate amadekirin. Lê îro xwediyên piranîya gotar û reportajan liser axa bav û kalan dijîn. Bê guman ev yek – hem jibo kovarê, hem jî jibo rewşenbîriya Kurdî - nîşaneke serbilindiyê ye.

Eger em nivîsên hejmareke kovara "Vate"yê wek mînak liberçavan bigirin, emê çêtir bikaribin pêvajoya parastin û nûjenkirina zaraveyê Kirmanckî (Kirdkî, Zazakî, Dimilkî) bibînin û binirxînin. Hêjayî gotinê ye, ku di vê nivîsê de wê yek ji van navan - Kirmanckî, Dimilkî yan Zazakî – bê biqelemkirin, lê belê di warê dîrokî de têgîna Kirmanckî kûrtir û dirûsttir e. Ev yek ji aliyê xebatkarên kovarê ve jî tê pejirandin.

Hejmara 4an ya sala 2005an, ya ku hejmara 24an ya kovarê ye, bi kurtenivîseke redaksiyonê ji xwendevanan re destpê dibe. Tê de pêdiviya çapkirina gotar û berhemên curbicur ji bo zengînkirina vî zaraveyê kevnare tê destnîşankirin. Bi rastî jî, ev hejmara kovara kulturî (li gor xwebinavkirina "Vate"yê) 176 rûpelî ye û bi nivîsên cihêreng ve xemilandî ye. Bi dîtina min, mirov dikare serecema hejmarê li gor babetan weha dabeş bike:

1. Beşa zimanzanî

Nivîsa destpêkê encamgotara civîna rêk û pêk ya zanistî li Swedê ye, di kîjanê de pisporên ji hemû herêmên Kirmanckîaxiv yên Bakur civiyabûn û pirsên rastnivîsê û hinde tegînan gengeşe kiribûn ("Derheqê Kirmanckî de Kombîyayîşê Hîrêsine", rûpelên 4-88). Ev jibo hemû Kurdnas û Îranistan deryayeke ferhenga Kirmanckî ye. Lê ezê bala berpirsyarên vê kovarê bikişînim ser pêşdestiyekê: Jibo ku dewlemendiya vî zaraveyê han bi gîştî û zimanê Kurdî bi taybetî diyar bibin, wê baş bûya, eger li kêleka terîpên (parallelên) Tirkî her weha terîpên Kurmanciya Jorîn jî xuya bikirana. Helbet, dil dixwest, ku Kurmanciya Jêrîn û zaraveyê nêzîk yê Hewramî-Goranî jî bihatana bibîranîn û aoya raberzînan firehtir bikirana. Bi çar nimûneyên li jêr ezê têbikoşim, ku mebesta xwe zelal bikim. Peyva veyveke (gelin bi Tirkî) bi eşkere bi peyva bûk ya zaraveyên din ve hevkok e (rûpela 29). Mînaka diduyan li ser rûpela 48an tê xuyakirin: kişlık (bi Tirkî) bi Kirmanckî yi zimistanî ye. Yan formeya zimistan rastnivîsa zivistan (Kurmanciya Jorîn) û zistan/ zeystan (Kurmanciya Jêrîn) şirove dike, çûnke dibe belgeyeke hevguhartina dîrokî ya dengdêrên m û v/w . Balkêş e, ku etîmologiya vê peyvê bi van bêjeyan ve girêdayî ye: Zîma ("zivistan" di zimanên Slavî de) û Sommer/Summer ("havîn" di zimanên Germanî de) . Lewma liser bingeha analîzeke weha meriv dikare formeya zivistan di Kurmanciya Jorîn de wek xwerû bipejirîne. Lê eger em bi tenê kışlık bixwînin, rêya zimanzanî dixetime. Mînaka sisiyan ji bona qenciya hevberkirina zaraveyên Kurdî: Liser rûpela 84an e yapmak (bi Tirkî) nabêje me, ku lêkerên kerdene (Kirmanckî), kirdin (Kurmanciya Jêrîn) û kirin (Kurmanciya Jorîn) di mayeya xwe de yek in û digihijine lêkerên hemwate di zimanên îranî yên din de. Û mînaka çaran: yıl (bi Tirkî) hîç peyewendiyeke digel serre (Kirmanckî) û sal (Kurmancî) nîşan nade. Lê ya hewas li vir ev e, ku di zimanê Kurdî yê berê de hevguhastina dengdêrên r û l pêk dihat.

Keresteya din di vê beşê de analîza ferhenga "Türkçe-Dersimce Sözlük" ya Huseyîn Çakmak e. Xwediyê vê analîzê birêz Munzur Çem liser rûpelên 108-115an liser cîhanbîniya Huseyîn Cakmak radiweste, yê ku çarçoveya Kirmanckî tengtir dike û navê Dersimce (zimanê Dêrsîmê) bi kar diîne. Bê guman, di van mijaran de encamên dîrok û zanistê ji "qenaatê min o şexsî" (gotina Çakmak) giranbuhatir in. Lê îdeologiya Huseyîn Çakmak xwe di tîpa ş Tirkî re bera dike, ya ku ew dewsa tîpa x bi kar diîne. Huseyîn Çakmak bi xwe venaşêre, ku: "Çiqas ke destebera mi ra ame, ez çarçewa alfabeta Tirkî de menda" (rûpela 111an ya gotara Munzur Çem û rûpelên 106-107an yên ferhengê). Her weha Munzur Çem liser kêmasiyên zimanzanî jî radiweste, gelek ji wan lawaziya argumentên amadekarê vê ferhengê diyar dikin. Nimûneyeke berbiçav: Huseyîn Çakmak ji lêkerên kerdene û werdene suffîksa –dene- werdigire û ev yek şaşiyeke gelek mezin e, çunke suffîksa rast –ene- ye û kokên van lêkeran kerd û werd in. Dîsan jî Munzur Çem daxwaz dike, ku her rewşenbîrekî Kirmanc çi ji destê wî tê ji bona vejînkirina Kirmanckî bike.

Gotara Roşan Lezgîn "Terxcume û Averşîyayîşê Ziwanî de Rolê Tercumeyî" hinde pirsên teorî û praktîkî dike mijar (rûpelên 117-121). Wek mînak, birêz Roşan Lezgîn wergeran agahdar dike, ku ew hevokên tirkî yan farsî bi rengekî mekanîk nekin Kirmanckî û cureyên vegotina kurdî bi qelem bikin: "Adınızı lütfeder misiniz?" (bi tirkî), "Êsmê şerîfet?" (bi farsî) û "Nameyê to bi xeyr?" (bi Kirmanckî).

Lêkolîna Ehmedê Dirihî "Kirmanckî de Namedayîşê Nebatan" liser rûpelên 127-132 berdewama nivîsa wî ji hejmara berê ye. Agahiyên birêz Dirihî bi rastî xezîneyek in ji bona hevberkirina zarave û devokên kurdî. Gava min dît, ku hejmareke mezin ji peyvên Dimilî û bêjeyên devoka Serhedê (devera Qersê) yeksan in, ez pê re heyrîm. Rewa ye, ku beşeke van peyv û têgînan ji bilî Qersê û zaraveyê Kirmanckî di devokên din de nayê bikaranîn.

Gotin û îdiyomên Zazakî bûne mijara du nivîsên din. Serdar Bedirxan di "Tayê Îdyomî" de (rûpelên 148-149) weke 30 îdiyomên balkêş bi rêz dike û şirove dike. Mehmûd Nêşite jî xwe disipêre jêmayiyên devkî li derdora Licê: "Dorûverê Licê ra Tayê Vateyê Verênan" (rûpelên 157-159).



Ömer ÖZMEN

Li dij El-Qeyde, operasîyonên bêdil

Keştîyên ku tûristên Israîl dianîn Tirkîyê, ji nişkava rota xwe zivirandin lêmana Qibrisê. Jibo ku istîxbarata Israîl, li dij keştîyên wê, amadekirina çalakîyên teroristî tespit kiribu.

Xuyaye Israîl, di derheqê pêywendîyên Tirkîyê û El-Qeydê de xwediyê istîxbaratên mezin e û jibo vê yekê jî, rayedarên dewleta Tirk îkaz kirîye.

Hefteya buhurî, liser van hewildanên Israil Emnîyeta Tirk, mecbûr ma ku, li hemberê cend teroristên El Qeydê operasyon pêkani.Di encama operasyonan de, teroristek bi navê Luaî Sakra, li balafirgeha Amedê hat girtin.Piştre, hevalê wî yê, bi navê Hamed Obysi jî, li Antalyê tevî 1000 kilo maddeyê teqemenîyê hat girtin. Li gorî capemenîya Tirk, Luaî Sakra, berpirsîyarê Usame Bin Ladin, yê Tirkîyê ye. Di iraqê de, bi Ebu Musab Elzarkavi ve girêdayîye.

Ev kesana , hemwelatîyê Surîyê bûn. Di dema girtina xwe de, di nav polisên Tirk de, li hember kamerayên televizyonan, bi qasî hemwelatîyek Tirk,perfekt Tirkî diaxivin û propoganda El-Qeydeyê dikirin. Di nav ajitasyona wan de, sirovekirinek balkêş xwe nîşan dikir. Weha digot berpirsîyarê El-Qeydê : „Em Tu carî, li dijî Tirkîyê calakîyan pêknaynin."

Raste. Çawa min di meqaleyên xwe yên berê de jî dîyarkirîbu, hemî çalakîyên terorîstên islamîperest, li dij dewletên rojava, gelên Kurd û Cihû hatine bikaranin. Bi taybetî, calakîyên li Tirkîyê û Kurdistana başûr hatine bikaranin, vê tespîta min, bi awayekî zelal ispat kirîye.

Ji aliyên din, hemî rêxistînên terorîst, ji dewletên totaliter û nivtotalitêr, alikarîya lojîstik, îkmal û îaşe distînin. Ev dewletana, di heman demê de, li dij tevgera Kurd, di nav îttîfaqên bingehin de ne.Jibo demokratizekirin û veguheztina herêmê jî, li dij dewletên rojava, di nav hewîldanên xef de ne.

Ez bawerim dewletên rojava, ji van têkilîyên dewleta Tirk ya kûr agahdarin. Lê, jibo berjewendîyên xwe yên aborî û siyasî, politikayek oportunistî bikartînin.

Ji van têkilîyên dewleta Tirk a kûr û El Keide yê, gelek delîl derketine holê.

1-"Li gorî agahîyên CIA yê.berpirsiyarê Bin Ladin yên Emerîkayê, Tarik Hamdî, li Tirkîyê, di Ambasadora Iraqê de Diplomate." (Rojnama Yeni safak-12.08.2005)

2- Mehmet Eymür îtîraf dike ku, berîya bûyera 11 Îlonê, di sala l999 an de, Serokê istixbarata Tirkîyê Senkal Atasagun,teslîmkirina Usame Bin Ladin pêsniyarê CIA yê dike.Wê demê serokê CIA yê Tenet,li Bajarê Langley de, ji Atasagun, di derheqê teslimkirinê de proje dixwaze. Atasagun, di proja xw de, jibo pêywendîyê Ladin, navê KASIF KOZIOGLU tîne rojevê. Kasif Kozinoglu, wê demê, li Afganistanê alikarên serokê Özbek Rasit Dostum perwerde dike û bi Bin Ladin re têkildare.Kasif Kozioglu berpirsyarê fermandariya tevgera taybetî ya Tirkiyê ye.

Li gorî agahîyên Eymür, ev proje, pistre tê îptalkirin. Eymür, di derheqê sedemê îptalkirinê de tu agahî nade û dibêje „sirê dewletê ye" (Ferhat Ünlü, Eymür ün Aynasi-rupel:88,89,90)

Navê Kasif Kozinoglu, dû re, di pirsgirêka Allatin Cakici de derket rojevê ku, bi navê MIT ê, jibo betalkirina cezayên Cakicî, bi serokê Yargitay a Tirk re hevdîtin cêdike.

3- Pistî teqemenîyên qûleyên cêwî ; di Capemenîya cihanê û Tirk de cîh girt ku, firoka Usame Bin Ladîn, di nav sala 1986 û 1998 an de, 6 cara, li bajare Edenê balafirxana Sakirpasayê danîye.Ev danîn, ji terefên rayedarên balafirxanê ve, ji dervayê zagonên navnetewî hatîye vesartin.

Ev peywendîyana eşkere dike ku, di nav dewleta Kûr de, alikarên El-Qeydê cîh girtine û Tirkîye wek baregeha terorîzma İslamîperest xwe nîşan dide.

LIVBAZÎYA TOREYÊ



Miço Kendeş

Folklor wek her tiştên li cîhana me ya grover berxwedanê jibo hebûn û berdewamîya xwe dike û xwe bi xwe nû dike ta di bîra dîrokê de zengarî nebe. Tore ne bi rêya, yan jî bi destên kesekî xwe li gor serdemê nû dike, lê bi destên pirr kesan. Çerxa folklorê eynî wek jîyana kesan e ; her yek nameya pîroz ya dîroka mirov radestîyê bi dû xwe dike. Tore bi saya gohertinên hûrik û biçûk di nav parsîyên xwe de, serdemkirin û vejandina xwe bicîh dike û misoger dike : bi gelemperî, folklora me serdema bav û kalên me ye û serdema me dê folklora yên bi dû me ye.

Ev bû demeke ne kurt ku ez liser liva toreya Kurdî dixebitim û hewil didim, wek endamekî civaka Kurdî, bi erkê xwe yê mirovane û şarestane li hember qonaxa serdema xwe rabim û nerx û sûdeyê ji hebûna xwe re bibînim.

Ji folklora Kurdî emê liser beşê strana Kurdî rawestin. Li gor lêkolînên min û nerînên min yên kesane, ez têgihiştim ku pirr xalin di strana Kurdî ya folklorî de hene bi serdema me re nameşin, nimûne :

Di strana (Edûlê), vêrsiyona bi dengê nemir Gerapêtê Xaço hatîye tomarkirin, de hatîye :

.....

Lê lê Edûlê

Minê xwîna heft mêran û mêrxasan li bavê te bî

Ezê bi çepelê Edûla xwe bigrim dîsanê birevînim

Ezê bavêjim mala Cemîl Axa cem Mîrê (digurdila)

Emê ji sibê heta êvarê bikin rev û nêçîrê

Êvara şevê emê rûnin bikin agirî daran

Serê sibê rabin buxin goştê şalûlan û bilbilan.

.....

Li gor şert û mercên jîyana sert ya demên par mirov dikare egera xwarina goştê şalûlan û bilbilan, di stranan de, fêm bike, lê gotinên wesa di van rojên me de wek hovane tên dîtin û binavkirin.

Ev strana destane ya dagirtî ji evîn, mêranî, tenikbûn, canfîdayî û romansî divabû bi hevoka emê buxin goştê şalûlan û bilbilan bi dawî neba, jiber ku tiştê herî xweş di şalûl û bilbilan de, û li gor dîtina evîndaran, ne goştê wan e, lê dengê wan e.

Dema min ev stran stra bêyî ez bixwazim û pilan bikim min got :

Emê bibhîsin dengê şalûlan û bilbilan.

Belkî ev jî ji zarokên me re, rojekê ji rojan, bibe folklor, mirov nizane ???

Çima Navenda PENa Kurd ne li Kurdistana azad be!?



Selwa Gulî.

PENa Kurd, wek saziyek nivîskaran ya navnetewî, dikarîbû heta niho liser lingan bimîne, ew jî ji dilsoziya wan kesên ku dameziandin û yên liser mane.

Lê divêt ji bîra me neçit, ku pir gengeşî liser şêweyê birêvebirina wê ve çêdibe.

Gengeşiya liser serbixweyî, an jî serbileyanê partiyekê ve, pir nivîskar dûrî vê dezgeha Kurdî-navnetewî ketin .

Ji bilî van jî, di demên dawî de, liser astengên di navbera PENa Kurd û PENa Kurd ya li Amedê hatiye damezirandin û guftûgoyek û gotarên ku bi çi şêweyî xizmeta wêje, tore û pirsa Kurdî nakin hatine arayê û dilnexweşiyek mezin kete nav nivîskaran de, ta radeya, ku rêzdar Terry Carlburm, sekreterê PENa navnetewî ya berê kete nav wan û dîsan jî ew kêşe ta niha çareser nebûye.

Ez naxwazim, liser xalên hûr û yên di encamê de mefa nadin pirsa wêjeya Kurdî û pêşvebirina wê rawestim. Lê dê babeta -Bo çî Navenda PENa Kurd ne li Kurdistanê be?-, bînim qada danûstendinê.

Ev çend sal in, PENa Kurd li derveyî welêt hatiye damezirandin (Elmaniya), hindek ji nivîskarên Kurd yên li Europayê dijîn, karê vê navendê bi rê ve dibin.

Lê piştî van guherînên dawî û roxandina rêjîma Sedam û projeyê Emerîkayê jibo demoqrasîkirina rojhilata navîn û naverast, merc û nîr bûne bi şêweyekî din, Kurdistana azad, ji hêla siyaşî û aborî, rewşenbîrî û ragehandinê ve bi hingavên berçav bi pêş ve çûye û zemîn hatiye xweşkirin, ji hemî sazî û dezgehên civaka sivîl re, daku kar û barê xwe bi şêweyekî ta radeyekê azad û serbixwe bi rê ve bibeyn, pêdiviye cihê PENa Kurd, jibo Kurdistana azad bête veguheztin.

Eger hat û Navenda PENa Kurd baregeha xwe li Kurdistanê dane, divêt çi bête kirin? Pêdiviye PENa Kurd çi biket? Ta çi radeyê dê bişê xwe ji nav dest û lepên wê hêza ku ta niha alîkariya wê kiriye û wê wekî organek xwe bi rêve dibe, -ku eve jî behweriya pir mirovên Kurd ên nivîskar e- rizgar û azad biket? Dê Kurdistanî(Nivîskar) bi çi çavî berê xwe bidin vê saziyê?

Gelo hikûmeta herêma Kurdistanê dê alîkariya vê saziyê biket, mîna saziyek sivîl, piştî ku ev sazî biçesipîne ku saziyek serbixwe ye? Pêdiviye guherankirinên bingehîn di vê saziyê de peyda bibin an na? Gelo nebaştir e, ku navend li Kurdistana azad bit û şaxên wê li parçeyên Kurdistanê ên din bin û li her devereke nivîskarên Kurd lê hebin? Yan jî di berjewendiya kultûra Kurdî de ye, ku navend li Europa bit û şax li Kurdistanê (4 parçe) hebin?

Serederiyên vê navendê bi şaxan re û şêweyê têkiliyan wê çawa bit?

Ev pirs û gelek pirsên din, ku ez behwer dikim, pêdiviye ev roka bêtin kirin, da em Kurd bi giştî û nivîserên Kurdistanî bi taybetî, ji warê herêmî û xelekên teng derkevin û xwe li dergehên qada cîhanî bideyn.

Jibo Kurd ne tenê li ser asta mafê mirovan û siyasetê xwe bilivînin, belê liser asteyê rewşenbîriyê û di qada wêje û zanistê de jî roleke wan berbiçav li cîhanê hebîtin û nivîskarên Kurd mîna hemî nivîskarên cîhanê bi serfirazî, bibêjin: Eve ez im û eve tore û wêjeya min e.

Di behweriya min de, Kurdistana azad baştirîn zemîn e, jibo geşkirina saziyên rewşenbîriya Kurdî, çunkî dê nivîskar ji milmilanetiya bêsûde derkevîtin û destêt alîkariyê wê bibe destekî fermî û rewa, hinga rewşenbîrên Kurd, dê bişên dezgehên xwe ên pisporî bi serbestî û bêtirs damezirînin, bêyî ku ji rawestana wê jiber meseleyên aborî bitirsin.

Ji demeke dûr û dirêj ve, li wî parçeyê ku ev roka bi xwîna şehîdan hatiye azadkirin, miletê Kurd li deverê bi Kurdî perewerde dibit, bi Kurdî wek zimanekî fermî diaxivit, bi Kurdî xewnan dibînit, çiya teyr, tilûr, devî, dehl û geliyê wê jî çîrok û destanên qehremaniyê ji êkûdu re vedibêjin, ango hişê Kurd, bi Kurdî hatiye perwerdekirin û eve ye ciyawaziya vî parçeyî ji yên din.

Bi kurtî eve ye, behweriya min liser anîna navenda PENa Kurd jibo Kurdistana azad. Lê eve jî prosesek e, divêtin berahîka wê pir xal zelal bibin.

Ma rast e, ku PENa Kurd bête Kurdistanê û şaxekî jibo xwe li Duhok, Hewlêr , Silêmanî û her şarekî dîtir vekêtin, wekî serokê êkîtiya nivîserên Duhokê Hesen Silêvanî di hevpeyvîna xwe de, di gel malpera Avesta gotiye? Gelo em dikarin PENa Kurd wekî dezgehek biyanî bihesibînin? Ev derbirîna Hesen Silêvanî, behweriya wî ya kesayetî bû, yaxud bîr û boçûnên desteya rêvebir ya êkîtiya nivîserên Duhokê ne? Gelo Hesen Silêvanî liser vê babeta giring û mişt alozî û pirsgirêk, civîn jibo endamên êkîtiyê lidarxistine û behweriyên wan wergirtine, ta ku wê biryarê bidet, ku PENa Kurd, dikarê bêt û şaxekî xwe li Duhokê vekit û dê piştgiriya wê bêt kirin?

Ma ne baştir û çêtir e, ku PENa Kurd bi xwe navenda wê li Duhok an jî her devereke li Kurdistana azad bit?

Ez nizanim ta çi radeyê, Hesen wî mafî didete xwe wê biryarê bidet, ku PENa Kurd, bi vê rewşa niha tê de- di gel pirsgirêkên bi PENa Kurd re li Amedê- biçîte Kurdistanê û li Duhokê şaxekî vekit

Di dawiyê de, pirsiyarek xwe dihênîte arayê:

Eger PENa Kurd hat û şaxê xwe li Duhokê vekit, dê rola êkîtiya nivîserên Duhokê çi bit? Dê çarenûsa êkîtiyê û dezgehên nivîskaran li seranserî Kurdistana azad bikevîte çi rewşê?



Jinekolog, mêrekolog, dînekolog. Prof. Dr. Fatê Were Civatê



Şêxbat

Essalamunaleykum Fadîma Xanim,

Min bihîstîye ku tu derdan derman dikî. Ez 69 salîme û Xatûna min 40 saliye. Min nizanîbu ku jin ji 40 salî û jor de buhara duduya dijîn. Ev jinika malkambax her du şevan carekê girrê xwe di min dide, wek gurê ku çav li mîhê keve, zimanê xwe li dora devê xwe dixe û êrîşî min dike. Ez geh dibêm serê min dêşe, geh dibêm zekemî bûme û geh dibêm westîyame. Êdî ez nema karim vê jinikê bixapînim. Hinek dibên hebikin hene navê wan Viagra ye. Yanî kesê ku yekê ji wan bixwe agir dikeve nava wî û dibe wek xortekî 17 salî. Gelo te ev hebikên navê wan Viagra bihîstine? Çi tecrûba te heye? Ger tu zanibî tu karî ji kerema xwe navnîşana ciyê wan bidî min?

Melayê doxînsist /Batman

Kuro Melayê Doxînsist, lao ma qey hûn Mela tev doxînsistin hey agir bi mala we ketino! Hema heçê Melayê go min dîtine yan doxînsistin û yan jî çavliderin haa! Carekê jî doxîna xwe ji paşde sist bikin ma dinya xeradibe malneketno! Te go xanimka te pistî çilsalî harbûye û zimanê xwe li dora devê xwe dixe? Çima ma qey fişekên te qediyane rebeno! Wîîîî, peppûko hema here cem Melayê gundê me wê çend fişekan bi xêra xwe bide te, ma dinya xeranabe! Tu çima nabê wek van serokên me yên li Ewrûpa hatiye serê te qiriko! Serokên me yên li Ewrûpa jî jiber go fişekên wan nemane nema karin bi jinên xwe îcar di şûna wê de bihevdikevin û serê hevdû dixwin, heyfa jinên xwe jihev hiltînin haa! A baş tu jinka xwe bişîne cem Fatê xanim, bi serê te ezê bikim go xanima te bibe wek Monika Lewînskî û herroj dibin serokekî de xwe bavêje erdê! Lao Melayê Doxînsist, ma ezê hebên Viagra bidim kê û nedim kê bavê min! Febrîqa Viagra ne li cem min e, li bajarê Ruhayê ye! Yanî Demokratîk Cimhûriyetê dest daniye ser febrîqa Viagrayê jibo go Kurd hebên Viagra nexwin, tuxmê wan zêde nebin û hemi wek Evdokê me bêdûnde bin! Bi serê te Viagra jî nema mêrkê te radike loo!

***

Fatê xanim, wê rojê Serokwezîrê me Erdoxan hat Amedê û dest bi çirok û helbestan kir. Erdoxan ji Osman Baydemîrkê me xeyidîbû û gotibû "ez qehwa wî jî venaxwim!" Liser vê Baydemîrkê me ji got "madem wisaye ez jî nahêlim 1 milyon însan pêşewaziya wî bikin!" Û birasti ji 500-600 kesî tenê bixêrhatina Erdoxan kirin. Piştre Baydemîrkê me poşman bû, rahişt fincanek qehwe û çû balafirgehê pêşewaziya Erdoxan kir. Erdoxan qejwa wî venexwar û got "Ez mesela Kurd bi qehwakê çareser nakim, ezê bi yek al, yek millet û yek dewlet çareser bikim, çareseri demokratîk Cimhûriyet e, ne qehwe ye!" Îcar Baydemîrkê me jî bû "şeqşeqa" wî û jêre li çepikan xist. Birasti ez nema zanim çi bêjim, de hema tu berdewam bike xaltîka Fatê!

Mihoyê Cilêtçî / Amed

Lao Mihoyê Cilêtçî, hey pêxwas kurê pêxwasan, ma çi eleqa min û Baydemîrkê te bihevre heye oxlim!Baydemîr ji Serokê xwe re qehwe biriye, çayê biriye, wîskî biriye, jehr biriye ma serê min pê dêşe lao, weyy! Ê oxlim, madem Erdoxan qehwe venedixwar, bila Osmankê te jî "kapiçîno" jê re çêkira ma dinya xiranedîbû! Ê Mihoyê Cilêtçî, oxlim, biner min digot "Serokê KKK pir biaqil e" we digot na! Serokê KKK berê got"demokratîk Cimhûriyet, yek al, yek millet û yek dewlet!" Demokratîk Cimhûriyet yanî "garana kê kir kê", yek al yanî "Tirk bayraxî", yek dewlet yanî " Demokratîk Faşist Tirk Dewletî" yek millet yanî "em hemi Tirk in".Ma jixwe Serokê Dadgeha Bilind Samî Selçûk jî nedigot "bijî Demokratîk Cimhûriyet!" Yaaaa, te dît nee!? Te dît bê Serokê KKK çi aqil dide dewleta Tirko û Virqo newlo!? Lê tu zanî mesele çiye Cilêtçî Miho? Hingî min aqil daye xelkê hişê min nema dikşine, ez nema zanim gelo"ne hefsarê dewletê di destê KKK deye û ne hefsarê KKK di destê dewletê deye!" Mihoyê Cilêtçî, te çima cilêtek navêt Erdoxan hêbext!?

Çengelpirs

Siyasetmedarê li wêne	Tore, kultur	Bêbav, bêkes		Keramet, delîl		Zêrê pelik û girover	Zengînî, sermayedarî		Li Amerîka rêxistinek ewlekariyê	Mezinahî, heykel, bilind	
							Terbiye, hurmet				
Kûçika mê, mêw				Navekî jinan						Paytextê Kurdistana azad	
Serserî, bêkar						Alav, alet, hacet	Yehşemb, bazar				
				Fîdan, terhik	Ala piçûk				Sertîpên Endam û enî		
Dadmend, heqdar	Mêr, zilam	Kevnedewletek Kurd / Taze, nekevn					Dara trî, dêlî				Xurek, xwarinhez
					Zik, nav				Notayek / Xwedayek		
Bahol, buxçik / Rûçik, serûçav			Heywanek jehrî / Plaka Almanya				Bêêş, rihet				
				Jîndar, rûgeş	Ne ziwa, bi dar û ber	Debarî, meşandin / Kok, damar					
			Bajar				Notayek muzîkê		Kesê yekem	Çêbû, hat dinyayê	
			Navbera roj û şevê / Cephe, hevkarî					Egoîzm, xweperestî			
						Ne buha, maqûl					

Remildank

Beran (21.03-20.04)

Ji xwe haydar be û li tenduristiya xwe miqate be. Hêvîdar be û bêhêvî nemîne. Mêvan û nûçeyên xêrê tên.

Gamêş (21.04-20.05)

Haya te ji te hebe, bila dost û hevalên te te nexapînin. Bila hinekî haya te ji mala te jî hebe. Haydar be.

Cêwî (21.05-21.06)

Tu bêriya romantîzmê dikî. Îro li derveyî daxwaza te karin hin tişt biqewimin.

Kevjal (22.06-22.07)

Tu dixwazî serê xwe rehet biki. Kêfa te ji qelebalixê re nayê. Xwe rehet bike, bigere.

Şêr (23.07-22.08)

Wê roja te baş derbas bibe. Evînî û şahî heye. Macera jî heye, jî xwe haydar be.

Simbil (23.08-22.09)

Wê roja te rehet û xweş derbas bibe. Ji hevala / lê, xwe hez bike, romantîzm xuya dibe.

Mêzên (23.09-22.10)

Tu dixwazî rêwitiyê biki. Dixwazî têkevî nava civatek nuh û kêf û şahiyê biki. Enerjiya te pir e.

Dûpişk (23.10-21.11)

Tu bawer dikî ku, zêde bûyêr naqewimin û derdê kesên din dikşînî. Ji xwe re taswasan çêneke.

Kevan (22.11-21.12)

Enerjiya te pir e û tu livbaz î. Tu tim dixwazî tiştina biki û vala nemînî, tempoya te bilind e. Zêde xwe neêşîne.

Kovî (22.12-19.01)

Tu dixwazî bi tenê bî û xwe bi karê xwe mijûl biki. Nûçe û payamên xêrê hene. Bêhnfireh be.

Satil (20.01-18.02)

Jibo te rojek tevlihev e. Kêfa te li cî ye. Tu dixwazî hin karên baş biki lê newêri. Tirsa xwe ji ser xwe bavêje.

Masî (19.02-20.03)

Zêde bûyêr çênabin, siûd û bextê te heye. Dibe ku hinek pare têkevin destên te.

Pêkenok

Evdo

Evdo bêkar bû, ji xwe re li kar digeriya. Carekê di rojnameyekê de anonsa karekî dibîne û kêfa wî pir tê. Radibe telefonî xwediyê kar dike:

-Gelo wê meaşê min çiqas be?

Xwediyê kar lê vedigerîne:

Meha pêşî 200 milyon, meha dido û sisê 250 milyon û meha 4,5,6 350 milyon.

Evdo lê vedigerîne:

-De başe, wî çaxî ezê pistî sê mehên din bêm kar!

www.arsiv.org





Keleha Farqînê



Amadekar: Mehmet Çetîntaş

Dîroka avakirina keleha Farqînê nayê zanîn. Lê li gor Ewliya Çelebî, bi kêmayî bi qasî keleha Amedê kevn e.

Sûrên Farqînê duqat hatine avakirin û di navbera herdu sûran de rêyek fireh hebûye. Stûrî û firehiya sûra hundir 4.5 mîtro û ya derve jî 1.93 mîtro ye. Sûra derve neha hindik be jî, ji aliyê deriyê Amedê ve tê dîtin. Keleh çargoşe ye. Ji rojhilat ber bi rojava ve 600 mîtro, ji bakûr ber bi başûr ve jî 500 mîtro, bi giştî 2200 mîtro dirêjayiya kelehê ye. 50 birc û kulek di kelehê de hene. Dirêjiya bircan ji derve 10.5 mîtro û berên wan jî 7 mîtro ne. Bilindahiya wan zêdeyî 25 mîtroyî ne. Di navbera du bircan de dîwarek jibo destekê heye. Mesafeya di navbera du bircan de ji 20 mîtroyî zêdetir e. Niha ji xeynî çend bircan ku ew jî texrîb bûne, bircên kelehê û keleh bi xwe jî nemaye, Kevirên ku pê keleh avakirine, dirûvê kevirê Maltayê dide, spî û hişk in. Kevir bi hostatiyek mezin hatine şehkirin, ango birîn. Evliya çelebi jibo avakirina kelekê weha dibêje: „ Ev keleh di navbera çemê Şatê û Batmanê de ye û li ser daxwaza Hz. Cercîs, ji aliyê pêgirtiyê wî Melîk Handîk ve hatiye avakirin.“

Li gor çavkaniyan neh deriyên kelehö hebûne. Çar ji van li başûr, du li bakur, du li rojava û yek jê jî li rojhilatê bajêr bûye. Ji van deriyan ên ku niha tênezanîn ev in: Deriyê Meyxanê, Deriyê Boşatê, Deriyê Qulfayê, Deriyê Taxa Jêrîn û Deriyê Amedê. Liser dîwarên kelehê nivîstekên ji dema Eyyûbiyan, Artûkiyan û Merwaniyan hene. Herî zêde di dema Hulagu de, keleha Farqînê hatiye rûxandin. Di sala 532yan de jî ji aliyê împaratorê bîzansî Justîniyen I. ve hatiye restore û qewîkirin.

ŞIKEFTÊN HESÛNÊ

Şikeftên Hesûnê ber bi rojavayê bajêr ve, nêzîkî 8 km li derveyê bajêr e. Li ser rêya di navbera Farqînê û Batmanê de, dema mirov ber bi Batmanê ve diçe, liser milê çepê dikeve. Ev di rastiya xwe de bajarek ji şikeftan e. Di qûntara çiyê de, beriya ku mirov bigihêje şikeftan xirabeyên Hemamek hene. Ev avahî ji kils (kirêc) û tûxlayan hatiye avakirin û di rengê mîmariya Romayiyan de ye. Li serê vê avahiyê, çalek heye ku av lê kom dibe û dibe gol. Hinek li jortir jî dêrek heye. Bilindahiya vê dêrê 7 mîtro ye. Mîhraba dêrê mina nîvdaîreyekê ye. Dêr liser sê kemberan hatiye avakirin.

Sira di van şikeftan de veşartî mirovan serxweş dikin û dibine serdema kevirî. Di deriyên teng de mirov dikeve hundirê şikeftan lê dema mirov dikeve hundir, ode û salonên mezin, di nav hev de, du tebeq û yekpare derdikevin pêşberî mirovan. Herweha dêrek mezin jî heye ku salon û mîhraba dêrê di nav



zinaran de vedane û çêkirine. Ji jora çiyê ber bi jêr ve, liser zinaran cîh hatine vedan. Ava berf û baranê ji van cîhan diherike û li jêr, li sarincan kom dibe. Zinarên vî çiyayên ku ev şikeft lê hatine kolan û vedan ji kevirên nerm û gewr pêktên.

TEMTEMBURK

Temtemburk navê sê şikeftan e. Ev şikeft liser çiyayên Elbatê, liser rast û çepê rêya Boşatê ne û her yek ji wan odeyek e.Ev şikeft jî mîna şikeftên Hesûnê bi dest hatine çêkirin lê dîroka kolan û vedana van şikeftan nayê zanîn. Ji van hersê şikeftan, di ya herî mezin de du ciyên razanê ji kevir hatine çêkirin. Mirov bi pêpelûkên ku di zinaran de hatine neqişandin ber bi van şikeftan ve hildikişe.

KELEHA BOŞATÊ

Keleha Boşatê li bakurê Farqînê ye û ew herêm xwedî gelek berhemên dîrokî ye. Di demên berê de ev keleh mîna zîndan hatiye bikaranîn. Taybetiya vê kelehê ewe ku liser zinarekî hatiye avakirin û dagîrkirina kelehê pir dijwar û zahmet e.

MALABADÊ

Pira Malabadê di dinyayê de, di nav pirên kevir de xwedî kembera herî mezin û fireh e. Li gor ku di nav gelê herêmê de tê gotin, pir ji aliyê Badê kurê Dostik ve di dema Desthilatdariya Merwaniyan de hatiye avakirin ku loma jê re gotine Mala Bad ango Mala Badê. Înşaata pira Malabadê çend car xera bûye. Liser pirê hin nivîstek û fîgur hene ku neha baş nayêne xwendin. Ev nivîstek û fîgurên liser vê pirê, dişibine nivîstek û fîgurên Heskîfê û pirên li Cizîrê. Dirêjiya pirê 220, fireyiya wê jî 7 mîtro ye. Fireyiya kembera pirê 40 mîtro û ji nîvê kemberê bilindahî jî 20 mîtro ye.

Di salên 1950 an de dewletê li kêleka pira Malabadê pirek nû çêkir. Rêya navbera Farqîn, Batman û Bedlîsê di ser vê pira nû re derbas dibe. Pirek mîna pira Malabadê lê jê piçûktir jî, berê ji aliyê kalê Bad Kemûk ve hatiye avakirin ku neha ji wê pirê û ji gundê ku liber wê pirê hatiye avakirin re jî dibêjin Pira Kemûkê û gundê Kemûkê.

KELEHA ZEMBÎLFROŞ

Keleha Zembîlfroş, keleha herî kevn a Farqînê ye. Tê gotin ku di dema Tîgranê Mezin de hatiye restorekirin û mezinkirin. Piştre Marûta (Marûsa) keleha mezin avakiriye. Keleha Zembîlfiroş navê xwe ji destana Gulxatûn û kurê mîrê Hekarê Zembîlfroş digre. Jiber vê destanê, yek ji cihên ku herî zêde li Farqînê navdar e û li seranserê Kurdistanê hatiye nasîn û bûye malê hemû gelê kurd jî, ev keleh û ev destan e. Lê mixabin ku niha ji wê ezameta keleha bi nav û deng zêde tiştek lipaş nemaye.

KELEHA MALA MÎRAN

Ev keleh, di dema Selîmê II. Padîşahê Osmaniyan de, ji aliyê Behlul beg ve tê avakirin. Behlul Beg ev keleh, jibo parastina xwe ya li dij piştgiriyên Safewiyan bi milê xelkê ava dike. Di nava bajêr de, girek çargoşe û ji axa ku bi pişta gelê Farqînê hatiye kişandin, ava dike. Derdora vî girî bi dîwaran diparêze. Girek wisa bilind ava dike ku ji ser banê koşka mîr ku ew jî liser vî girî tê avakirin, dema mirov li derdorê dinêre, çaraliyê bajêr û derveyê bajêr tê dîtin. Parastina vî girî û kelehê hêsan e, lê dagîrkirin û bidestxistina gir jî pir dijwar e. Lewra hevraziya gir nêzî 45 dereceyî ye. Gir hîn heye û hin xanî û avahî jî liser hene lê ew jî her wekî keleha Zembîlfroş ji bêxwedîtiyê, ew mezinahî û ezameta xwe wenda kiriye.



Bela zivistana we kesk û sor be!

Rêberên ku modeya kincên zivistana îsal diyar kirine, li her tiştî fikirîne. Ji elegantiya kincan bigre, heta bi germiya rengên wan, hertişt bi hev re di nava ahengê de ye û alîkariyê dike ku şopdarên modayê li xwe neheyirin. Hûn dikarin bi hêsanî kirasên kin yên gulgulî bi ser pantoran de lixwe kin. Qumaşên ku weke cildê şêr û pilingan hatine neqişandin, vê zivistanê jî dikarin cihekî taybet di dolabên we de bigrin. Bi taybetî jî hûn dikarin vî cure qumaşî, ji bo çakêt, qapût, etek û kirasan bikar bînin.

Etekên zivistana îsal, heta kabokê ne, pantor jî yên ku ji jor heta jêr weke hev hatine qusandin û hinekî delingên wan kin in mode ne. Bot, îsal jî weke par girîng in. Lê belê botên îsal hinekî ji yên par cuda ne. Li şûna botên sertûj, vê zivistanê botên serê wan girover mode ne. Qundereyên îsal jî sergurover in. Ji bo şev û şahiyan, qumaşên ku dibiriqin jî bîr nekin. Di kirasên şev û şahiyan de wê îsal modeya salên 60,70 û 80î careke din vegere. Kirasên femenîn, yên ku temamê bedewiya bejna jinan pêşkêş bikin, wê li herderê werin dîtin.

Di aliyê rengan de, zivistana 2005an, kesk û sorê tarî ye. Bêguman hûn ne mecbûr in, dest ji rengê reş, maron, zîvî û şînê ezmanî jî berdin. Bi hev re bikaranîna van rengan tevan jî ne xerîb e!

Îsal wê taximên çakêt û pantorên ku ji qumaşên bi çargoşeyên mezin hatine çêkirin, cihekî girîng bigrin. Lê ne şerte ku herdemê di bin çakêt de pantor hebe, hûn dikarin etekên mîna yên Skotlendiyan jî bikar bînin. Di bin taximekî wiha de, cotek qundereyên kabik bilind yan jî botên dirêj û kin wê xemla we temam bikin.

Wê çakêt, lepik, çente, qundere, qayîş, desmal û yaqeyên cild jî îsal rengîn bin.

Ez nizanim ew yaqeyên kurkên salên 70î tên bîra we an na? Ew yaqeyên ku weke atqiyê li dora qirikê dihatin gerandin û serê heywanekî pê ve daliqiyayî bûn...

Heger werin bîra we jî ji bîr bikin. Ji ber ku modeya zivistana îsal xwe nêzîkî wê şêweya yaqan nake. Bi yaqeyên îsal ve tiştek nayê daliqandin. Bi piranî herdû aliyê yaqê, li pêş bi hev ve tên girêdan û hûn dibin weke keçikeke 14 salî. Îsal kurkên salên 70î mode ne, bi taybetî jî yên ku ji cildê kîvroşkan hatine çêkirin. Bêguman em behsa cildê eslî nakin. Xwedê neke ku hûn destê xwe bavêjin cildê heywanan yê eslî û xezeba heywanparêzan bînin ser xwe! Hûn dikarin li herderê cildê texlîdî bibînin.

Hûn dikarin derziyên ku di salên 50î de mode bûn û temamê jinên modern dixistin ber çakêtên xwe jî îsal bi hêsanî û bê destûr bikar bînin. Derziyên ber çakêtan vê zivistanê heyfa salan hiltînin. Hûnê îsal derziyên curbecur yên weke minminîk, gul û fîgurên heywanan bi çakêt, fanêre ,blûz û qapûtan ve bibînin. Tentene jî di kincên zivistana 2005an de xwediyê giraniyeke mezin e.

Dibe ku destpêkê çavên mirov fêr nebin û pir kes bifikirin ku tentene taybetmendiyeke kincên binî ye, lê wê piştre çav fêr bibin û ewê bibe perçeyek ji xeml û xêla herkesî.



Bayiyên Zelal

AKCAN GmbH
Hamburg
Tel.: 040 723 402 96

LIZA GmbH
Berlin
Tel.: 030 390 380 30

ESD Softdrink Gmb
Mannheim
Tel.: 0621 318 76 70

TRINK-ZEL II
Düsseldorf
Tel.: 0211 49 62 150

CAN GETRÄNKE
Essen
Tel.: 0201 289 74 17-18

TRINK-SEM
Dortmund
Tel.: 0231 981 86 23

HARRAN GmbH
Fellbach
Tel.: 0711 592 08 64

CHAPLIN GETRÄNKE
Bremen
Tel.: 0421 691 96 78

EURO-FRESH-FOOD GbR
Erfurt
Tel.: 0361 26 27 516

TRINK-ZELI
Köln
Tel.: 0221 977 63 11

NERGIZ
Tel.: 02562 22 168

Nûrî Dêrsimî:

TOLHILDAN! TOLHILDAN! TOLHILDAN!

Pîrkemal



Nûrî Dêrsimî di Adara 1892an de li Hozatê gundê Axzunik hatiye dinyayê. Bavê wî ji eşîra Milan û diya wî jî ji eşîra Axûçan e. Jiber ku dê û bavê wî jiber sedemên lihevnekirinê ji hev vediqetin, Nûrî li cem bavê xwe mezin dibe. Bavê Nûrî Dêrsimî Mella Îbrahîm helbestvan, mamoste, hozan û tembûrvanekî jîrek bû. Kalik û bavê Nûrî Dêrsimî ji Serokê Eşîra Şêx Hesenan û bavê Seyid Riza Seyid Îbrahîm re bi salan sekreterî û katibî kirine. Gellek şagirtên ku ji dibistana Mella Îbrahîm mezûn bûbûn li Stenbolê perwerde dîtibûn û bûbûn Kurdperwerên jîrek. Piraniya van Kurdperweran di serhildana 1938an de di ber welatê xwe de şehîd ketin.

Gava bavê Nûrî Dêrsimî katibiya Suleyman axayê eşîra Ferhadan dikir, Nûrî danîbû cem apê wî Mella Hesenê Colikoxlî û ji Mella Hesen perwerde girt. Jiber ku li gundê Sorpiyan îkamet dikir di sicîlê de bi navê Mihemed Îbrahîm Colikoxlî hat qeyd kirin. Di salên pêş de jibo berdewamiya xwendinê bavê wî, wî dişîne dibistana leşkerî ya Elezîzê. Li wir li cem apê xwe yê polîs Huseyîn efendî ma. Piştî wê bavê wî wî li dibistanekê din qeyd dike û mala xwe bardike Elezîzê da ku ji kurê xwe qut nebe.

Di salên xwendina xwe de Nûrî Dêrsimî dest bi xebatên siyasî dike û bi xwendevanên Kurd re Komela Xwendevanên Kurd dadimezrîne. Di sala 1911an de li Stenbolê dest bi xwendina textoriyê dike. Li vir jî helw dide ku xwendevanên Kurd bîne cem hev. Di 1912an de kalikê (bapîrê) Mella Xidir wî tê serdana wî û ew bi hevre Komela Dostên Kurdistanê dadimezrînin û Nûrî dibe sekreterê giştî. Piştî bi demekê Mella Xidir vedigere Dêrsimê û Komele jî tê girtin. Piştç girtina Komelê Nûrî Dêrsimî jî terka Stenbolê dike û berê xwe dide Dêrsimê jibo ku xelkê bi rêxistin bike. Dêrsimî piştre bi Selvî xanima ji gundê Çamsigi re dizewice û ew her berdewamiya belakirina bîreweriyên Kurdewariyê dike. Jiber van xebatên xwe ew di çavên dewletê de dibe kelem û wî nefî (sirgunî) Gîresûnê dikin. Lê piştî bi demekê jibo berdewamiya pîşeyê (meslek-senhet) xwe wî dişînin Stenbolê.

Li Stenbolê di nava Kurdistan Tealî Cemiyetî de xebatên xwe berdewam dike. Ji aliyê din Dêrsimî bi riya qaçax çekan (sîlehan) derbasî herêma Dêrsimê dike û tayîna xwe jî derdixe Sîwasê. Li wir bi hevalên xwe re nûneriya Kurdistan Tealî Cemîyetî saz dikin. Mustafa Kemal Ataturk bandora Nûrî Dêrsimî ya liser herêmê dibîne, jiber wê dixwaze wî bikşîne aliyê xwe û wî dawetî kongra Sîwasê ya 1919an dike.Lê jiber ku Dêrsimî vê dawetnameyê red dike wî bi riya Waliyê Sîwasê dide girtin. Dêrsimî bi helwest û kefteleftên mebûsê Dêrsimê Hasan Hayrî

tê berdan. Piştî ji hepsê tê berdan ew giraniya xwe zêdetir dide xebatê û Koçgirî-Dêrsim, Elezîz-Diyarbekir, Wan, Bedlîs û derdora wê ji xwe re dike armanca xebata bîreweriya Kurdayetiyê. Bi gellek serokeşîran re dikeve têkiliyêû bi rêberiya hozan û endamê Kurdistan Tealî Cemiyetî Elîşêr, dikeve nav xebata rêxistinî.

Nûrî Dêrsimî di bîranînên xwe de bernama xwe wilo diyar dike: Berê wê li Dêrsimê serxwebûna Kurdistanê lidarketa, li Hozatê wê ala Kurdistanê bihata daçikandin, wê hêzên netewiyên Kurd bi îstîqameta Ezercan, Elezîz û Meletê berê xwe bidana Sîwasê û wê ji hikûmeta Enqerê naskirina serxwebûna Kurdistanê bihata xwestin. Wê Tirkan ev daxwaza me qebûl bikirana, jiber ku wê daxwazên me bi riya hêza çek bihata piştraskirin. Piştî serketina gava pêşîn, şik tunebû ku wê tevayiya Kurdistanê alîkariya me bikira, jiber ku rizgariya millî û derketina ji bin nîrên biyaniyan daxwaz û erka her Kurdekî bi xîret bû. Tekoşîna ku ji sala 1919 an û hetanî 1922an li himber îdareya Kemalîst hat dan, jiber kêmalîkarî, kêmpiştgirî û netifaqiya di navbera Kurdan de têk çû. Dêrsimî kurê xwe Alî jî di vê serhildanê de wenda kir. Piştî têkçûna serhildanê Dêrsimî li cem Seyid Riza star dibe û li wir dibe sekreterê Seyid Riza. Li wir dikeve nav hewldana lihevanîna eşîrên Kurdan, demekê mamostetiyê dike û şagirtên xwe hînî Kurdiya bi tîpên latînî dike. Jiber zilma liser wî û malbata wî xanima wî Selvî nexwes dikeve û wê wenda dike.

Nûrî Dêrsimî yê ku di serhildana Dêrsimê de rolek çalak dilîze, jiber tade û zilma dewletê di Îlona 1937an de welêt terk dike. Bi zor û heft bela derbasî Sûriyê dibe û li wir jî dev ji xebata xwe bernade. Dêrsimî li Sûriyê cara duyemîn dizewice û heta dawiya jiyana xwe li wir dijî. Nûrî Dêrsimî yek ji wan qehremananên milletê Kurd e ku jiyana xwe gorî doza Kurd û Kurdistanê kiriye û ji nifşên nû re bûye sembola bîreweriya neteweperestiya Kurd. Nûrî Dêrsimî di 22ê Tebaxa 1972an de li bajarê Helebê çû ser dilovaniya xwe.

Beşek ji banga Nûrî Dêrsimî jibo xortên Kurd

Ey kurên milletê ku bi sedê salan dibin zilmê deye, guhdariya min bike!

Gava şeveqa dîroka mirovatiyê hildihat, tîrêjên ewil, ji derya Hindê heta bi Kafkasan, ji qûntarên rojhilata Asya biçûk heta bi çiyayên bilind ên Asya navîn û di zozanên rojîn de li aniya nîjadê ku te aniye dinyayê xistiye. Dîroka te dîroka serpêhatiyên qehremaniyê ye. Çunkî tu, zarokê milletiye ku bi sedêsalane jibo hebûnek bi namûs û azad şer dike û îro jî ji wî şerî newestiyaye.

Lêgerîn û dîtina sedem û bingeha felaket û êşên ku gelê Kurd kişandiye erk û deynê me hemiyane. Jibo paraztina hebûn û kesayetiya xwe tu milletî wek me bi dirêjî û berdewamî şer nekiriye. Di dirêjayiya dîroka me de tu hêzê serê me netewandiye. Aniya Kurd, wek zîrweyên welatê Kurdan, herdem bilind maye û liber tu fetihkarî xwar nebûye. Rasteqîniya jiyana Kurd, heqîqeta îro ye jî. Çunkî Kurd ji şerê man û nemanê bernedaye, binketin qebûlnekiriye, bi biryare ku ji nav refê milletên dinyayê wenda nebe, zane bijî û milletekî zane xwe jibo jiyanê bide kujtin.

Ey lawên Kurd, ey keçên Kurd, divê dinya ji vê biryara te agahdar be! Her hebûna ku bixwaze bijî divê şer bike! Milletê ku bixwaze liser dinyayê bibe xwediyê ciyekî divê şer bike! Qaîdeya xwezayiyê ev e. Zagona hebûna alema kîmyewî, nebatî û heywanî ev e; pevçûn, şerkirin!..Ev qaîde jibo cinsê însên dijwartir e. Însan cinawirê însan, nîjad cinawirê nîjad, millet cinawirê millet e. Medeniyeta însanetiyê hîna ev qaîde xiranekiriye, zagona şer xiranekiriye. Îro jî, jibo jiyanê pevçûn gereke, rev mirin e. Em, milletekî naxwazin bimrin, Kurdan, biryar daye ku bijî û wê bijî. Di dîroka me ya dirêj de gellek nîjadan, millet û dewletan xwestina Kurdan bikujin, xwestine wan ji mafên jiyanê bêpar bihêlin, lê biserneketine. Kurdan, li himber dîrokê bi serbilindî:"ez nemirime, ezê bijîm!" gotiye. Guh bide zarokekî Kurdê Dêrsimê, ku bi tîrojon roja serxwebûn û azadiyê di ruhê wî de şewq û şax û per berdaye, guh bide min! Ez jibo te, feryada bi hezaran keç û bûkên ku jibo paraztina namûsa xwe xwe ji çiya û zinaran werkirine, diqîrim..!Ez jibo te, feryada milletê Kurd ku hîna jî li ber deryê dijminê namerd û di bin esareta wî de dijîn digirîm...

Birayên te ji çiyayên Kurdistanê, ji zozanên rojîn nefî-sirgûnî-beriyên Anadoliyê bûne, ji birçîna dimrin, jiber Kurdbûna xwe bi singû û fîşekên dijminên bêbext tên kujtin, gava ew çavên xwe ji jiyanê digrin, tu ji hêviyên wan re wek rojê hilatî..

Jibo bêdengkirina kûçikên ku bi navê medeniyetê li me diewtin.

Her Kurdê bi namûs, her Kurdê ku di sînga wî de dilê Kurd lêdide, her xortê ku xwîna Kurd di reh û damarên wî de digere divê vê qewîtînameyê (wesîyetname) jibîr neke.

Heta ku em bigihên armancên xwe divê em ranezên, rehet nekin û bixebitin! Şopandina Kurdên ku dîroka doh bi xwîna xwe xêzkirine deynê me ye! Emê bi xwîna xwe bigihên asoyên serxwebûna Kurd. Emê bi volkanên ruhê xwe roja rizgariya Kurd biafirînin! Dîroka dinyayê li benda me ye. Çavên şehîdên me li benda me ne! Jibo xwe ji me gorekê dixwazin, abîdeyekê dixwazin!

Ev abîde Kurdistanek azad û serbixwe ye!

BEŞEK JI GAZINA DÊRSIMÎ JIBO XORTÊN KURDAN

Tolhildan!
Tolhildan!
Jibo paqijkirina namûsa Kurdan.
Tolhildan!
Jibo bersiva bi hezaran zarokên Kurdên ku singû bûne.
Tolhildan!
Jibo keç û bûkên ku hatine şewitandin, ji zinaran hatine werkirin, di girdabên avê de hatine xeniqandin.
Tolhildan!
Jibo pêkanîna armancên şehîd û qehremanên ku liber sêpiyê silav li mirinê dikirin û digotin, "biji Kurdistana azad û serbixwe!"
Tolhildan!
Jibo avakirina Kurdistana wêrankirî.!
Tolhildan! Tolhildan! Tolhildan!

www.kurdish.org

Sekreterî PDK-Î Koffî Annan re yew name şawit

PK - Sekreterî partiya demokrata kurdistana îran (PDK- Î) Mustafa Hîcrî, semedî vindarnayişî terorî dewleta îran sekreterî Yewbiyayê Miletan (YM) Koffi Annan, komîsyonî heqî merdiman ê YM û Yewbiyayê Ewropa (YE) re yew name şawit.

Mustafa Hicrî no namê xo de terorî dewleta îran bi mînokanî konkret anû ziwan û nê rexistinan re wazenô ke ê ziwar bidî dewleta îran ser ke no rejîm teror ra fek verado û heqanî kurdan bido ci.

KURD-KAV piyaameyişî Sevr minaqaşa kerd



Îstanbul - Weqfa kultur û cigerayişanî kurd (KURD-KAV) 13ê tebax de Istanbul de hewşe xo de bi namê "Piyaameyişî Sevr û kurdî" yew seminar viraşt.

Na seminar de cagirotê serekî HAK-PAR Bayram Bozyel, huquqnas Av. Ercan Kanar û cigerayox/nuştox İsmail Göldaş piyaameyişî Sevr ser agahdarî da mêmanan.

Riyareberdoxanî Kurd-Kav ra Ebukat Kamber Soypak na semînar îdare kerd. Semînar sehet 17:00 de bi qisêkerdişî ardimcî serekî Kurd-Kav Dr. Abdullah Kıran dest ci kerd. Dr. Kiran qisêkerdişî xo de armancê na semînar îna ard ziwan: "No demo peyin de herkes kurdan ser qisêkeno, la kurd îta de teref niyî. Ma wazenî bi nê panelan tarixî kurdan biyar çiman ver"

Cuwa pey Bayram Bozyel qisêkerd. Bayram Bozyel rewşa siyasî ê o wext ser vindert. Bozyel a pey Ebukat Ercan Kanar qal girot. Kanar zi o wext ra heta ewro ca ardişî "heqî tayin kerdişî qederî xo" û rolî rexistinanî sey YM û YE ser vindert. Îsmaîl Goldaş zi qisêkerdişî xo de cemaatî kurdistan de cagirotişî vîrî tarîxî ser vindert.

Komelê Heqî merdiman (IHD) çalakiyê PKK şarmizar kerd

Xarpêt - Serekî komelê heqî merdiman ê bajarî Xarpêt Nafiz Koç, eriş kerdişî walî Xarpêt (Elazig) Kadir Koçdemir şarmizer kerd.

Nafiz Koç bi namê komela yew beyanat da. Koç no beyanato nuşteyî de vînayê IHD-Xarpêt îna ard ziwan: „ Heyatî însan firaz o, her kerdine ke heyatî însanan xo re keno hedef, verba însanetê yew suc o. No rid ra ma eriş kerdişî walî Koçdemir şarmizar kenî"

Nafiz Koç semedî aştiya û tirkiye de penî ameyişî kiştişî însanana herkes ra ardim waşt.

Eerebê walî Xarpêt Kadir Koçdemir 14î tebax de nêzdî navçê xarpêt Qerebegan de ginay yew mayin re. Mayin teqay camî erebê şikiyay, la kes darbice nêbi.

Kurdan Düsseldor de rejimî Îran protesto kerd



Düsseldorf - Bi gazî kerdişî partî û rexistinanî kurdistanî ser 13ê tebax de kurdanî bajarî almanya Düsseldorf de rejimî îran protesto kerd.

Se ke yeno zûnayiş nê rojanî peyinan de rejîmî îslamî ê iraq zext û zulmî xo şarî kurdistan ser zêdna, zafî bajarî kurdistan de pasdaran gulê kerdî kurdan ser ra û zaf kurdî kişiyay, bi seyan kurd bî darbice û bi seyan kurd zi tepişiyay.

Semedî protesto kerdişî no terorî dewleta îran kurdistana başûr de û her perî ewropa de kurd rejimî îslamî protesto kenî. Bi gazî kerdişî DPK-Î, PSK, KOMALA, HEVKARÎ û komelanî demokratîk sey KOMAL e.V, KOMKAR, MAL,Navenda kurd- Köln û komelê paştgirotişî HAK-PAR ser, 13î tebax sehet 14:00 de kurd verî parlemtoyî NRW de amê piyeser û heta Burgplatz yew şiyayiş viraşt. Xonîşandayoxan pankartî sey „Eskerî îran kurdistan ra defbi", „Qetilkar Ahmedinejat", „ Terorîst dewleta îran" kerdibî berz. Myanî bajar Burgplatz de bi namê partiyanî kurdan qisêkerdoxî halî kurdistana rojhelat ser vindertî û terorî dewleta îran ser agahdarî da xonîşandayoxan. Temsîlkaranî partiyanî kurdan waştê kurdan zi ardî ziwan û dewleta almanya re waşt ke yew heyet bişawo îran û ziwar rejimî îslamî serno ke heqî netewî û demokratîkî kurdan nasbikero.

Îta de bi namê partiya WASG - NRW xanim Edith Bartelmus Scholich qisêkerd. Xanim Scholich qisêkerdişî xo terorî rejîmî îslamî protestô kerd û semedî serewedartişî şarî kurdistana paştgirotişî partiye xo ard ziwan. Vervekê polîtîkayê tebêr ê SPD Uta Zapf zi bi yew mesaja no xonîşandayiş destek kerd.

Hereketa referandûmî kurdistan seraserî kuridstan de xonîşandayiş organize kerdî



Kurdistan - 14î tebax de hereketa referandûmî kurdistan bajaranî kurdistan; Hewlêr, Kerkûk, Silêmanî, Duhok, Şeqlawa û Akre de xonîşandayişî organize kerdî.

Heme bajaran de bi hezaran şarî kurdistan nê xonîşandayişan de ca girot. Nê xonîşandayişan de drûşmayî sey „Bê sînoranî kurdistan ma re destûrê şima lazim niya" amê vatiş. Xonîşandayoxan waşt ke haqî tayin kerdişî qederî şarî Kurdistan destûrê iraq de ca bigero, sinorî Kurdistan gorî belgeyanî tarixî û cografî biyerî nîşankerdiş.

Hanc hereketî refarndûmî Kurdistan 27î Hezîran de yew waştişname dabi Parlamentoyî Kurdistan. Înan waşt ke qanûnî bingehîn ê Kurdistan û iraq de yew madde de biyero nuştiş ke kurd wext ke biwazî gereka bieşkî bi yew refrandûmo fermî dewletê xo sazbikerî û iraq ra abiriyî.

Nê xonîşandayişan balî serekanî siyasî ê Kurdistan û iraq ûnt waşteyanî şarî Kurdistan. Hanc nê çalakiyan nîşan da ke wext ke waştê kurdan qanûnî bingehîn ê iraq de ca nêgirî, o wext şarî kurdistan na destûr qebûl nêkiro û doze serxobiyayiş biko.



Selim Çürükkaya

Vawo ma estî

Recep Tayip Diyarbekir de qisêkerd.

Şima zûnî çi semed?

Ê xeber ke ey vatî, ma hend pê biy şa, ma nêzûnî ma nika sebikeri?

Ey di serî cuwa ver hûnc ma kerdî şa, va ke xo re ziwanî xo bimûsiyen.

Ma kursî ziwanî akerdî, ma malim peyda kerdî; la wendoxî çiniyêb.

Ma hêna nê kursî qefilney.

Nika Recep vûno ke kird estî.

Ma sinî estî?

Ma çi wext ra estî?

Ma ça ra ûmê îtiya?

Şima kam ca ra ûmê îtiya?

Heta nika çiney ra ma çiniyêb?

Nika çiney ra to va ke ma estî?

Îna mekir Recep, yarî mekir. Raşta ti vûnî ma estî?

Ti zûnî ke ti hê zur nêkenî?

Eger ma estî, erdî ma zi est, ziwanî ma zi est, tarîx ma zi est.

Eger ma estî lawikî ma, hekayetî ma, fistonekî, folklorî ma, kulturî ma zi est.

Ti înan zi zûnî Recep?

Eger ti nêzûnî, şue xo re bimus. Şue Heredot ra pers biker.

Şue Kesenofen ra bimus, şue wextî Hz. Ömerî biwin.

Şue Yawiz Selim ra pers, bimus, bişarm.

Nika re pey mevac:

Hûmay ma yew o, erd ma yew o, ziwanî ma yew o.

Ti hama nêzûnî çiney çinawo.

Roj veciyawo, şu kueri, nika şew a.

Muhtaranî Kaniya Reş xo Anqara de da erd re

Anqara - Muhtarî dewanî Kaniya Reş semedî bênate ra wedartişî neheqê tespît kerdişî hesarî banlêrz şî Anqara. Muhtaran wezîrtiyê awankerdiş de gerrê xo kerd û ê vanî ke heta ma heqî xo nêgirî, ma Anqara ra anêgerenî.

Se ke yeno zûnayiş 12-14 hezîran de Kaniya Reş de banlêrz bibi. Banlêrza pey hesari banan amê tespît kerdiş. Yew qisim muhtar îddîa kenî ke no tespîtkerdiş de neheqî dewijan biya. Nê muhtarî semedî orte ra wedartişî na neheqî şî Anqara.

Verî ke ê şuerî Anqara înan rojnameyî Bingol re persî xo îna ardî ziwan: „Kaniya Reş de her roj banlerz beno. 5 aw cuwa ver humarî bananî bi hesar 2600 bi. Nê 5 aşmanî peyinan de humarî bananî bi hesar hêna bi zaf, la memûranî hukmat nê hûmarî kerdî kêm. Heta nika çend ray tespîtî hesaran viraziya. Her ekîp yewna qede rapor keno hedre. Ma zi waw bî mendî, ma nêzanî raporî kam ekîp raşto. Bê şiyayişî Anqara yewna çare nêmend. Ma heta heqî xo nêgiri, ma Anqara ra nênî"

www.arsiv.org

Hikûmeta heremî kurdistan semedî Kerkûk a 13 milyon Dolar abirna

Silemaniye - Hikumetî heremî kurdistan ke cuwa ver semedî awankerdişî Kerkûk a 5 milyon Dolar xerckerdib; 13 milyonî bîn zi no semed abirna. Serekî hikumat Omer Fettah vano ke ma dest ci kerd nê 13 milyon Dolar semedî awankerdişî Kerkûk axerc bikeri.

Yew mude cuwa ver yew zaningehî Kerkûk ra yew heyetî silemaniye ziyaret kerd. Bin serektiye Omer Fetteh de wezîranî hikumetî kurdistan û no heyet amê piyehet. Heyetî zaningehî Kerkûk hikumatî Kurdistan re spas kerd ke heta nika zaf qîmet dawo zaningehî kerkûk.

Serekî Hikûmatî heremî Kurdistan Omer Fettah îta de qisêkerd û va: " Heta ma dest ra biyero ma semedî Kerkûk û zaningehî Kerkûk a hizmet bikeri. Kerkûk yew bajarî Kurdistan o, l no nîno a mehna ke ma biyayişî ê netewanî bînan nêgiri çiman ver"

Kîtabxanê Sileymaniya qismî latînî kerd a



Sileymaniye- Kîtabxaneyî Sileymaniye qismî kitabanî latinî kerd a.

Kîtabxaneyî Sileymaniye 1944 de bibo a û 2002 de bi qerarî wezirî karanî roşnvîriye Feteh Zaxoyî amêwo modern kerdiş.

Banî nê kîtabxanî hend rind viraziyawo ke ti ra „Koşka Sipî" yeno vatiş. Her roj bi seyan roşnvîr, cigêrayox, wendox û qicî îta ziyaret kenî, kîtaban winenî, kuwenî înternet û computer ser kar kenî..

No kîtabxane de nê qisim estî :

Qismî Kurdî : Qismî kîtaban, qismî kovar û rojnameyan

Qismî Qican: Qismî kîtaban, qismî kovar û rojnameyan, qismî resiman, qismî yarî û fîlman

Qismî Amerîka, Qismî Erebkî, Qismî Fariskî, Qismî Tirkî, Qismî Înternet, Qismî Computer

No kîtabxane de 60 000 kitab estî, 286 memûr te de xebitiyenî, her ser çend ray weşanxenyî zerrî û tebêr îta de pêşengeh(sergî) virazenî.

12 qolî ey estî: Helebçe, Raoiye, Qeladizê, Binar, Dokan, Hacîawa, Pîremgron, Çarta, Mawit, Pinciwîn, Seyd Sadiq, Qeredax.

Di aşmo ke kîtabxaneyî Sileymaniye de qismî kurdî latînî amewo akerdiş. Wezirî karanî roşnvîriye qerar girot ke teber re kîtabanî Kurdî-Latînî biêrnî û îta de bidi hizmetî wendoxan.

Nuştoxî ke wazenî kîtabî înan no kîtabxane de biyerî wendiş. Eşkenî kîtabanî xo bişawî na adres:

Silêmanî Kitêbxana gistî beşê Latînî .Mihemed Hemo

Mobail : 00964/7701527779

Emaila : HYPERLINK „mailto:bircabelek@yahoo.com" bircabelek@yahoo.com

Qetilkerdiş Hîkmet Fîdan Sero

Müdür Genç

Hîkmet Fîdan 6 aşmê temmuz de, şaristan Amed taxê Baxler de bi destê yew-çend kesanî nênas ame kiştiş. Ez qetilkerdişî sîyasetmedarê kurd, embazo erjiyaye, mamoste Hîkmet şarmizar kene û hêvî kene yew demo kilm de qetilkar biyerî tepîştiş û mesela zelal bibo. Qetilkar kamî benî wa bibî, sebeb çi beno wa bibo, heyat merdim hêcawo, gereka no qas erjan nêbo.

Hîkmet eslê xo şaristanî Mêrdîn qezay mazidaxî ra bi. O des serr meselay kurdistan ser o zîndanî Dîyarbekîr de mend, têkoşîna Kurdistan de zaf kewsê(emek) destanî ey esta, ey nêzdî hîris serr xebatkerd.

Serra 95 de Partîya HADEP bî a, Hîkmet Fîdan mîyan xebatê Partî de ca girewt û bi serekî şaristanî stenbol. Mi Hîkmet xoca o wext şinasna ez o wext yew qeza de idarekerdoxê partî biya. Cuwa pey o bi ardimcî serekî pêroyina HADEP, azaye Meclis ê Partîya HADEP. Yew mude ma piya xebitiyey, cuwa pey ez tepîşiyawa û kewta hepisxane, verdiyawa ra û vejiyawa tever, têkilîya ma yewbînan biriyê. Bi rastî Hikmet mêrdim o heyfbi û şarî kurd ra zaf lazimib, cesur û fedekarib, çi gune o bêmrad kerd.

Qetilkerdişî Hîkmet têna dewleta tirk ra feyda ano. Şarî kurd yew lacî xo wo erjiyaye vînkerd. Kiştişî Hîkmet ser o zaf çi ame vatiş, ayhawa asen ke hema zaf çî yeno vatiş û nuştiş. Rojnamê tirkan yew demo derg na mesela sero vindert ,cuwa pey tikê partî û organîzasyon, tikê merdim ke xo ra vanî ma roşnvîrî, ê ke heta nika estiş Hîkmet Fîdan ra bêxeberib, welakîn ewro pêro wazenî Hikmet sero rant o polîtîk peyda bikerî. Her kes hetê ra yewbînan kenî sucdar. Cinî û qicî Hîkmet gereka îtade zaf hîşar vinderî.

1980 ra nata tirkîya û kurdîstan de 16 hezar kesî bi destî faîlanî nenas (mechul) hamê kiştiş. Înan mîyan di mebusî, îdarekerdoxî partiyan, doktor, abukat, nuştox, rojnamevan û gelêk welatperwer bî. Welakîn heta nika kes înan ra behs nêkerd. Ne dewleta tirk ne zî roşnvîr û nuştoxanî tirkîya nê însanan sero qe yew rêza nuşte nênuşt, înan sero yew meqale nêhame nuştiş. Sey kowê sabun amê şî na dinya ra. Seke na dinya de qe nêciwiyayî. Tikê roşnvîrî tirkan ewro wazenî dinya xirabe bikerî, eger raşta zerre înan kirdan vêşena, wazenî qetilkaranî Hîkmet Fîdan vecî orte, wa hêverî qatîlkaranî Musa Anter, Wedat Aydin, Mehmet Sincar û ê bînan sero zi yew xebat virazî ke ma înan ra bawer bikerî. Welakîn derdê înan şarî kird xo bi xo tîvêro bikerî û durî vinder. Şarî kird gereka hîşaribo.

Dewleta tirk, tikê roşnvîr û nuştoxî tirkan, tikê roşnvîr û nuştoxî kurdan, hususî zi cinî û qicî Hîkmet semedî qetilkerdişî Hîkmetî PKK mesul vînên. Kam kişt se embaz û dostî ê xemgîn-qehr kerd, welakîn zerrê dewleta tirk rehet kerd. Ez hêvî kena ke qetilkerdişî Hikmet hetê kam ra bîyo se yew demo kilmde vecîyo orte, bibo eşkera. Eger no çete partî û organîzasyonî kurdan miyan ra vejîyawo? Şarî kurd gereka no çetî veco orte ke wa yewna rey „birakuji" nêbo.

Partî û rêxistinî şarî kurd, taybet roşnvîr û sîyasetmedarî şarî kurd gereka yew ehleq, ûslib, şîret û edebo newe xo de qebul bikerî. Ca ca ma vînen tikê însan kirîtîk û sucdarî têmîyan fînawa, tikê sîteyan înternet ra behca (tiksinti) însana şina. Gereka her kes rind fehm bikero ke mûxalefet pê kiştiş nêqedîyen, şarî kird pê kîn û nefret yew ca nêresen. Her kes gereka pê fikir xo ya biyero qebulkerdiş. Eger kes vaco "kam fikir mi ra nîyo se xayin o û heqê ê kiştiş o." Lazimo ke însan yewbînan qirbikero. Heqî çew çinîyo yewbînan pê xayintiye îtham bikero.

Cenazay Hîkmet ra wayir nêvecîyayiş yew kemasîya pîla. Belediya Dîyarbekir nêşkena yew mazereta tek ramucnî, esla mazeret înan qebulniyo. Serekî beledîyê Dîyarbekîr yew merdimî huquq o, partîya ê zî vana ziwan, dîn, reng, kok, fikîr û cinsîyet înan çina beno wa bibo pêro însan seyyewbînanê. Ferq înan çinîyo. Welakîn Beledîya Dîyarbekîr ferq fîna ortê însana, wexta esker ko ya kişîyen pêro ambulans seferber benî. Ma rind zanî ke mebusî DEP şinî keyê nê eskerande tazîya kenî. Welakîn yew kird ke sey înan mijol nêbi tazîyay ê nêşinî. Partîya DEHAP zî o eleqa ke nawit yew qicî 12 serrî, eger yew merdim seba şarê kird hîris serr têkoşîn ramit û des serr hepisxane de kewt ra, gereka o qas yew eleqa ê zi binawiten.

Homa rehmê xo bikero ci û Homa keyê, dost û eqrabay ê re sabir-deyax bider.

Dewî Çewlîgî / Bingöl Merkez Köyleri

Ehmedê Dirihî

Ağaçyolu	İskenderan	Dallıtepe	Talbasmurik	Ormanardı	Dodan
Akdurmuş	Guldar	Ekinyolu	Sîmsor	Ortaköy	Dewa Mîyanîn
Alıtaş	Elbêr	Ereğtepe	Sînek	Ortaçanak	Axpig / Xidan
Alıncık	Dugernan	Elmalı	Armelan	Oğuldere	Buban
Altınşık	Binê Ziyarî	Garip	Xerîb	Oluköprü	Çolek
Aşağı Akpınar	Wisifan	Gökçekanat	Qerwelanê Cêrîn	Sancak	Xoşkar
Ardıçtepe	Kemalan	Gökçeli	Tahçûr	Sancaklı	Geylan Xelîl / Sencaqî
Aşağıköy	Dewa Cêrîn	Gökdere	Mîyalan	Sarıçiçek	Tarbasan
Ağaçeli	Perungukê Cêrîn	Göltepesi	Çan	Sarıgümüş	Simsorê Sencaqî
Arıcılar	Şox	Gözeler	Xiraba	Sütgölü	Zax
Alatepe	Arçûg	Güzer	Şênik	Suvaran	Suwaran
Balpınar	Metan	Gümüşlü	Têyrek	Sudüğünü	Şirnun / Gêylanê Ebbasî
Bilaloğlu	Mendo	Güngören	Mezraçux	Şaban	Şaharî
Balıklıçay	Masalla	Gürpınar	Lotan	Topalan	Topalan
Büyük Tekören	Takoranê Cêrîn	Güveçli	Sînê Welan	Tepebaşı	Çewlîg
Bahçeli	Mirrî	Haziran	Hezêran	Uğurova	Hişkdar/Wişkdar
Çayağzı	Tekçûnî	Işıklar	Peyran	Uzundere	Belluzer
Çayboyu	Xeyd	İncesu	Derê Nazîkî	Uzunsavat	Uzunsavat
Çelikkuyu	Madrag	Kardeşler	Şemrê Qoçan / Nebiyan	Üçyaka	Az
Çevrimpınar	Goriz	Kartal	Sîrîn	Yamaç	Musîyan
Çiçekdere	Gilhê	Kavaçûl	Brotax	Yeleşen	Korman
Çiçekyayla	Vilware	Kumgeçit	Kurik	Yeniköy	Çilkanî
Çimenli	Lek	Kurbca	Xezik	Yeşilköy	Alzan
Çiriş	Çirîs	Kurudere	Derozuwa	Yeşilova	Xilbizan
Çukurca	Kordewî	Küçük Tekören	Takoranê Nezerîn	Yolçatı	Şerge
Çavuşlar	Perungukê Corîn	Köklü	Tuyêrek	Yukarı Akpınar	Sipênî
Çobantaşı	Sûrî	Kurtuluş	Derê Sûrî	Yazgüçayır	Kanek
Dikköyü	Dik	Kuşkondu	Gêylanê Sencaqî	Yazgülü	Qerwelanê Corî
Dikme	Kor	Kuşadır	Madragê Lotan	Yıldızlı	Pakan
Düzyayla	Gewran	Kıltepe	Gozêrek	Yenibaşlar	Elekrag
Dereli	Çekan	Kiğeli	Kurut		
Dişbudak	Vindêrin	Kuşburnu	Kalan		

www.kirdki.org

د. تاهیر حیکمەت یەکێک لە چالاکانی "هاودەنگ":

دردۆنگی و بێ باوەڕی بەیەکتر پێش بە پێکهاتنی بەرەیەک لە هێزە سیاسییەکان دەگرێت

پاش چەند کۆبوونەوەیەک بە ئامانجی پێکهێنانی کومیتەیەکی هاوبەش لە ڕێکخراو و کەسایەتییە سیاسییەکانی ڕۆژهەڵاتی کوردستان لە ئاڵمانیا، سەرەنجام پرۆگرامێکی هاوبەش پەسەند کرا و کومیتەیەکی کار (هاودەنگ) هەڵبژێردرا. لەم چوارچێوەدا وتوێژێکمان لەگەڵ بەڕێز دوکتور تاهیر حیکمەت یەکێک لە چالاکانی ئەو پرۆژەیە بەڕێوە برد تا باشتر لە ناوەڕۆک و ئامانجەکانی "هاودەنگ" بگەین.



پ: کۆبوونەوەی ڕێکخراو و کەسایەتییە سیاسییەکانی ڕۆژهەڵاتی کوردستان لە ئاڵمانیا سەرکەوتووانە پرۆگرامێکی کاری هاوبەشی پەسەند کرد، پاش پیرۆزبایی لەو سەرکەوتنە، دەتوانن بڵێن بیری پرۆژەیەکی ئەوتۆ چۆن هاتە ئاراوە؟

و: بیری یەککرتوویی نەتەوەیی، بیرێکی نوێ نییە، ئەوە گرفتی دەیان و سەدان ساڵەی نەتەوەکەمانە کە بەداخەوە تا ئێستاش بەتەواوی نەهاتۆتە دی. باری ژیانی سیاسی- ئابووری و کۆمەڵایەتی کورد، ئەمڕۆ لە قۆناغێکدایە کە وەدیهاتنی ئەو ئامانجە گونجاو دەکات. ئێمەی کورد لە قۆناغی "من"ەوە وردە وردە بەرەو قۆناغی "ئێمە" دەڕوێن. ئەزموونی ئەم کارەی ئێمەش کە لە هەموو لایەکەوە بەو پەڕی لێبڕسراوی و لە کەش و هەوایەکی دوستانەدا هاتە دی وێنەیەکی زیندووە.

پ: دەکرێ بەکورتی باسی ئەو ئەزموونە بکەن؟

و: ئێمە کە زۆر لە میژە گۆڤاری "هاوار" دەدەینە دەرەوە، هەر لە سەرەتاوە بیرێکی ئەوتۆمان بوو کە گۆڤارەکەمان ببێتە تریبونێک بۆ دیالۆگ و لێک نزیککردنەوەی بیر و بۆچوونە جیاوازەکان. دیارە زۆرکەس و لایەنی‌تریش ئەو هەوڵەیان دەدا. سەرجەمی ئەو هەوڵانە و لەبارتر بوونی بارودۆخی کێشەی نەتەوایەتی کورد، هەڵێکیان پێکهێنا کە بکرێ بە کردەوەش هەوڵی بۆ بدەین.

ڕۆژێک لە سەر داوەتی بەرپرسانی "ناوەندی لێکۆڵینەوەی کوردی" لە بۆن، چەند کەس لە لێپرسراوانی "حیزبی دیموکراتی کوردستانی ئێران- کومیتەی ئاڵمانیا" و چەند کەس لە بەڕێوەبەرانی گۆڤاری " هاوار" بۆ باس و بیرگۆڕینەوە لە نووسینگەی "ناوەند" کۆبوونەوە و بەو ئاکامە گەیشتین کە بۆ ئەو مەبەستە لەگەڵ ڕێکخراوە و کەسایەتییەکانی دەور و بەرمان پێوەندی بگرین. پاش وتووێژ لەگەڵ نوێنەرانی کۆمەڵەی زەحمەتکێشانی کوردستانی ئێران و یەکێتی شۆڕشگێڕانی کوردستان و چەند کەسایەتی‌تر، زنجیرە کۆبوونەوەیەکمان پێکهێنا و سەرەنجام لە سەر ئەو خاڵانەی کە لە یەکەم بەیاننامەی "هاودەنگ"دا هاتووە، ساخ بوونەوە.

پ: ئایا ئەو چەشنە هاوکارییە شێوەیەکی وەکوو "بەرە" یە؟

و: لەڕاستیدا پێکهاتن لەسەر خاڵی هاوبەش لە ناو بیر و بۆچوونە جیاوازەکاندا دەکرێ ناوی بەرەی لێ بندرێ، بەڵام لە ئەدەبیاتی سیاسی ڕۆژهەڵاتی کوردستاندا کە باسی "بەرە" دەکرێ، مەبەست پێکهاتن و ڕێککەوتن لە نێوان هێز و حیزبە سیاسییەکانە. بەو مانایە "هاودەنگ" ناتوانێ "بەرە" بێت. من پێم وایە ئەو چەشنە هاوکاریانە ئەگەر لە "بەرە" گرنگتر نەبێت، کەمتریش نییە. ئەگەر بەشێک لە خەبات و چالاکییەکانی چارەی کێشەی نەتەوایەتی ڕۆژهەڵاتی کوردستان لە لایەن حیزبکانەوە بەڕێوە دەچێ، بەشێکیشی لە لایەن کۆڕ و کۆمەڵ و کەسایەتییە غەیرە حیزبییەکان چ لە ناوەوە و چ لە دەرەوەی وڵات دەچێتە پێش. لێکنزیک کردنەوە و لێک گرێدانەوەی ئەو دوو چەشنە چالاکییە دەتوانێ خزمەتێکی گەورە بە کێشەکەمان بکات. ئەگەرچی پێکهاتنی بەرەیەک لە هێزەسیاسییەکان، گرنگی تایبەتی خۆی هەیە.

پ: پێتان وایە چ گیروگرفتێک لەسەر پێکهاتنی بەرەیەکی بەرفراوان لە نێوان هێزە سیاسییەکانی ڕۆژهەڵاتی کوردستان هەیە؟

و: بزاڤی ڕزگاریخوازانەی کورد لە چەند سەدەی ڕابردوودا زیاتر لەوەی خەریکی خەبات لەگەڵ دوژمنانی نەتەوەکەیدا بووبێ، خەریکی شەڕی ناوخۆیی بووە. بەداخەوە ئەوە بووەتە بەشێک لە فەرهەنگی خەبات! ئەگەر ئێستاش شەڕی ناوخۆیی لەئارادا نەبێ، دردۆنگی و بێ باوەڕی بەیەکتر هەرماوە و دیارە پێش بە پێکهاتنی بەرەیەک لە هێزە سیاسییەکان دەگرێت.

بەڵام گرنگتر ئەوەیە کە زیاتر لە ٢٥ ساڵە لە ڕۆژهەڵاتی کوردستان هیچ هەڵبژاردنێکی ئازاد نەکراوە کە هێزە سیاسییەکان بەشداری بووبن تا ڕادەی لایەنگرانیان لە کۆمەڵدا دیار بێت. گرفتی سەرەکی هێزەسیاسییەکان لەسەر داببەشکردنی خەڵک لەنێوان خزایاندایە کە لە ڕاستیدا لەگەڵ ڕاستەقینەی ئەمڕۆی کۆمەڵگای ڕۆژهەڵاتی کوردستان یەک ناگرێتەوە. هیوادارم ئەزموونی باشووری کوردستان لە چەند ساڵی ڕابردوودا، ڕێکخراوەکانی کورد ڕاچڵەکێنێ تا بە واقیع بینی پتر‌ەوە لە بەرژەوەندی گشتی نەتەوەکەمان بڕوانن.

پ: کام هەل و مەرج لە ناوەوەی وڵاتدا پێکهاتووە کە پێتان وایە بارۆدۆخەکەی گۆڕیوە؟

و: پاش ئەوەی شەڕی چەکدارانە ڕاگیرا و سەردەمی بێدەنگی لەناو هێزە سیاسییەکاندا سەری هەڵدا، لە ناوەوەی وڵات دەیان دەستە و گرووپ و ڕۆژنامە سەریان هەڵدا، لەو درزەی کە لە دەسەڵاتدارێدا پێکهاتبوو کەڵکی پێویستیان وەرگرت. ئەوان ڕێگای تایبەتی خۆیان دۆزیەوە و تا ئێستاش دریژەیان پێ داوە، ئەگەرچی پەرش و بڵاوون بەڵام ئاگان و بە ناوەڕۆک و خاوەنی ئەزموونی تایبەتن.

خەڵکی ڕۆژ لەگەڵ ڕۆژ پتر لەو ڕاستییە دەگەن کە لە شەڕی نێوان دوو باڵی حکومەتدا چی وایان وەگیر ناکەوێ، پێویستە بۆ خۆیان ڕێکخراو و بەرنامەی تایبەتی بە ناسنامەی نەتەوەییان هەبێ، حیزبەکانیش درەنگ یا زوو دەبێ لەو ڕاستییە تێبگەن کە بەبێ بەرەیەکی نەتەوەیی و پرۆگرامێکی هاوبەش ناتوانن لە سەرجەمی خەباتی ڕزگاریخوازی ڕۆژهەڵاتی کوردستاندا نەخشی بەرچاویان هەبێ، بە تایبەت کە گۆڕانکاریی لە هاوسەنگی ناوچەدا و پەرەسەندنی مەسەلەی باشووری کوردستان، توانا و تینی نوێیان داوەتە کێشەی کورد لە هەموو پارچەکان و چالاکتربوونی هێزە سیاسییەکانی.

ئێستا لە ڕادەی جیهانیدا، هەوڵ دەدرێ کە عێراق و بە تایبەت کوردستان بکرێتە نموونەی دیموکراتی لە ناوچەکەدا.

پ: ئایا بە ڕاستی عێراق دەتوانێ بێتە نموونەی دیموکراسی لە ناوچەدا؟

و: هەڵبژاردنەکانی عێراق، وێنەیەکی نوێ بوون لە ناوچەدا بەڵام ئەوەی کە هەر ئەوە بۆ نموونە بوون بەسە، ئایا سەرجەمی عێراق بواری زیاتری بۆ پەرەسەندنی دیموکراسی تێدا ڕەخساوە، پرسیاری بەجێن. ڕووداو و هەڵوێستەکان تا ئێستا بە ڕوونی پیشانیان داوە کە ئاستی دیموکراسی و جەوهەری دیموکراتییەت لە باکوور و ناوەند و باشووری عێراقدا وەک یەک نییە. پەسندکردنی یاسای دەستووری عێراقیش پیشانی دەدا کە کام هێز زۆرتر پابەندی دیموکراسییە یا دەتوانێ دیموکرات بێ، من پێم وایە کە داهاتوو دەری دەخات، وڵاتانی ڕۆژئاوایی و ئەمریکاش لەو ڕاستییە تێدەگەن کە ئەگەر بڕیاربێت نموونەیەک لە ناوچەدا بۆ کارتێکەری لە سەر وڵاتانی دراوسێ پێکبێ، ئەوە تەنیا باکووری عێراق واتە کوردستانە، تەنیا بە دامەزراندنی دەوڵەتێکی سەربەخۆی کورد دەکرێ نموونەیەکی ڕاستەقینە لە دیموکراسی بێتە دی و ستراتیژی هاوپەیمانەکان بگاتە ئەنجام. دووپاتی دەکەمەوە چ ئەوەی سەرکردایەتی کورد یا هاوپەیمانەکان پرۆگرامێکی ئەوتۆیان ئامادە کردبێ یان نەیانەوێ جارێ بیدرکێنن، فاکتۆری شێلگیری دیموکراسی لە عێراقدا تەنیا کوردە و بەس.

پ: لە هەلومەرجی ئێستادا کە ڕۆژهەڵات سەرجەم ڕاپەڕیوە، چ بژوونێکتان لەسەر ڕەوتی داهاتوو هەیە؟

و: ئێمە سەری تەعزیم بۆ هەموو تێکۆشەرانی ناوەوەی وڵات دادەنەوێنین، سەرخۆشی لە بنەماڵەی شەهیدان دەکەین و هیوادارین کە هێزە سیاسییەکان ژیرانەتر لە پێشوو بجوڵێنەوە و بە هاوکاری یەکتر نەخشی زیاتر لە سەر جوڵانەوەی ناوەوەی وڵات دابنێن، ئێمەش بتوانین ببین بە پردێک لە نێوان ناوەوە و دەرەوە و هێزە سیاسییەکان بۆ بەرەوپێشبردنی ئەرکی پێویست و سەرەکی ئەمڕۆی خەباتی نەتەوایەتیمان. ■■■

فەریقە کوێر!

ئەردەڵان جەمال

فەریقە کوێر"یادی بەخێر بێت". یەکێک بوو لە ڕووخسارە دیارەکانی شاری سلێمانی. ئەم کەسایەتییە، بە هۆی کۆمەڵێک تایبەتمەندییەوە کە لە قسە و هەڵسوکەوتیدا کۆیکردبووەوە، توانی خۆی وەک ڕووخسارێکی ناسراوی شاری سلێمانی" بسەپێنێت. هەڵبەتە نازناوی"کوێر" بە هۆی کزبوونی توانای تەماشاکردنی چاوی کاکە فەریقەوە بووە یەک ئەوەی کە بە ڕاستی کوێربوو.بەڵام خەڵکی سلێمانی کە ناسراون بە ناوڵێنان ئەم ناوەیان خستە پاڵی. کاک فەریق، هەمیشە جۆرەی قاوە و چەند فنجانێک پێ بوو ی، لە بازاڕ و شوێنە گشتییەکانی سلێمانیدا دەسوڕایەوە و، قاوەی دەفرۆشت. ئەوەی کە جێگەی تێزمانە، ئەم پیاوە کاتێک کە فنجانێک قاوەی بۆ هیچ کەسێک تێنەکردایە، ئەوا ئەو کەسە چەندی بدایە بۆ خۆی گلی نەدایەوە و، هەرگیز باقی پارەی نەدەدایەوە. بێگومان کاک فەریق لە شەستەکان و حەفتاکانی سەدەی ڕابردوودا ڕۆڵی هەبوو، ئەو کاتەش پێنج دینار یان دە دینار کارێگەری خۆی هەبوو. بەڵام کەسێک کە فنجانێک قاوەی کاک فەریقی بخواردایەوە و، پێنج یان دە دیناری بدایە بێی ئەوا چاوی بە باقییەکەی نەدەکەوت. هەڵبەتە کاکە فەریق بە هۆی ئەم خووە سەیرەوەی تووشی چەندین گیروگرفت بوو کەچی هەر وازی نەهێنا و هەر سووربوو لەسەر ئەو خووەی. سەرباری ئەمەش، کاکە فەریق ناسراوبوو بە قسەی نەستەق و خۆش و، تەنانەت ئەو قسانەی لەسەر شریتی"بکرە"ئۆمار دەکران و، خەڵکانێکی زۆر عەوداڵی بوون و، شەوانە لە گوێ ئاگردان پەیدەم خواردنی چا و گۆڵەبەرۆژە و جەرەزاتی دیکەوە، گوێبیستی دەبوون بە دەم قسەکانییەوە پر بە دڵیان پێدەکەنین. لە ڕاستیشدا، ئەم کابرایە، وەک لەو قسانەیدا دەردەکەوت، توانای هەڵبەستنی چیرۆکی جۆراوجۆری هەبووە کە ئەمەش لە خۆیدا ئەوە ڕوونەکاتەوە کە کاک فەریق ئەگەر بهاتایە و، هەل و مەرجی گونجاوی بۆ بڕەخسایە، ئەوا لەوانەیە وەک چیرۆکنووسێکی کوردی بەناوبانگ ناوی دەرکردایە. هەرچەندە دەشێت ئامۆژەش بەوە بدەین کە کاک فەریق زۆر جار ئیواران مەیی دەخواردەوە و، سەرخۆش دەبوو ئیتر مندالانی سلێمانی دەکەوتنە شوێنی و، ئەوەندەی نەدەما کە شێتی بکەن، پێشم وابوو، کە ئەو کەسایەتییە بەتایبەتی کەوا بە قوربسی سەرخۆش دەبوو، ئێش و ئازارێکی دەروونی تایبەتی خۆی هەبوو و، کەسێکی شک نەدەبرد کە سکاڵاکانی دڵ و دەروونی خۆی لاهەڵبژێرێت، بۆیە ناچاردەبوو کە دەردی دڵی بۆ بادە بەبا بکا. ■■■

پەیامی کورد ئامادەی بڵاوکردنەوەی ریکلامەی بازرگانی و بروسکەی پیرۆزبایی و پرسەنامەیە بەنرخێکی گونجاو

کەلووکانی هەفتە



کاور ٣.٢١ تا ٤.٢٠
تەندروستیت باشە و ئەم ماوەیە چالاکیت، خۆشەویستەکەت"یان هاوسەرەکەت" لەم چەند ڕۆژەدا سۆزێکی بەتینی هەیە بۆ تۆ، سوودی لێ وەربگرە.



گا ٤.٢١ تا ٥.٢٠
هەفتەیەکی باشە لە بواری کاردا، هاوڕێیەکت نهێنییەکت لای تۆ دەدرکێنێت و دڵخۆشت دەکات، ئاگاداری خۆت بە لە ناحەزان چونکە چاویان لە دواتە.



دوانە(جمک) ٥.٢١ تا ٦.٢١
ئەم هەفتەیە ڕووبەڕووی زۆر شتی چاوەڕوانەکراو دەبێتەوە، گوێ لە هاوسەرەکەت بگرە چونکە هەندێ قسەی گرنگی بۆ تۆ هەیە.



قرژاڵ ٦.٢٢ تا ٧.٢٢
لە ڕووی کارەوە جێگیریت، بەڵام لە هەندێ ڕووی ترەوە، نیگەرانیت، ئەگەر دیقەت بدەیت، لەم ماوەی دواییدا، زۆر شتت بە دەست هێنا، باوەڕت بە خۆت بێت.



شێر ٧.٢٣ تا ٨.٢٢
گرنگی بدە بە کارەکەت لە هەموو شتێکی تر زیاتر، چونکە لە هەموو شتەکان تر پێویست تر، هەوالێک بە ڕێگەوەیە و دڵت خۆش دەکات.



فەریک ٨.٢٣ تا ٩.٢٢
هەڵێکی باشت بۆ ڕێککەوتووە، سوودی لێ وەربگرە چونکە داهاتووت بەم هەڵەوە بەندە، کەسانێک دەناسیت کە سوودت پێ دەگەیەنن.



تەرازو ٩.٢٣ تا ١٠.٢٢
گوێ لە قسە و قسەڵۆک مەگرە چونکە کۆتایی نییە و بێ سوودیشە، کار و باری ئابووریت بەرەو باشتر دەڕوات.



دوو پشک ١٠.٢٣ تا ١١.٢١
چەند کاتێکی نائاسایی لە پێشتن، بە وریایی ڕووبەڕوویان بەرەوە، ئەوەندە لەسەر شتی بێ بایەخ تورە نەبە و هەڵوێستی نابەجێ وەرمگەگرە.



کەوان ١١.٢٢ تا ١٢.٢١
ئەم ماوەیە زۆر بیزارێت، بەڵام لەگەڵ ئەوەشدا کاتێکی باشە کە تۆزێک بە خۆتدا بچیتەوە و بە عەقڵ بڕوانیتە شتەکان نەک بە هەست.



گیسک ١٢.٢٢ تا ١.١٩
زۆر بە توانایت، بەڵام واتیتەگەیت کە تواناکەت هاوتای نییە، چونکە لەخۆبایبوونت سەرەتای تیاچوونتە، هەڵێکی گەورە لە ڕێگەدایە.



سەتل ١.٢٠ تا ٢.١٨
شتی تایبەتی خۆت لای ئەو کەسانەی کە تازە دەیانناسیت باس مەکە، هەوڵ بدە کەڵک لەو دەرفەتەی ئێستا وەربگریت و شتێک بە شتێک بکەیت.



نەهەنگ ٢.١٩ تا ٣.٢٠
زۆر ڕەق نەبە لە هەڵوێستەکانتدا، چونکە بە سوودی خۆت ناشکێتەوە، گەشبین بە لە ژیانتدا، چونکە بەخت و ناوچاوانت باشە.



شەوێکی سپی

فرمێسک مستەفا - ئاڵمانیا

بەگریانێکی بە کۆڵ بەرەولام رایکرد و پەنجە بێ هێزە بچوکەکانی لە ئامێزی گرتم، لێزمەی فرمێسکێ لە چاوە رەشەکانییەوە دائەبارینە سەر کۆڵم هەڵبڕژکاوەکانی بە دەنگێکی لەرزۆک وتی: دایە ماسییە سپییەکەم مرد! چەخیخەیەک دای لە هەرێمی جەستە و مێشکم، لێوەکانم چەقینە بەستەڵەکێ و گوێیان نەدەکرد، بە حاڵێک وەڵامم دایەوە: کوڕە شیرینەکەم مردن بۆ هەموو گیانلەبەرێکە، تەنانەت سەوزایی و گوڵاڵەکانیش، ئەمەش مانای تەواوبوون نییە، لە وەرزێکی تر و لە کاتێکی تردا لەدایک دەبنەوە. وتی: نا..ماسییە سپییەکەم نابێ بمرێت! زۆرم خۆش دەویست، زۆر حەزم لێی بوو..ئەو زۆر جوان و ئاسوودە بوو..بۆ بمرێت؟ نابێ بمرێت! ئەو نەیدەزانی ئەم وشەیەی ئەیدا بە گوێمدا چۆن مێشکم دەهەژێنێ، ئێفلیجم دەکا لە هەرکات و جێگایەکدا بەر گوێم بکەوێ ژیان لام رادەوەستێ، ئەم لوغزە تاڵە تاکە شتێکە هیواکانم لێ دەستێنێ، لێی ناگەم، وەریناگرم، دەمکاتە گلگامێشێکی دیکە و بە دووی نهێنی ئەم کۆتاییەدا وێڵ دەبم و ئەنجامیش دەمخاتە دونیایەکی پر جنجاڵی. جارێکی تریش واپەرت پەرت بوومەوە، گەڕانمیەوە کەناری ئەو گلگزیانەی خۆشەویست و باوک و هاوڕێکانمی لێ سەندەم، ئەو جەنگ و کارەساتانەی مرۆڤیان قڕکرد و بێ گوناهی لە یەخەی ژیان ڕایانمالین، ژیان کە ئەدۆڕێت، مردن دەیباتەوە. لەگەڵ قوڵپی فرمێسکەکانی ئەودا، ئەوانیش لەوناو وێژدان و هەستمدا قوڵپیان ئەدا، یەکە یەکەیان لە چەند چرکەیەکدا زیندووبوونەوە و دەمردنەوە، یادگاریەکانیان دەهاتنە مێوانیم و مردن بۆ خۆی دەبردنەوە. هەنسکەکانی ئەویش دەیهێنامەوە ئەم نیشتمانە سارد و سڕە. منێ بەم پەژارەیەوە چ وەڵامێک بدەمەوە تا ئەم جگەرگۆشەیەم ئارام بکاتەوە، ئەم کۆسپە گەورەیەی ئەمشەوی بە چ رستەیەکی دروست سەبوری بدەمەوە، منێ بۆ خۆم تا ئێستەکانێ هیچ وەڵامێکم بۆ مردن پێ نییە و نایدۆزمەوە، بۆم شی ناکرێتەوە ناچار و دووڵ پێم گوت: وەرە دەستم بدەرێ با لە پەنجەرەی ژورەکەتەوە سەیری دەرەوە بکەین، پێکەوە پەردەکەمان لە ڕووخساری پەنجەرەکە لادا و ئاکاری شەو سپی هەڵگەڕابوو، جیهانێکی کپ و بێ دەنگ جیهانی ئەودیو پەنجەرەکە بوو، کۆڵۆ بەفرەکان وەک شیوەنی دایک دادەبارینە خوارێ..نا..زۆر بە پەلە دەهاتنە خوارێ، لە ڕۆیشتنی تەمەن دەچوون، تەمەنێ زۆر پەلەی تەواوبوونی بێت. وتم: سەیری ئەم شەوە سپییە بکە شیرینەکەم، هەر ئەڵێی ماسییە سپییەکەی تۆیە هێمن و ئارام ڕۆحی دادەبارێتە سەر پەنجەرەکەت و باخەکەت پر لە ئاسوودەیی دەکات، تا بەیانی لە باخەکەماندا ماسی سپی بچوک بچوک دروست بکەین لەگەڵ شێرە بەفرینەکاندا یاری بکەن...هەر شتێ بمرێ دواجار بۆمان دەبنە شتێکی جوان و لە ژیانماندا بە دیبان دەکەینەوە دەڵمان خۆش دەکەن. ئیدی هەموو زستان لەم وەرزەدا، کاتێ بەفر باری بەشێکی هی زستان خۆیەتی و ئەوی تریشی ماسییە سپییەکەی تۆیە، بۆت دووبارە لە شێوەی بەفر و تۆش دەیکەیتە ماسییە سپییەکە، بەمەش ئێوە کەستان ئەوی ترتان لەیادنەکردوە و بە شێوەیەکی تر و جۆرێکی پێکەوە دەژینەوە، دواجاریش کە گەورەبووی ئەم چیرۆکە بۆ ساواکانت بگێڕەوە تا ئەوانیش لەگەڵ تۆیا ماسی سپی هەموو زستانێ بە کۆڵۆ بەفرەکان دروست بکەنەوە. ئەمەش نەمری و وەفایە خۆشەویستەکەم، کە هیچتان ئەوی تر لە یاد نەکەن. لە نێوان گومان و ڕاستیدا دەژیا و چیرۆکەکەم چاوە لە تاسەوە چووەکانی بەرەو وەنەوزی خەو بردی و بێ دەنگی دایگرت..بێ دەنگیەک لە بێهودەیی زێدەتر لە هیچی تر نەدەچوو. ئەو تازە هاوڕێ خنجیلانەکەی لەدەست دا و مەحاڵە جارێکی تر لە حەوزەکەیدا مەلە بکاتەوە!! زەردەخەنەیەکی وشک و تاڵ سەر لێوەکانی گرت، توند لە ئامێزی گرتم منیش بە هەموو هێزم نووساندم بە سنگمەوە وەک ئەوەی هەردووکمان لە



دابڕان تۆقیبێتین و خۆمانی لێ بپارێزین. دوای چەند ماچێک لەسەر ڕوومەتم جێی هێشت خەونی لێکەوت. ئەوجا، من دامە پڕمەی گریان. جارێکی تریش بۆ مردن، بۆ کۆتایی و جێهێشتن، بۆ ماڵئاوایی، بۆ ماسییە سپییەکە، تا دوێنێ چەند بەنازەوە لەنجەی دەکرد و بێ خەبەر بوو لە پلانی قەوزەکان.

دیمەنی بلوزی منداڵێکم هاتەوە بەرچاو هێندەی مشتەکزڵەیەکم دەبوو چۆن گوللەڕێژکرابوو لە ژێر خۆڵ و بەردی "ئەمنی عامی سلێمانی" دۆزرایەوە. ئەی ئەو منداڵانەی لەگەڵ تەمێکی سپیدا قومیان لە شیری دایکیان ئەدا، یەکەم قومی ئەو بەیانیەیان بوو گێژەڵوکەی مەرگ لە یەک ئامێزدا لە یەخەی ژیانی دامالێن. ئەی ئەوانەی بە زیندوویی زیندە بەچاڵ کران.. ئەی..ئەی..ئەوانە کەی بێ ڕۆحیان بە ئاسوودەیی سەردانی گوندەکانی خۆیان بکەن و ببنە چڵە نێرگزێ و لە نەورۆزێکدا جەژنێ بکەن؟ دیمەنی ئەو دایکانە هاتە پێش چاوم پێش لەدایکبوونی کۆرپەکانیان بەر گوللە دران و وەفاتنامەیان لەسەر لووڵە تفەنگێ بۆ نووسرا، کەسێ نەهات.. کەسێ کێ بوو؟ ڕۆحیان ئاسوودە بکا. ئەوانە بە مردوی یاخیبوون لە ئێمەی ئیساکەمان، نەلەگەڵ ڕەنگی بەهار و نە تنۆکە بارانی پایزێ دەیان بینینەوە. ئەوان بەم شاشوبەیە ڕازی نین، هەموو ساتێکیش دەمرن و گوللەڕێژ دەکرێنەوە. گریام و هەنسکم تەمێکی ئەو شەوە بەستەڵەکیە بوو. تەنها بوونی جگەرگۆشەکەم و مردنی هاوڕێ شیرینەکەی، بێهودەیی ژیانی پێ دەگوتم، باسی ئەو گێلانەم هاتەوە یاد بە نەفامی دەمرن، ئەم شەوە سپییە کردمیە دەریایەک لە ئازار شێتانە شەپزلەکانم دەیان نااڵاند و بە باڵای ئاسماندا هەڵدەچوون و لە کەنارێکی وندا دەگیرسانەوە.. دەیانبردمە دیدەنی ئەو ئافرەتانەی لە چەشنی ماسییە سپییەکە ناڕدار و بێ گەرد لەنجەیان بۆ حەوز و ئاواتە سادەکانیان دەکرد لەپێناوی قەوزەی ناموسی پیاوێکدا پارچە. پارچەکران، سووتاندیان.. ئەوانە لەگەڵ هەر"اللە أکبر"ێکی سپێدەی شار و گوندەکانیاندا سووڕەتێ بۆیان دەبێتە قەرەبروت و لافاوێکی ڕەش بەرماڵی مزگەوتەکان لوولئەدا و بەرەو دادگا ڕاپێچیان دەکات.. بەڵام چ دادگایەک؟ ئەوانەی وەک کەلاوە جێماوەکانن؟؟ بە خۆمم دەگوت: ئەم شەوە سپییە دەمترسێنێ لە شیت بوون، کەسێ نەبوو ئارامم بکاتەوە، لەم ترسە هێمنم بکاتەوە. سنگێ نەبوو ئازا و پر لە حیکمەت بە چیرۆکێ خەوم لێ بخا و بەشداری نەهامەتی ئەمشەوم بکات و کۆتاییەک بۆ دوای ئەم شەوە سپییە دابنێ. ■■■

● ئەو خێزانەی لە ئەمنی عامی سلێمانی لە حەوشەکەدا بە کچ و کوڕ و منداڵەکانیانەوە زیندە بەچاڵ کران، خێزانی مەلا گوروونی نەمر بوون.

دەرێژەی خۆپێشاندان لە شاری ....

کورد ئەنجامی دەدات لە شارە کانی مەهاباد و بۆکان و سەقز و شوێنەکانی تر . بە پێی بەرنامە خۆپیشاندەران لە سەعات 3 دوای نیوەڕۆ لە دوای کۆبوونەوە لەبەردەم بالەخانەی پەرلەمان ڕێپێوان دەستێ پێکرد و خۆپێشاندەران بەرەو ناو شار دیسڵدۆرۆف بەرێکەوتن و بەدرووشمی جیاجیا دژی کۆماری ئیسلامی و کارە سەرکووت کاریەکانی ئەم دوایەی شارەکانی کوردستان ئەم کۆمارە خۆپیشاندەران بەیەک دەنگ هاواریان دەکرد دواجار خۆپیشاندەران لە بۆرگ پلاتس جێگیربوون و بەرنامەی گووتار خوێندنەوە دەستی پێکرد سەرتا دەقیقەیەک وەستان بێدەنگ بوون و وەستان بۆ گیانی پاکی شەهیدانی کوردوکوردستان ئینجا چەند ووتارێک لە لایەن حزب و ڕێکخراوە سیاسیەکوردستانیەکان خوێندرایەوە. ■■■

دراماتوونووسانی جیهان

مەهدی مجید جاف



٤٥ـ ساموئێل بێکت
Samuel Beckett

دراماتوونوسی بەناوبانگی ئیرلەندی ساموئێل بێکت، لە سیازدەی ئەپریلی١٩٠٦دا، لە گەڕەکی "کیلۆکسن ڕۆک" لە باشووری شاری دوبلین پایتەختی ئیرلەند لە خێزانێکی ماماوەندی و، سەر بە مەزهەبی پرۆتستانت لەدایکبووە. لە تەمەنی چواردە ساڵیدا، لە قوتابخانەیەکی"شەو و ڕۆژ"یدا لە دوبلین درێژە بە خوێندن دەدات و، لە ساڵی١٩٢٣دا، لە خوێندنگەی بەرزی تریننتی دوبلین لە بەشی فیزیۆنی زمانی فەرەنسی و ئیتاڵیدا، دەست بە خوێندن دەکات و، لە ساڵی١٩٢٧دا، بە سەرکەوتوویی قەواوی دەکات. پاش تەواوکردنی خوێندنی ماوەیەک لە بلفاست دەست بە وانەگوتنەوە دەکات. لە ساڵی١٩٢٨دا، بۆ شاری پاریس سەفەر دەکات. لە ساڵی١٩٢٨تا ١٩٣٠ لە شاری پاریس، دەبێتە مامۆستای زمانی ئینگلیزی و خەڵاتێکی ئەدەبی لە شیحرێکیدا بە ناوی"ڕۆژگار"ی پێ دەبەخشرێت و، وەک شاعیرێک دەناسرێت. لە شاری پاریس، لە ساڵی١٩٣١دا، نامیلکەیەکی پڕ لە مەبەست لەسەر"مارسیل پرۆست" دەنووسێت و، هەر لەو ساڵانەدا بە جێمس جۆیس ئاشنا دەبێت. لە ساڵی١٩٣٠دا و، لە تەمەنی بیست و چوار ساڵیدا، بڕوانامەی لیسانس وەردەگرێت. لە ماوەی چوار تەرمیندا، وانەی زمانی فەرەنسی لە خوێندنگەی بەرزدا دەڵێتەوە. لە ساڵی١٩٣٧دا، لە شاری پاریس نیشتەجێ دەبێت، پاش هەڵگیرسانی شەڕی شۆمی جیهانی دووەم، بە گەرمی و تونڈی دژی دەبێت و، بڕیار دەدات بە زمانی فەرەنسی بنووسێت، کۆمەڵێک بەرهەمی ئەدەبی بە چاپ دەگەیەنێت. کە ناوبانگ و شکۆداری پێ دەردەکات. لە ساڵی١٩٤٣دا، دووەمین بەرهەمی خۆی بە ناوی"گات" بە زمانی ئینگلیزی دەنووسێت. لە ساڵی١٩٥١دا، چیرۆکێکی سێ بەشی بە ناوی"مۆلاوی" و "مالون دەمرێت" و "بێ ناو"، بە زمانی ئینگلیزی بڵاودەکاتەوە. ساموئێل بێکت، لە پاش جەنگی جیهانی دووەم، دەگەڕێتەوە شاری پاریس و، بە زمانی فەرەنسی دەست بە نووسین دەکات. لە ساڵی١٩٥٢دا، شانۆنامەی بەناوبانگی"لەچاو ڕوانی گودۆ"دا، بڵاودەکاتەوە، بێکت لە ڕێی ئەم شانۆگەرییەوە ناوبانگی جیهانی دەردەکات. لە بەرهەمەکانی تری ساموئێل بێکت: "گوتاری گەمە"، "ڕۆژە خۆشەکان"، "گەمەکان"، "شیعر بە زمانی ئینگلیزی"، "رامینەرا"، "پرۆست و سێ گفتوگۆ لەگەڵ جۆرج دو توبی"، "وەرگی". بێکت هەمیشە لە بەرهەمەکانیدا ئەم پرسیارانە دەکات: من کێم؟ کات و شوێن چین؟ بیر و مادە چییە؟ ڕیالیزم چییە؟ لە ساڵی١٩٧٣دا، شانۆنامەی"من نا" دەنووسێت. ساموئێل بێکتی مەزن و ناودار لە تەمەنی هەشتا و سێ ساڵیدا و، لە ساڵی١٩٨٩دا، ماڵئاوایی لە ژیان و جیهانی ئەدەب و فیکر دەکات. ■■■

ڤیزای ئێران لە ماوەی یەک هەفتەدا

ئاژانسی تۆریستی NEW PLAN

ئێمە ئامادەی خزمەت کردنی هاوڵاتیانی کوردی عێراقین

کوردستان لە ڕێگای تارانەوە

ڤیزای ئێران بۆ خێزانی پتر لە سێ کەس ١٢٠ € /کەس

بلیت بۆ سەرتاسەری جیهان

حەجی "عمرە"

Thomas-Mann Str, 24
53111 Bonn
Germany
Tel.: 0049 (228) 180 24 34
Fax: 0049 (228) 180 24 38
E.Mail: info@newplan-travel.de
www.newplan-travel.de

گەشتی توریستی بۆ سەرتاسەری جیهان

تاران لە ٣٢٠€وە

پەیڤ...

نووسینی: ڤینوس فایق



عێراق، تازە بەکەڵکی کورد نایەت

ئەمرۆ لە جاران زیاتر مەترسی نشوستی ئەزموونی دیموکراتی و فیدرالی لە عێراقدا کەوتۆتە ئاراوە. لە دوێنێ زیاتر لەناو خەڵکدا دڵەڕاوکێ هەیە و باس و خواس ئەوەیە کە ئەگەری سەرکەوتنی پرۆژەی فیدرالی و داخوا ئالتەرناتیف چی بێت..

وابزانم پێویست بە پرسیار ناکات، چونکە هەر لە زووەوە کورد خۆی بەکڵا کردبۆوە ئەگەر سیاسەتی نێو ئەتەوەیی بیەپێشتایا، لەبەر خاتر و خۆشی ولاتانی دراوسێی عێراق و لە ترسی ئەوەی کورد نەبێتە میللەتێکی سەربەخۆ وەکوو هەموو میللەتانی تری سەر ڕووی زەمین و بەهێز بێت، خەونی دێرینی کورد بە دروستکردنی حکومەتی سەربەخۆ کرایە قوربانی فیدرالی و فیدرالیش ئەوەتا لە نیوەی ڕێ چەقیوە و هەر هەنگاو ئەنێ و هەڵئەنووتێ، بە باوەڕی من ئەمرۆ لە دوێنێ زیاتر کورد و دەسەڵاتدارانی سیاسی کورد ئەبێت بە شیوەیەکی جیدیانەتر بە هەڵوێستی خۆیاندا بچنەوە، بەتایبەت کە هەموو ڕۆژ باشتر و ئاشکراتر ساغ ئەبێتەوە عێراق وڵاتی ئیمە نیە و خۆمان هەڵەخەڵتینین، عێراق ئەو کاتە ئەکەینە وڵاتی خۆمان کە ماف و کەرامەتمانی تیا پارێزراو بێت، نەک ئیمە بیریسین و ئەوان ڕیسەکەمان بکەنەوە بە خۆری، ئەوەتا تازە بەتازە ژنانی شاری بەسرەی بەناو خۆراگر ئەچنە سەرجادە و لە جیاتی ئەوەی داوای مافی زیاتر بکەن بە بانگی ئاشکرا و پر بە دەم داوای چەسپاندنی شەریعەتی ئیسلامی ئەکەن لە مافەکانی ژنانداو داوای ئەوە ئەکەن هەموو ئەو مافانەی یاسای باری کەسایەتی ژمارە 188ی ساڵی 1959 پێی بەخشیون هەڵوەشێتەوە و هەروەها هەموو ئەو مافانە ڕەت ئەکەنەوە کە ڕێکخراوە عێراقیەکانی ژنان داوای دەکەن و خەباتی بۆ دەکەن و داوا دەکەن ژنان بچنەوە ناو چێشتخانە، ئەمەش لە بەرامبەر ئەو خۆپیشاندانەی ڕێکخراوەکانی ژنانی عێراق لە بەغدا پێی هەستان و داوای مافی زیاتریان کرد بۆ ژنان لە دەستووری عێراقدا.

بە باوەڕی من ئەمە هیچ لێکزلینەوە و باس و خواس هەڵناگرێ، چونکە بەڕوونی دیارە کە پلانێکی حیزبە ئیسلامیەکانە کە دەستیان وەرداوەتە هەموو کارووبارێ نەک دەوڵەت و هەموو بوارەکانی ژیانی هاوڵاتیان، بەڵکو بوونەتە مەترسی و هەڕەشە بۆ سەر هەموو هەنگاوەکان بەرەو بە مەدەنی بوون و بە ئینسانی کردنی ئاوانەکانمان و خەونەکانمان، من بۆ خۆم گومانم هەیە جارێکی تر کورد لە عێراقدا بەحەسیتەوە، جارێکی تر وڵاتێکی خەرایات دوای دژندەترین ڕژێمی دیکتاتۆری، دوای ئەوەی هەرچی حیزب و حیزبۆکە ئیسلامیەکان سەریان لە کون دەرهاویشت، مەحاڵە جارێکی تر کورد بتوانێت لەو عێراقەدا بە ئاسوودە بژیێت، بژیە ئەڵێم جیابوونەوەی ئیستە باشترە لەوەی دواڕۆژ خوێن بێتە ناوبژیوانمان. ■■■

Venusfaiq@yahoo.co.uk

مەلا و ئاسایش



حەمە سەعید حەسەن

دەزگای زاری کرمانجی کە تازەکی لە سۆران کراوەتەوە، لە ٢٠٠٥/٧/١٨ دا لە جوندیان کۆڕێکیان بۆ ساز کردم، تێیدا باسی ئەو (ئازادی و دیموکراتی)یەم کرد کە لە سایەی ئیسلامدا هەبووە و هەیە. مەلاکانی ئەو ناوچەیە هێندە سەغڵەت بوون، هەڕەشەی ئرەوەیان کرد کە سکاڵای خۆیان دەبەنە کن سەرۆکی هەرێم و کارێک دەکەن، دەزگای زاری کرمانجی دابخرێت. (حەمە سەعید حەسەن مەلاکانی سۆران هەراسان دەکات،) ئەوە مانشێتی هەفتەیەک دواتری هەفتەنامەی زاری کرمانجی بوو. لە ٢٠٠٥/٧/٢٤یشدا میوانی سەنتەری ڕۆشنبیریی ئاکرێ بووم، لەوێ ئەگەر چی باسی هونەری ساتیرنووسینم کرد، وەلێ هێندەی پێم کرا، ئیسلامییەکانم کرد بە بابەتی ساتیر.

سەنتەری ڕۆشنبیریی پارێزەران لە ٢٠٠٥/٧/٢٥ دا، کۆڕێکیان لە سەنتەری ڕۆشنبیریی زانکۆی سەلاحەدین بۆ ساز کردم و تێیدا باسی تێڕوانینی ئیسلام بۆ ژن کرد. کە قسەکانی من تەواو بوون، گەلێک لە ئامادەبووانی کۆڕەکە قسەیان کرد، قسەکەری یەکەم کەسێک بوو، من وای بۆ چووم، کەسی دووەمی ناو حیزبێکی ئیسلامییە، وەلێ دوای کۆڕەکە بۆم دەرکەوت کەسی سێیەمی ناو وەزارەتی نێوخۆیە. دادوەر تاریق گەردی کە هاوزەمان بەڕێوەبەری گشتی دیوانی وەزارەتی ناوخۆ و ئەندامی لقی دووی پارتیشە، وەها دەپەیڤی، ئەوی نەیناسیبا، وای بۆ دەچوو، میری کۆمەڵێکی ئیسلامییە و لە مێژە چاکی جیهادی لێ کردووە بە لادا! ئەوە بژیە تیرۆریستان وا بە ئاسانی لەنێو ئاسایشدا گەرا دەخەن.

چونکە کەنالی سەتەلایتی کوردستان لە ٢٠٠٥/٨/١ دا، لە ڕێی پرۆگرامی (پانۆڕامای ڕۆشنبیری)یەوە، بە ڕاپۆرتێک ئەو کۆڕەی بەسەر کردەوە، وەزارەتی ناوخۆ لە سەر ئەو (سەرپێچی!)یە، پەخشی تەلەفزیۆنەکەی بۆ ماوەی بیست و چوار سەعات ڕاگرت!(*) ئەنجوومەنی بەڕێوەبردنی تەلەفزیۆنەکەش لە سەر نیشاندانی ئەو ڕاپۆرتە سەر بە گۆبەنە، (سامان حسێن)ی کە بەڕێوەبەری



حەمە سەعید حەسەن لەگەڵ هەوار مەبدولڕەحمان(لای ڕاست) و سامان حسێن(لای چەپ) هەڕەوکیان دوای نیشاندانی چەند بڕگەیەکی ئەو کۆڕە، سزادران، سامان حسێن کارێکەی گۆردرا و هەوار عەبدولڕەحمانیش ناچار کرا دست لەکار بکێشێتەوە.

ڕۆشنبیری و گەشەپێدان)ی کوردستان تیڤی بوو، لەسەر کارەکەی دەرکرد و (هەوار عەبدولڕەحمان)یشیان کە پێشکەشکاری ڕاپۆرتەکە بوو، ناچار کرد دەست لە کار بکێشێتەوە.

(زانا!)یانی ئیسلام لە لاوازیی (فیکر)ی سەردەم بەسەرچوویانەوە، بەرگەی ئازادیی بیرورا دەربڕینیان نەگرت، پارتی دیموکراتی کوردستان لە لاوازی هەڵوێستییەوە، بەرگەی گوشاری (زانا!)یانی ئیسلامی نەگرت، بژیە وەزارەتی ناوخۆ وەک مەقاشێک بێت بە دەستی (زانا!)یانی ئیسلامەوە، پەخشی سەتەلایتی کوردستانی ڕاگرت.(*) بەرپرسی (کوردستان تیڤی)یش نەک هەر لایەنی بیرورای ئازادی نەگرت، بەڵکوو بۆ ئەوەی سەری خۆی سەلامەت بێت، گۆزەکەی لە سەری (سامان) و (هەوار)دا شکاند. سەروەختی تیرۆرکردنی عەبدولخالیق مەعروف، مزگەوت کلکی لەگەڵ ئەمن و مونەزەمەدا گرێ دابوو، هەنووکە وەل ئاسایش و بارەگادا گرێی داوە. ■■■

(*) ئاگاداری بینەرانی بەڕێزی سەتەلایتی کوردستان دەکەین کە بە هۆی سەرپێچییەکی یاساییەوە، وەزارەتی ناوخۆی هەرێمی کوردستان بە فەرمانی وەزاری ژمارە ٧٥٨٩ لە ڕۆژی ٢٠٠٥/٨/٣ بڕیاری ڕاگرتنی پەخشی سەتەلایتی کوردستانی دا، بۆ ماوەی بیست و چوار کاتژمێر کە لە کاتژمێر پانزەی ڕۆژی ٢٠٠٥/٨/٣ بە کاتی کوردستان دەستپێ دەکات.)

پەیامی کورد و هەڵەی چاپ



دانا ڕەئووف ـ

لەم چەند ساڵەی دواییدا، هەندێ گۆڤار و ڕۆژنامە لە هەندەران لێرە ڤۆ لەوێ، دەرچوون. هەنێکیان هەر لە سەرەتاوە بە ناوەڕۆک و شێوازێکی جوان و قەشەنگەوە، دەرکەوتووە. هەندێکی تریش هێندە بڕی نەکردووە و زوو لەبار چووە.

ئەرکی ئێمەش ئەوەیە کە بە پێی توانا بەدەم ئەم هەوڵ و تەقەلایانەوە بچین و هاریکارییان بکەین بۆ بەردەوامی ئەو ڕۆژنامانە و پێشکەوتنی ڕۆژنامەگەری کوردیش.

هەفتەنامەی "پەیامی کورد"یش تەقەلایەکی باشە و بە تایبەتی لەم چەند ژمارەیەی دواییدا، گۆڕانکاری بەرچاوی پێوە دیارە، بەڵام لە هەمان کاتدا، ئەم ڕۆژنامەیە لە کەم و کوڕیش بەدەر نییە! هەندێ لەو کەم و کووڕیانە کاریگەرییەکی ئێجگار خراپ و نەزانینی پیشەیی ڕۆژنامەگەری و شێواندنی قەڵەمی نووسەرانیشە.

من بەش بە حاڵی خۆم و لەسەر داوای برایانی ئەم هەفتەنامەیە، هەر لە سەرەتاوە بڕیاری ئەوەم دا کە بەپێی توانا، دەستگیرۆیی و هاوکاری ئەم تەقەلا پیرۆزە بکەم و بەردەوام بە باس و بابەت، بەسەریان بکەمەوە، بەڵام بە داخەوە زۆربەی جار نووسینەکانم، هێندە هەڵەی چاپیان تیادایە، هەندێ جار خۆشم نازانم چیم نووسیوە.

لە عورف و عادەتی ڕۆژنامەگەریشدا، هەمیشە ڕۆژنامەکان گەر هەڵەیەکی چاپیان کردبێت، ئەوا لە ژمارەی داهاتودا داوای لێبوردن لە خوێنەران و لە نووسەری بابەتەکەش دەکەن، پێدەچێت ئەو عادەتە لە لای دەستەی نووسەرانی "پەیامی کوورد" نەبێت. لەبەر ئەوە من خۆم لە لای خوارەوە، ئامارە بە هەندێ لەو هەڵەی چاپانە ئەدەم، هەندێ لە هەڵەکانیش زۆر زەقن و داوای لێبوردنێکی گەورە لە خوێنەرانی ئازیز دەکەم و پەنجەی کەمتەرخەمی و بە تەنگەوە نەهاتنیش بۆ دەستەی نووسەران دریژ دەکەم و هیوادارم لە ئایندەدا، زیاتر بە چاوێکی وردو و هەستێکی بەرزەوە مامەڵە لەگەڵ نووسینەکانی هەفتەنامەکەیاندا بکەن.

یەکەم: لە ژمارە ٢٤ی ڕۆژی ٢٠٠٥/٢/١٨دا، باسێکم بە ناونیشانی "چیرۆکی جولەکەیەکی چاوچنۆک" بڵاو کراوەتەوە بەڵام (لاپەڕە و نیوێک) لە خوێنەران و نووسەر دەکات؛ کە هەڵەیەکی گەورەی کردبێت، زۆربەی ئەو هەڵانەش لە "ناو" دا ڕوودەدات.

چوارەم: تاکە هەڵەی گەورەی ئێمە پەراندن لاپەڕەیەک بووە نەک لاپەڕەونیوێک، ئەویش لە ژمارەی دواتردا، لەوێوە چاپکراوەتەوە و بۆی بڵاوکراوەتەوە، ئەمە سەرەڕای ئەوەی کە بەڕپرسی ئەو بەشە بە تەلەفۆن قسەی لەگەڵ خودی کاک دانا کردووە و پێزشی بۆ هێناوەتەوە.

پێنجەم: شتێکی هەرە گرنگ ئەوەیە کە دەبێت، بەڕێز کاک دانا و خوێنەرانی تریش بزانن، ئەو بەڕێزانەی لێرە کاردەکەن، بێ بەرانبەر کاردەکەن و لە کاتی خۆیان و مال و منالیان دەگۆڕن، ماندووبوون و شەوخوونی دەچێژن بۆ بەشداریکردن لە بردنەپێشەوەی دۆزی کوردووەتەوە، هیچ کەس تۆمەتێکی وای نەخستووەتە پاڵمان کە قەڵەمیان بشێوێنین، بابەتی کەسانێکیشمان بڵاو کردووەتەوە کە لە ڕاستیدا نووسەر نین! بەڵام بە گوێرەی ئاستی نووسینەکانیان بوارمان پێداون، بابەت بڵاو بکەنەوە.

دووەم: ئەمرۆ لە جیهاندا زۆربەی کارەکانی مرۆڤ بە کۆمپیوتەر دەکرێت، کۆمپیوتەریش هێند گران نییە و بگرە لە ئامێری تەلەفزیۆن هەرزانترە، لەگەڵ ئەوەشدا زۆر بابەتمان بۆ دێت لەوانەش بابەتی کاک دانا، کە بەدەست نووسراون و دەبێت خۆمان سەرلەنوێ چاپیان بکەینەوە، بڕیا هەر ئەوەندە بێت، بگرە دەیان هەڵەی ڕێزمانی تێدایە و ئەوە خاڵبەندی هەر باسی مەکە.

سێیەم: کاتێک ڕۆژنامە داوای لێبوردن بەشی یەکەمی باسەکە، پەڕیوە.

دووەم: لە ژمارە ٢٩ی ڕۆژی ٢٠٠٥/٣/٢٤دا باسێکی ترم بە دوو بەش بڵاوبووەتەوە،ناونیشانی باسەکە (خێزان لە دەنگە نوێیەکانی شانۆی هاوچەرخی جیهاندا)یە، بەڵام لە هەردوو بەشەکەدا ئەم ناونیشانە لە "پەیامی کورد"دا بووەتە "خێزان لە دەنگە نوێ یەکانی هاوچەرخی جیهانیدا"، وا بزانم خوێنەران هەست بەو جیاوازییە گەورەیە ناکات.

سێیەم: دوا باسم لە ژمارە ٤٢ی ڕۆژی ٢٠٠٥/٧/١دا، بڵاو بووەتەوە، ناونیشانی باسەکە بەم شێوەیەیە " سەرکەوتنی خۆشەویستی" و بەهاکانی مێژووی ئەم شانۆیە"، بەڵام لای برادەرانی پەیامی کورد بژێتە" شانۆی پادشایەتی لە ستۆکهۆڵم پێشکەش دەکات"سەرکەوتنی خۆشەویستی" و بەهاکانی".

ئەمە تەنها دەستنیشانکردنی هەندێ لە هەڵە زەقەکانە، هیوادارم لە ئایندەدا پەیامی کورد زیاتر گرنگی بدات بە نووسینی نووسەرانی کورد لە پێناوی ڕۆژنامەیەکی ڕێکوپێک و پرۆفیشناڵدا. ■■■

تێبینی:

ئێمە ئەم هێرشنامەیەی بەڕێز "دانا ڕەئووف" بەهۆی باوەڕپوونمان بە بیر و ڕای ئازاد، وەکو خۆی بڵاوی دەکەینەوە با خوێنەران خۆیان، داوەڕین. ئێمەش هەندێ تێبینی و سەرنجی خۆمان بخەینە ڕوو. بۆ کاک دانا و هەموو خوێنەران و نووسەران.

یەکەم: کاک دانا ئێمە وا تاوانبار دەکات بەئەزانینی پێنەی ڕۆژنامەگەری و شێواندنی قەڵەمی نووسەر).. ئێمە تا ئێستا بابەتی زۆر لە نووسەرانمان وەک" جەمال خەزنەدار، ناسر باباخانی، حەمەسەعید حەسەن، غازی حەسەن، خەسرەو پیریاڵ و دەیانی تر بڵاو نەتەوەکەیان، لە کاتێکدا هەموو دەزانین کە لە ئەوروپادا کات زۆر بەنرخە و بە مانای پارە دێت، بەڵام ئێمە کات و ڕەنجی خۆمان پێشکەشی میللەتەکەمان کردووە، ئاسایە هەڵەی چاپیش دەبێت، بەڵام ئەوە مانای ئەوە نییە کە ئێمە شتێوێنەری قەڵەمی کەس بین.

شەشەم: بە دڵنیایەوە دەستەی نووسەرانی پەیامی کورد بە هەستی بەرزەوە مامەڵە لەگەڵ هەر نووسینێکدا دەکەن کە شایەنی بڵاوکردنەوەیێت و مەرجەکانی نووسینی تێدابێت، ئێمە ئەم تۆمەتی کەمتەرخەمی و بە تەنگەوەنەهاتنە ڕەت دەکەینەوە، ئەوەی توانیومانە دریغیمان نەکردووە و لە داهاتووشدا، نایکەین. ■■■

پەیامی کورد

بەکوردی بدوێ، بەکوردی بخوێنە، بەکوردی بنووسە، بەکوردی بیربکەرەوە!

دیداری هەڵگەوت زاهیر لەگەڵ:

هونەرمەند عومەر چاوشین



بێگومان کەس نییە ئەو هونەرمەندە رۆح سووکە نەناسێ، کە بە هەستێکی هونەری بە هونەرەکەی چەندین شەوانی لەلا خۆش کردبووین، دەبوبە میوانی شەوانمان...

هەڵگەوت: ئەم کاتەت باش کاک عومەر

عومەر چاوشین: ئەم کاتەی بەڕێزت باش کاک هەڵگەوت گیان، زۆر سوپاسی هەستی بەرزت دەکەم کە لە تاراوگەوە هاتوویت و سەردانی من دەکەیت و من بەسەر دەکەیتەوە، دیارە دیمانەکانت هەمووی جێگای خۆی گرتووە، بەڕاستی جێگەیەکی تایبەتیت هەیە لەلای هەموان، چونکە بێگومان بۆ خۆتان هونەرمەندن و باشتر لە ناخی ئێمەی هونەرمەند دەگەن کاتێک دەکەوینە گفتوگۆی دیمانە.

هەڵگەوت: دەتوانم لەسەر ژیانت چەند پرسیارێک بکەم؟

عومەر چاوشین: بێگومان ئازادی بۆ هەموو پرسیارێک.

هەڵگەوت: لە دایکبووی چ ساڵێکی و لە کوێ؟

عومەر چاوشین: من لە دایکبووی ساڵی ١٩٥٠م و لە شاری سلێمانی لە دایکبووم.

هەڵگەوت: یەکەمین کاری هونەری بەڕێزتان کەی بوو؟

عومەر چاوشین: ساڵی ١٩٦٨ ئەو کاتەی پێشمەرگە بووم هاتمەوە بۆ سلێمانی بۆ لای (سەید ئەحمەد دەنگ گەورە) خاوەنی ستودیۆ جوان بۆ وێنەگرتن و پێی وتم؛ تەمسیلێکمان هەیە ڕۆڵی ئافرەتی تیایە ئەتوانی بەشداری بکەیت لەگەڵماندا، من بەوپەڕی ئامادەیەوە پێم وت؛ بەڵێ ئامادەم، تەمسیلیەکەش بەناوی (گۆڕ هەڵکەن) لە دەرهێنانی (سەید ئەحمەد دەنگ گەورە)ی خوالێخۆشبوو بوو.

هەڵگەوت: دوای ئەم کارە بەشداری چی بەرهەمێکی هونەری دیکەتان کرد؟

عومەر چاوشین: دوای (گۆڕ هەڵکەن) بەشداری (لەژێر سێبەری درکدا) کە لە نووسین و دەرهێنانی (فەتاح کاوە) بوو.

هەڵگەوت: ئەی وەک تەلەڤزیۆن کام بەرهەم بوو؟

عومەر چاوشین: پاش ئەو دوو بەرهەمە بەشداری (مەکری ژنان)م کرد لەگەڵ هونەرمەندان (سمکۆ عەزیز و ئسماعیل بەرزنجی) ئەویش لە ساڵی ١٩٦٨ بۆ ساڵی ١٩٧٠ (مەکری ژنان)مان بۆ تەلەڤزیۆن تۆمار کرد.

هەڵگەوت: بەشداری کارەکانی دیکەی بەڕێزتان لەگەڵ هونەرمەند (مەکی عەبدوڵڵا) چۆن بوو؟

عومەر چاوشین: پاش ئەو کارانەی باسم کرد بۆ بەڕێزتان، بەشداری ١٠ کاری هونەری دیکەم کرد لەگەڵ (مەکی عەبدوڵڵا)، خۆشبەختانە کارەکانمان سەرکەوتنی بەدەستهێنا، ئەوانەش تا ساڵی ١٩٨٠ بەردەوام بوو.

هەڵگەوت: پاش ساڵی ١٩٨٠ بەردەوام بوویت لە کاری هونەری؟ چالاکیت چی بوو؟

عومەر چاوشین: ساڵی ١٩٨٠ من چووم بۆ سوید بۆ ماوەی سێ ساڵ لە کاری هونەری دابڕام، لە پاش ئەو سێ ساڵ دابڕانە دەستم کردەوە بەکاری هونەری.

هەڵگەوت: کۆی بەرهەمەکانت تا ئێستا دەتوانم بزانم چەندە؟

عومەر چاوشین: تاکو ئێستا بەشداری ٢٥٠ کاری هونەری بووم، لە هەموویدا بەشداری سەرکیم کردوە.

هەڵگەوت: دوا کاری هونەری بەڕێزتان چییە؟

عومەر چاوشین: فیلمێکە بەناوی (تۆڵە) بە هاوکاری لەگەڵ ئەمەریکییەکاندا.

هەڵگەوت: کێیە باشترین ئەکتەری نواندن لەلاتان؟

عومەر چاوشین: وەک ئەکتەری کوردی "ئازادی حەمە بچکۆل، عەبدولی حەمە جوان، مەکی عەبدوڵڵا و گەزیزە"، وەکو عەرەب "سوعاد حوسنی، عادل ئیمام و دوریدە لەحام"، وەکو بیانی "ئەنتۆنی کوین".

هەڵگەوت: وەک ئەکتەری نواندن بێگومان گۆڕ دەگۆڕی بۆ گۆرانی کوردی و دەنگی کام گۆرانییەڕ پێخۆشە؟

عومەر چاوشین: لەیلا فەریقی، زەکەریا، ئەیوب عەلی و عەلی مەردان.

هەڵگەوت: تا چ ئەندازەیەک لە کارەکانت ڕازیت؟

عومەر چاوشین: من بۆ خۆم لە کارەکانی خۆم ڕازیم، بەڵام ئێمە هونەرمەند زۆر بێ بەشین لە زۆر شت، بۆ نموونە تا ئێستا بەچاوی هونەرمەند تەماشا ناکرێن، هیچ پێوەرێک نییە بۆ خزمەتکردن بەداخەوە، کاک هەڵگەوت گیان سەردانی بەڕێزتان بۆ لای من شتێکی زۆر گەورەیە بۆم.

هەڵگەوت: من لە زۆر ماڵ بەرهەمەکانت دەبینم تا ئێستا بە ڤیدیۆ سەیر دەکرێن، بەڕێزتان خۆشەویستیەکی تایبەتیتان هەیە لە لای کۆمەڵی خەڵکی کوردستان.

عومەر چاوشین: ئەوە باشترین دەستکەوتە بۆ ئێمە.

هەڵگەوت: زۆر شادمان بووم بۆ ئەم دیدارە.

عومەر چاوشین: زۆر سوپاس بۆ تۆی خۆشەویست ئازیزم کاک هەڵگەوت بۆ بەسەرکردنەوەی من. ■■■

ئیسماعیل بێشکچی خەڵاتی کۆڕی زانیاری کوردی پێ بەخشرا

بۆ ڕێز گرتن و وەفاداری لە قەڵەم بڕشتیی و هەڵوێستی دۆستانەی لە بەرگریکردن لە مافی ڕەوای گەلی کورد، نووسەر و ڕۆژنامەنووس ئیسماعیل بێشکچی لەسەر بڕیاری دەستەی باڵای کۆڕی زانیاری کورد لە باشووری کوردستان، لە ڕۆژی 8 ئەم مانگە لە ئاهەنگێکی خنجیلانە و شایستە بە لێهاتووی ئەم کەڵە نووسەرە تورکە و بە ئامادەبوونی ژمارەیەکی بەرچاو لە ڕۆشنبیرانی کورد لە سەرووی هەمویانەوە شەرەفەدین ئالچین لەشاری ئەنقەرە کۆڕی زانیاری کورد خەڵاتی کۆڕی بە ئیسماعیل بێشکچی بەخشی لە بەرامبەر ئەو هەڵوێستە مرۆڤایەتییەی نواندوویەتی بۆ چارە سەرکردنی کێشەی کورد. نووسەر و ڕۆژنامەنووس کاک بەدران حەبیب ئەندامی کارای کۆڕی زانیاری کورد کە ئامادەی ڕێوڕەسمی خەڵاتکردنەکە بوو لە لێدوانێکیدا لە ئەڵمانیا گوتی: بێشکچی وێڕای پێبەخشینی بە خەڵاتی کۆڕی زانیاری کورد، یەکەمین کەسیشە کە شەرەفی ئەندام شانازی کۆڕی زانیاری کوردی پێدەبەخشرێ. جێگەی وەبیر هێنانەوەیە کە بێشکچی لە سەرەتای نەوەدەکاندا لەسەر هەڵوێستی داکۆکیکردن لە مافەکانی کورد لە تورکیا دووچاری چەندین ئازار و ئەشکەنجە و زیندانی بوون هاتووە بەڵام هەر کۆڵی نەداوە و تاوەکو ئەمڕۆش هەر بەردەوامە و گەلی کوردیش بەچاوی ڕێزەوە دەڕوانێتە ئەم کەڵە نووسەرە. ئێمەش لە پەیامی کورد



ئەو هەنگاوەی کۆڕی زانیاری کورد بەرز دەنرخێنین و دەستخۆشیان لێ دەکەین پیرۆزبایش لە بێشکچی خاوەن هەڵوێست و مرۆڤ دەکەین. ■■■

کۆی بەرهەمەکانی شێرزاد حەسەن لە کتێبێک چاپکران



PNA ـ کۆی بەرهەمەکانی چیرۆکنووس شێرزاد حەسەن لەلایەن دەزگای چاپ و بڵاوکردنەوەی ئاراس لە ٤٧٨ لاپەڕەی قەبارە گەورە، کەوتە بەردەستی خوێنەران. ئەم کتێبە لە بەرگی یەکەمیدا ئەم چیرۆکانەی لە خۆگرتووە: تەنیایی، گۆڵی ڕەش، گەڕەکی داهۆڵەکان، پیرە پەپوولەکانی ئیواران. بەرگی دووەمی ئەم بەرهەمانەی لەخۆگرتووە: حەسار و سەگەکانی باوکم ، پێدەشتی کارمامزە کۆژراوەکان، تەمی سەر خەندە ■■■.

دێڕەی نەخشەیەکی ئەمریکی بۆ....

پرۆژەیەوە و هاوکاری توانا نێودەوڵەتییەکان بکەن، تەئکیدیش لە سەر ئەوە دەکاتەوە کە لە ئۆپەراسیۆنەکانی شەڕی دژە تیرۆردا، هێز و تواناکانی تەوای ئەم دەوڵەتە لەگەڵ توانا ئەمنی و مخابەراتییەکانی دەخرێتە کار هەروەها باس لەو کاریگەرییە پۆزەتیڤانەی ئەم دەوڵەتە دەکات لەسەر نەخشەکانی ئەمریکا بۆ بەرەنگاری ئێران کە بە مەترسییەکی ستراتیژی داهاتووی دەبینێ لەسەر بەژدەوەندییەکانی ئەمریکا و بوونی ئاسایشی دەوڵەتی ئیسرائیل.

بە گوێرەی ڕۆژنامەکە؛ ئەو ناوەندەی ئەم ڕاپۆرتەی ئامادە کردووە، ئەوانەی ئامادەیان کردووە؛ پسپۆڕانی کاروباری خۆرهەڵاتی ناوەڕاست و تایبەتمەندی کێشەی کوردن، کە لە نێوانیاندا پرۆفیسۆرەیەکی ئەمریکی هەیە کە لێکۆڵینەوەی زۆری لەسەر دۆزی کورد هەیە و ناوی نەهێنراوە.

ڕاپۆرتەکە ئاماژەی بۆ ئەوە کردووە کە ؛ لەم قۆناغەدا پێویستی پشتگیریکردنی هەڵوێستی کوردەکان بۆ چەسپاندنی فیدرالی لە دەستوردا بکرێت بە مەرجێک دەسەڵاتی فراوان بە هەرێمی کوردستان بدرێت تا ڕێگە بۆ قۆناغی داهاتوو خۆش بکات بۆ دامەزراندنی دەوڵەتی کوردی، ئاماژەشی بەوە کردووە کە ئەو بارگرژییەی کوردەکان لەگەڵ هەر یەک لە ئێران و سوریا هەیانە بقۆزرێتەوە، لە دێڕەشیدا دەڵێت؛ ڕووداوەکانی ١٦/٤ی ساڵی ڕابردووی قامیشلی لە سوریا تەئکیدی ئەوە دەکات کە دەتوانرێت تیشک بخرێتە سەر چەوسانەوەی کوردەکان و بۆ ڕاگەیاندن و سیاسەت بەکاربهێنرێت.

ڕۆژنامەکە دەڵێت: ڕاپۆرتەکە داوا لە وڵاتە یەکگرتووەکانی ئەمریکا دەکات کە لایەنی ئەوروپاش بۆ خۆی ڕابکێشێت بۆ پشتگیریکردن و سەرخستنی ئەم پرۆژەیە بە تایبەتی هاوسۆزییەکی بەهێزی ئەوروپیش بۆ کێشەی کورد بە گشتی نەک تەنیا بۆ کوردی عێراق، هەیە. پێویستە ئاماژە بە وەبکرێت کە چەند لایەنێکی کورد، نەخشەی هەرێمی کوردستانیان پێشکەش کردووە کە پارێزگای کەرکوک و چەند بەشێک لە پارێزگای دیالە و موسڵ دەگرێتەوە، ئەمە لە کاتێکدا کوردەکان بانگەوازی مافی بڕیاردانی چارەنووس لە دەستوردا دەکەن.

شایەنی باسە، لە میانەی ئەم باس و هەواڵانەدا، بۆ یەکەم جار سەرۆکوەزیرانی تورکیا، ڕەجەب تەیب ئەردۆگان دانی بە "کێشەی کورد"دا ناو گوتی؛ کە تورکیا باوەڕی بەخۆی هەیە و بە جورئەت و دیموکراتیانە بەرەنگاری ئەم کێشەیە دەبێتەوە هەروەها وڵاتەکەی ڕێگە بە تیرۆریستان نادات ئەم کێشەیە بۆ بەرژەوەندی خۆیان بقۆزنەوە. ئەمەش لەو داخۆزیانییەدا هات کە ئاژانسی دەنگوباسی ئەنادۆڵ گواستییەوە؛ کاتێک ئەردۆگان پێشوازی ژمارەیەک لە ڕۆشنبیران و نووسەران و ڕۆژنامەنووسان و پارێزەرانی مافی مرۆڤی کورد کرد، پەیمانیشی دا کە کەشێکی برایانە بخوڵقێنێ کورد و تورک لێک نزیک بکاتەوە هەروەها گوتی؛ بۆ یارمەتیدانی کەمایەتی کورد چاکسازی دیموکراتی دەکەین. ئەردۆگان دانیشی بەو هەڵە سیاسیانەدا نا کە لە سەردەمی پێشوودا دەربارەی دۆزی کورد هەبوون و ئینکاریان کردووە، بە پێویستی زانی کە ئەو کێشەیە واتە کێشەی کورد لە چواچێوەی پرەنسیپەکانی کۆماری و سیستەمی دەستوریدا چارەسەر بکرێت.■■■

دێڕەی ڕاپەڕینەکانی ڕۆژهەلات....

و ئازادکردنی بێ قەیدی گیراوەکان و قەرەبووکردنەوەی زیان لێکەوتووەکانە. کە ئەمانە لایەنی هەرەکەمی داواکارییەکانن، مرۆ لە وڵاتێکی ئازاد و دیموکراتدا لە ڕێگەی تەلەفزیۆنێک دەتوانێت دابینیان بکات. دەرهێنجامی دووەمیشیان نسکۆ پێهێنان و دێڕەی پێدانی کاری سەرکوتکەرانەی ڕژێمە. بە داخەوە کورد لە سەرجەم سەردەمەکاندا بە هۆی لاوازی سەرکردایەتی و دەرهنگ بۆ خۆکەوتنی لایەنەکان لایەنی دووەمی دەرهنجامە کانی بەرکەوتووە. ئومێد دەکەم چۆن گۆڕان لە هەلومەرجەکان و سەردەمەکە رویداوە، ئەواهاش دەرهنجامی نوێ و سە ردەمانەمان چنگ بکەوێت و لە سایەیدا بتوانین بەشێک لە مافە بنەڕەتییە کان لە باری مافی مرۆڤ و دیموکراتی و ئازادی دابین بکەین. ڕاستە ناتوانین بەقەد سەردەمەکانی ڕابردوو ڕەشبین بین، بەڵام هێشتا ئەگەر و ئاریشەی زۆریشمان هەن، تاکو نەهێڵن بە تەواوی لە بەرامبەر دەرهنجامەکاندا بەرچاو ڕوون بین. ■■■



"کچی بەڕێوەبەری سێرک" لە دانیمارکیەوە بۆ کوردی وەرگێڕدرا

PNA ـ ڕۆمانی "کچی بەڕێوەبەری سێرک"، کە لەنووسینی "یۆستاین گاردەر"ە "بەهرۆز حەسەن" لە دانیمارکیەوە بۆ زمانی کوردی وەریگێڕاوە: ئەم کتێبە لە ٢١٥ لاپەڕەی قەبارە گەورە پێکهاتووە لە بڵاوکردنەوە دەزگای (نەوا)یە . شایانی باسە نووسەری ئەم کتێبە خاوەنە ڕۆمانە بەناوبانگەکەی (جیهانی سۆفیا)یە. ■■■

پرسی بارمتەکردن و پێگەی کورد لەو نێوەندەدا..

خوێندنەوەیەکی کۆمەڵایەتی بۆ پرسی بارمتەکردن و ڕفاندن و دواتر ئازادکردنی تاک بەرامبەر بڕە پارەیەکی زۆر، لەڕوانگەی بەسەرهاتی کوردێکەوە.


لە هەفتەنامەی (ژاری کرمانجی) وەرگیراوە

بەدواداچوونی:
پەیامی کورد- لاپەرەی کۆمەڵ

ڕوانینی کۆمەڵایەتی بۆ هەر ڕووداوێکی سیاسی بێ، دواجار دەبێتە هۆکاری ئاشنابوونمان بە نەریتێک کە مەترسیدارە لەسەر کۆمەڵ. لەم ڕوانگەیەشەوە ئامانجی بۆ پرسی بارمتەکردن و ڕفاندن دەکەین کە دواتر بەرامبەر بڕە پارەیەکی زۆر و خەیاڵی، ئازاد دەکرێن.

ئەمە بۆتە نەریتێک و لە زۆر لەو جۆلانەوانەدا مومارەسە دەکرێت کە ناویان لەخۆیان ناوە حەرەکەی موقاوەمە و زۆریان لەژێر ناوی جیهاد و ئەنسار سوننە و ئیسلام و هەروەها بەگشتی جۆلانەوەی سیاسی دیکە، ئەو شتانە دەکەن و جۆرێک لە بازرگانی بە گیانی خەڵکەوە دەکەن، کە زۆر جار و لە زۆر ڕووداودا پۆلیسی عێراقی هاوکاری کردوون و ڕۆڵیان هەبووە لە ڕفاندنی ئەو جۆرە کەسانەدا، کە تەسلیم بەوانیان کردوون، یان بە پارەیەکی کەم بە باندە تیرۆریستەکانیان فرۆشتوون.

ئەگەر چی ئەم ڕووداوانە زیاتر لە ناوچەکانی خواروی عێراقن و وەک پێگەی جوگرافی دوورن لە کوردستانەوە، بەڵام کاریگەری خۆی لەسەر کوردستان و کۆمەڵگەی کوردی هەبووە، جا لەڕێگەی ڕۆیشتنی خەڵکانێکی کوردەوە بێت بۆ ناوچەکانی خوار و ناوەڕاستی عێراق کە زۆر جار لێیان بارمتە کراوە و زۆریان لێ کوژراوە و هەندێکیشیان بە پارەی زۆر ئازادکراون، یان لە ڕێگەی مومارەسەکردنی ئەو شێوازەوە بێت لە خودی کوردستان، کە دەکرێت لەم سۆنگەیەشەوە ئامانجی بۆ ڕفاندنی منداڵێکی تەمەن سیازدە ساڵان بەناوی (هۆزان) بکەین، کە کوڕی یەک لە دەوڵەمەندەکانی شاری هەولێر بوو، لە لایەن باندێکەوە ڕفێنرا و داوای یەک ملیۆن دۆلار کرا بۆ ئازاد کردنی، کە دواجار ئاشکرابوو، وە بووە هۆکاری دەسگیرکردنی باندەکەش کە باندی تیرۆریستی ناسراو بە (شێخ زانا) بوو.

بۆیە هەر لێرەوە دەکرێت باس لە مەترسیەکە بکەین کە ڕەنگە کاریگەری لەسەر کۆمەڵگەی کوردی هەبێت. خۆ ئەگەر ڕاستەوخۆ نەیبێت، ئەوا سەرەتایەکە بۆ دروستبوونی شەریکی کۆمەڵایەتی.

لەم چوارچێوەیەشدا ڕووداوێک لەزاری کەسێکەوە باس دەکەین کە کەوتۆتە بۆسەی یەک لەو باندانەوە و لەگەڵ هاوڕێکەی دەسگیر کراوە و دواتر لەبەرامبەر بڕی ٣٧ هەزار دۆلاردا ئازاد کراوە. ئەگەر چی ئەم کەسە ژیانێکی پڕ تراژیدی و نامۆ دەگێڕێتەوە، کە ڕزگاربوون لێی وەک دەسپێکی سەرەتای ژیانە، بەڵام ڕووداوەکان هیچ کاتێک لە بیرکردنەوە و لە هزریدا دەرناچن و تا ئاستێک کاریگەری لەسەر لایەنی دەروونی هەیە و وەک گرێیەکی دەروونی تێیدا ماوەتەوە.

وەک لە گێڕانەوەکانیدا خستیە ڕوو ئەم هاوڵاتیە کە ناوی (ستار محەمەد)ە و دانیشتووی (سۆران)ە لەگەڵ کەسێکی خزمی بەناوی (میرخان قاسم) خەریکی کاسبین و کاری ئازاد دەکەن. جۆری کارەکەشیان وای کردووە کە هاتۆچۆ بۆ ناوچەکانی خوارو وە ناوەڕاستی عێراق بکەن، لەم مامەڵانەشدا بڕە پارەیەکیان دەکەوێتە لای دۆستێکیان لە شاری نەجەفی خواروی عێراق و دەچن بۆ وەرگرتنەوەی پارەکە و لە گەڕانەوەیاندا لەناوچەی عوزێم، لە لایەن گروپێکی تیرۆریستی بەناوی گروپی (جیهادی ئیسلامی) دەسگیر دەکرێن و دوای ئازار و ئەشکەنجەدانێکی زۆر (ستار) لای خۆیان دەهێڵنەوە و (میرخان قاسم)یش دەنێرنەوە بەمەبەستی ئامادە کردنی ئەو بڕە پارەیەی بۆ مەرجی ئازادکردنی (ستار محەمەد) دایانناوە، کە ئەگەر نا کۆتایی هێنان بە ژیان، چارەنووسی ستار دەبێت. ئەوەبوو دوای ماوەیەک بە بڕی (٣٧٠٠٠) دۆلار (ستار محەمەد) ئازاد کرا. دیارە گێڕانەوەی ڕووداوەکان هەروا بە سادەیی نییە و وەک لە چاوپێکەوتنێکی هەفتەنامەی زاری کرمانجیدا باسی کردووە، دەڵێت :"لە کاتی هاتنەوە و لە ڕێگا تووشی دوو ڕووداو هاتین، ڕووداوی یەکەم لەناوچەی لەتیفیەی شاری بەغدا و، نزیکەی کاتژمێر و نیوێک ڕێگا داخرابوو، وە گیرمان خوارد بەدەست تیرۆریستان، ڕووداوی دووەمیش کاتێک لە بەغدا کەوتینە ڕێ بۆ خالیس و لەوێش بۆ دووزخورماتو نزیکەی کاتژمێر دووی نیوەڕۆ، ئۆتۆمبێلەکەمان بەخێرایی (١٨٠ کیلۆمەتر لە کاتژمێرێکدا) لێدەخوورێ و و هەستمان نەکرد کەمێنێک هەبێت، کاتێک گەیشتینە ناحیەی عوزێم پردێکی کۆن لەسەر ڕێگا بوو، ئەوکات میرخان ئۆتۆمبێلەکەی لێ دەخوڕی و



ئۆتۆمبێلەکەی من ڕۆیشتن و بەرەو دەشتی ناحیەی عوزێم بردیانین و زۆر ئەشکەنجەیان داین و کە ناسنامەکەیان بینیم هی سەندیکا بوو، وە وشەی جنرالی لەسەر بوو، ئەوان بە ئەفسەری کوردی تێم گەیشتن و زیاتر ئەشکەنجەیان دام و و نزیکەی دوو کاتژمێری دیکە لێیان داین"..

ناوبراو هەروەها بەردەوامی بە گێڕانەوەکانی دەدات و لایەنێکی تراژیدی ئەو ساتانەی ژیانی نیشان دەدات و هەروەها چەند ئاماژەیەکی خستە ڕوو کە بەمەبەستی دانپێدانان لێیان دەدەن و دەڵێت:" لەدوای ئەمانە ئێمە هەر دووپاتمان کردەوە کە کاسبین و فەقیرین و بە هیچ لایەنێکەوە وابەست نین و ئێتر دوایی ئەوان داوای ژمارەی تەلەفۆنی کەسوکارمانیان کرد بەمەستی ئاگادارکردنەوە لە کوشتنمان، ئێمەش پێمان گوتن تەلەفۆنی ئێمە کۆڕەکە و ئاسیامان نییە، ئەوانیش زۆر خەریک بوون، پەیوەندیەکەیان پێ وەرنەدەگیرا. لەم کاتانەشدا هەر هۆتافی دژی ئێمەیان دەگوت و لەگەڵ ئیهانەدا بە زمانی عەرەبی دەیانگوت (بژی بەعس و بڕوخێ کوردستان)". ناوبراو هەروەها دەڵێت:" دواتر ئێمە پێمان گوتن ئەگەر هەردووکمان دەکوژن ئێمە دەسەڵاتمان نیە، ئەگەر مەبەستیشتان پارەیە یەکێکمان ئازاد بکەن، بابچێت لە نێو خزم و کەسوکارمان پارەتان بۆ بێنێت، ئەوانیش سەرەتا گوتیان بە ١٥٠٠٠٠دۆلار ئازادتان دەکەین، بەڵام ئێمە گوتمان بشمان کوژن ئەو پارەیەمان بۆ پەیدا ناکرێت، دواتر گوتیان ٨٠٠٠٠ دۆلار، ئێمەش هەر گوتمان پێمان پەیدا ناکرێت، دواییں جار داوای ٣٧٠٠٠ دۆلاریا کرد".

ناوبراو لەچاوپێکەوتنە ڕۆژنامەوانیەکەیدا هەروەها دەڕۆژە بە گوتەکانی دەدات و دەڵێت :" ئەوگروپە کە ناوی خۆی نابوو جیهادی ئیسلام لەکزنە بەعسی و جەردە زیاتر نەبوون، شێوەی ئەشکەنجەدانەکانیشیان بەگوێرەی سروشتی جوگرافی ناوچەکە بوو کە بیابانە و پلەی گەرمای بەرزە، ڕۆژانە بە پێخاوسی نزیکەی ٥ تا ٦ کاتژمێر بە پێخاوسی لەبەر هەتاو دایاندەناین. وەک دیارە هەموو پێکام سووتاوە، ڕۆژانەش تەنها یەک پارچە نانیان پێدەدایین ئەویش زۆر سوێر بوو، ئاوەکەش زۆر گەرم بوو ئەترسام گۆرچیلەکانم وشک بن. ناوەناوەش سوکایەتی پێکردن و لێدان بەردەوام بوو. بەیانیەک پێیان گوتم پارەکەیان هێناوە و تۆ ئازاد دەکرێیت، ئەتبەین بۆ سەر شەقامی تەلل و لەوێ تۆ چاوت ناکەیتەوە تا کو دوای چارەکەکێک . پاش چارەکێک من چاوی خۆم کردەوە و نەمتوانی بە پێوە بوەستم، خۆم خستە سەرچۆک، ئەوکاتە بەرامبەرم ئۆتۆمبێلێکی کرۆلای ڕەساسی ژمارە فەحسی سەلاحەدین هۆرنێک و دوو فوللایتی لێدا و لای من وەستەتا، ئینجا بابەزی و پێی گوتم تۆ فلانکەسی؟ منیش گوتم بەڵێ.. ماچی کردم و گوتی ئێتر مەترسە تۆ گیشتیتە ئەمان".

ناوبراو زیاتر ئاماژە بە ساتە ناخۆشەکانی ژیانی دەکات و هەروەها زۆر بەگەرمیش سوپاسی خەڵکی سۆران و کەسوکار و هاوڕێیانی دەکات کە هاوکارییان کردووە لە کۆکردنەوەی ئەو بڕەپارەیەدا و هەروەها داوا لە حکومەتی هەرێمیش دەکات هاوکاری بکات


ئەم دیمەنە و ڕفاندن و بارمتەکردن، خەریکە دەبێتە بەشێک لە کلتووری نوێی عێراق.....

لە کەمکردنەوەی ئەرکەکانی لەگەڕاندنەوەی بڕەپارەکان بۆ ئەو کەسانەی یارمەتیان داوە بۆ کۆکردنەوەی ئەو ٣٧ هەزار دۆلارەی لەبەرامبەر ژیانیدا داویانە بە تیرۆریستان.

ئەمە ڕووداوێکە و زیاتر لە لێکدانەوەیەک هەڵدەکرێت، خۆ ئەگەر بەجۆری ئەم ڕووداوانەدا و بەچەندسالّی ڕابردوودا بچینەوە، دەردەکەوێت کە ئەو جۆرە ڕفاندنە چۆن سەرچاوەی گرت، سەرەتا ڕفاندنی سەربازی ئەمریکی و کەسایەتیە دیبلۆماسیەکان ئامانج بوون و گروپی زەرقاوی سەرۆکایەتی ئەم جۆرەکارانە و ئەو باندانەیان دەکرد، بەڵام دواتر کەسانی ئازادیخوازی ناوچەکەی گرتەوە و هەروەها ڕفاندن و کوشتنی کورد و خەڵکی هەرێمی کوردستان بووە ئامانجی سەرەکی هەروەک چۆن چەندین ڕووداوی لەم جۆرە هەیە و ئەمە یەکێکە لەوان و هەروەها گرتن و سەربڕینی سێ گەنجی کوردی خەڵکی زاخۆ یەک لەو ڕووداوانە نیشان دەدات. دواتر ئەم جۆرە کارە بووە کارێکی بازرگانی و ئێستا حاڵەتێکی ئاسایی وەرگرتوە و چەندین گروپی لەوجۆرە هەیە و تەنانەت زۆر لە نێوندە حکومیەکانیش لەخواروی عێراق ئاگادارن و هەندێک جاریش هاوکاریانن. بۆیە ئەمەش کە بووەتە دیاردەیەکی کۆمەڵایەتی زیاتر لایەنی مەترسیدار نیشان دەدات و زۆر بەدواداچونیش ئاماژەیان بۆ ئەوە کردووە کە لە ناوچەکانی وەک بەغدا و موسڵ و شارەکانی دیکەی باشوری عێراق و هەروەها تەنانەت لە شوێنێکی وەک کەرکوکیش ئەم باندانە دەڵێیان هەیە و هاوکاری ئەو باندانە دەکەن لە دۆزینەی ئەو جۆرە کەسانەی سیاسین، یان بازرگانن یان دەوڵەمەندن، کە لەم ڕێگەیەوە پارەیان پێ پەیدادەکرێت و چەندین جار دەفرۆشرێن و ئەمدەستاودەستیان پێ دەکرێت. ئەمەش لەگەڵ ئەوەی ڕووداوێکی مەترسیدارە لەڕووی سیاسیەوە، هاوکات کاریگەری کۆمەڵایەتیشی هەیە و دەکرێت بڵێین ڕۆژ ڕوو لە فراوانی دەکات. گرفتەکەش لەوەوە سەرچاوە دەگرێت هیچ دەزگایەک لەڕووی کۆمەڵایەتی و



تەنانەت ئەمنیشەوە وەک پێویست کاریان بۆ نەکردووە و زۆر لە پرسە سیاسیەکان بۆتە هۆکاری ئەوەی ئەم لایەنە فەرامۆش بکرێت.

■■■

راپەڕینەکانی ڕۆژهەڵاتی کوردستان لە نێوان هۆکارو ئەنجامدا

غازی حەسەن - ئەمریکا

وەکو هەمیشە هۆکارەکانی زوڵم و زۆری کوردیان ئامادە باش کردووە بۆ ئەوەی لە هەر دەرفەتێکی گونجاودا ڕاپەڕینی میللی و هەروەها بزاڤی سیاسی و کۆمەڵایە تی و فەرهەنگی ڕاپەڕێنن. کورد لە پێناو تەنیا ئازادیدا ڕاپەڕیوەو دوژمنە داگیرکەرەکانیشی لە پێناو پتر و پتر بە کۆیلەکردنی کۆمەڵگاو ژێردەستەکردنی پتری کوردستان پەنا وەبەر زەبر وزەنگ و سەرکوت دەبەن.

ڕاپەڕنەکانی ڕۆژهەڵاتی کوردستان میژوویەکی لە پێشینەیان هەیە و خۆراگری گەلی کوردیش لەم بەشە بە زۆر لکێنراوەی بە ئێراندا بەڵگە ی گەشتربوونی ئەو پێنگاڤانەیە کە ڕ بۆ ئازادی دەنرێت.

ڕووداوەکان ڕاپەڕیون یاخود سەرکوتکراوەکانن بۆ ئازادی ڕاپەڕیون

دوای ڕوودانی ترسناکی شەهیدکردنی شوانەی سەید قادری خەڵکی هەمیشە خۆراگری مەهاباد بیدەنگیان تەقاندەوە و بۆ جارێکی تریش بەرسینگی زوڵم وزۆریان بە ڕاپەڕین و ناڕەزایی دەست پێکرد. هاوکات دەگەڵ خەڵکی وەچنگ هاتوی مەهاباد شار و شارە دێیەکانی تریش دەستیان بە ناڕەزایی دەربڕین و ڕێپێوان و مانگرتن و داخستنی دوکان و بازاڕ و فرۆشگاکانیان کردووە. ڕاپەڕینی ڕۆژهەڵات بە شێوەیەکی سەرەکی لە مەهاباد و سنە و سەقز و مەریوان و سەردەشت و بانە و پیرانشار و بۆکان هەندێک شوێنی تر بەڕێوە دەچێت. ڕاپەڕینەکانی خەڵک لە شێوەی ناڕەزایی و داخستنی دوکان و بازاڕ و نەچوونە سەرکاری دەوڵەتی و ڕێپێوان و بەرزکردنەوەی داواکاری دریژەی هەیە. بێگومان گەلێک لە ڕوانگەی ڕووداوەکانەوە سەیری ڕاپەڕین و سەرهەڵدانی ڕۆژهەڵاتی کوردستان دەکەن، دیارە ڕووداوەکان تە نیا هۆکارن، ئەگەرنا ئەوە خەڵکی زۆرلێکراوی کوردستانە بۆ دەستهێنانی مافەکانیان دریژە بە خەبات لە پێناو ئازادی دەدەن. ئەوە خەڵکی سەرکوتکراوە ڕووداوەکان لە قازانجی بزاڤێکی بەرفەرتر بەکار دەهێنن. هاوکات لەگەڵ بەرەنگار بوونەوەی داموودەزگا سەرکوتکەرەکانی کۆماری ئیسلامی ئێرانی خەڵکی کوردستان یادی تیرۆر و لە دەستچوونی سەرکردەی لێهاتوو د. عە بدرەحمان قاسملۆش دەکەنەوە، کە تێکەڵ دەگەڵ کات و ساتی ڕاپەڕینەکانی ئەم دواییەی کوردستان. بۆیە ئەوەی ڕوودەدات ئەنجامی ئەو زۆرلێکردنە لە میژینەیە کە دژی کورد پیادە دەکرێت. ڕووداوەکانیش هۆکارن بۆ ئەوەی خەلک چاکتر و بەرفەرتر لە جاران بیر لە ڕێگاکانی وەدەست خستنی ئازادی بکەنەوە.

شێوازی سەردەمانە و کاریگەری گۆڕانکارییەکانی دەڤەرەکە

لە ئەنجامی هەژمارە گەلێک گۆڕانکاری لە دەڤەرەکە و جیهاندا کورد تمێ پەنا وەبەر ئەڤ شێواز و ڕێبازانە دەبەن کە مۆلکی سەردەمانەیان هەیە. ڕاپەڕین و ڕێپێوان و بەرزکردنەوەی دروشمی ئاشتەوایانە لە پێناو ڕاگرتنی شێوازی هۆڤیانەی داموودەزگا سەرکوتکەرەکانی کۆماری ئیسلامی هاوشێوازو کاریگەر دەبێت دەگەڵ سەردەمەکە. لە ئاڵەکی دنیشدا گۆڕانکارییەکانی دەڤەرەکە بە تایبەتیش داروخانی ڕژێمی بەعس و لە زیندان ئاخنینی سەدام و هاوکارەکانی کاریگەری زۆریان لە سەر سەرجەم دەوڵەت و پێکهاتە جیاکانی ناوچەکە بە تایبەتیش کورد دروست کردووە کە ساڵەهلیە لە پێناو ئازادی دریژە بە خەبات دەدات. نابێت ژبیر بکەین ڕاپەڕینە کانی کوردان لە ڕۆژئاوای کوردستان کاریگەریەکی تری لە نێو ئەلتەرناتیف و ڕووداوە پڕزەتیڤەکان جێهێشتووە. وەکو گەلێک بیرمەند دەیڤن هەنگاوەکانی باشوری کوردستان بۆتە هۆکاری کاراو کاریگەر بۆ پتر بە خۆکەوتنی بەشەکانی تر کوردستان. لە ڕاستیشدا ئەم لێکدانەوەیە ڕوێکی ڕاستی هەیە. هەرچەندە نابێت لە بیرمان بچێت بزاڤی سیاسی کوردان لە ڕۆژهەڵاتدا لە بەر خاتری کەمکردنەوەی پاڵەپەستۆ و دەستێوەردانی داگیرکەران چالاکییەکانیان لە دڕی دەسەڵاتی ناوەندی ڕاگرت، بەمەش پێگەی متمانە و گەشەکردنی باشوریان بە هێز و جوڵانەوەی شۆڕشگێڕی چەکدارانە یان لە ڕۆژهەڵاتی کوردستاندا دوچاری پاشەکشە و خاوکردنەوە کرد و بەشێکی زۆری کادر و تێکۆشەرانی ئەم لایەنانە بە تایبەتیش حیزبی دیموکراتی کوردستانی ئێران بە ناچاری ڕێگەی تاراوگەیان گرتەبەر، یاخود لە ناوچە ڕزگارکراوەکانی باشوری کوردستان لە ژێر پەلاماری تیرۆریستیانەی کۆماری ئیسلامی ئێران گوزەران دەکەن. دیارە لەم پێودانگەدا بۆمان دەردەکەوێت لایەنە سیاسییەکان لە دەرەنجامی سیاسەت و ستراتیژیکی نەتەوەیانە لە پێناو سەرخستنی ئەزمونی باشور، تێکۆشانی ڕۆژهەڵاتیان دوچاری وەستان و خاوکردنەوە کرد. ئەمەڕی بەهۆکارێکی سلبی لە سەر پتر و کاراتر بوونی ڕاپەڕینەکانی ئێستای خەڵکی ناڕازیی لە کوردستاندا تەواو دەبێت. کورد بە پەنابردنەبەر شێوازی سەردەمانە دەتوانێت ڕێگاکانی تێکۆشان کورتر بکاتەوە و چاکتریش بێ ئازاردانی بەشەکانی تر ئامانجەکان بە دەست بهێنن.

ڕاپەڕینێکی سەرتاسەری لە یەک کات و سەردەمدا

پێم وایە ئەو زۆردارییە مەترسیدارانەی لە میژوو لە کورد کراوە و ئێجا لە لایەکی تر دابەشکردنی کوردستان و هەماهەنگی داگیرکەرەکانی کوردستان لە ئەنقەرە و تاران و دیمەشق و بەغدا لە دڕی کورد، هۆکاری سەرەکین بۆ ئەوەی کورد لە یەک ڕوانگەی نەتەوەیی ڕاپەڕن و شۆڕش بکەن. وەلێ گەلێک دڕوارە بێڕین کورد دەتوانێت ڕاپەڕینێکی سەرتاسەری لە سەرجەم بەشەکانی کوردستاندا لە یەک دەبینرێت هەلایسانی ئەو گرکانەیە کە ساڵانێکی دریژە خامۆش دەکرێت، ئەوەی ئێستا دەبینرێت لە جۆرە ستراتیژیکی کوردستانی و سەرتاسەری دەچێت، کە خودی جەماوەر بڕیاریان لێداوە نەک سەرکردە و لایەنە سیاسییەکان. واتە لە دەرەنجامدا بە هۆی جۆرێک لە لێکدابڕانی سەرکردایەتی و خەڵک ڕاپەڕینەکان ناتوانن سەرتاسەرییەتی خۆیان بپارێزن و لە هەمان کاتیشدا کارێکی دژوارە کورد هاوەدەنگ لە یەک کات و سەردەمدا دریژە بەو ستراتیژە بدەن کە ئستا کوردستانی تەنیوەتەوە و لە زۆربەی کوردستانی هەلو مەرجێکی نوێ هاتۆتە ئاراوە، واتا بزاڤ و ڕاپەڕینێکی سەرتاسەری پیادە بکەن. چونکە لە نێو خودی بەشێکی دیاریکراودا نەتوانراوە ڕاپەڕین و وەدەست هاتنێکی سەراتاسەری و یەکانگیر پێک بهێنرێت و سەرجەم شار و شارەدێکانی کوردستان دەست بە مانگرتن و ڕاپەڕین و دەرپەڕاندنی داگیرکەران بکەن، چ جای لە سەرتاسەری کوردستانی مەزندا. ئەگەر ئەمەش نەبێت دوژمن لە ناوچەیەک بەهێز دەبێت لە دەڤەرێکیشدا لە پاشەکشە دەبێت. من پێم وایە سەرهەڵدان و دەست بەکاربوونی کوردان بەش دوای بەش خێراتر ئامانجەکان دەست دەخات و هەروەها دەتوانرێت چاکترو سەرکەوتوانەترێش بەرەڤانی لە دەسکەوتەکان بکرێت. من وای دەبینم زەمینەی ڕاپەڕینی سەرتاپاگیری لە تەنیا بە شێکاکاتی هاتووە، دەتوانرێت هاوکاری و پشتیوانی کوردانیش لە پێناو ئەم بەشە دا زۆرتر و کاراتر بێت. وەلێ کارێکی گەلێک قورسە کورد تێکڕا بتوانن لە یەک کات و سەردەمدا لە سەرجەم کوردستانی مەزندا ڕاپەڕن و ئەو وڵاتە دروست بکەنەوە، کە چەند سەدەیە داگیرو دابەش کراوە.

یەکبوونی ڕاپەڕین پێش نسکۆ هێنان

یەکێک لە هۆکارە نەگەتیڤەکانی نێو بزاڤی سیاسی کوردستان لێکترازانی ریزەکان و خۆخۆری و دوبەرەکی نێوەخۆییە. ئەگەر



دیقەت بدەین و لێنێڕین ڕاپەڕینەکانی ئێستای کوردستانیش لەم کێشەیە دوور نییە. خەڵک دەتوانن یەکریز و تەبا ڕاپەڕن و ببنە نمونەیەکی بەرچاو بۆ لایەنە سیاسییەکان بەڵام لایەنە سیاسییەکان بەهۆی زاڵی بیری ئایدیۆلۆژی حیزبانە و خۆسەپێنی تاکرەوانە و یانڕی خۆنیشاندان بە شۆڕشگێڕی پرۆفیکێت و تەواو بااڵ، نەیانتوانیوە ئەم هەماهەنگی و یەکڕیزییە دروست بکەن کە دەبێتە مایەی پێکهێنانێ جوڵانەوەیەکی سەراتسەری لە ڕۆژهەڵاتی کوردستاندا. بۆیە پێش نسکۆ پێهێنانی ئەم ڕاپەڕینانە پێویستە هەلومەرجەکان مردار نەکرێتەوە و نەهێڵدرێت گیانی هەڵایساوی خەلک و قوربانییەکان هەروا بە فیڕۆ بچن. لەم پێودانگەشدا پێویستە چەند هەنگاوێکی گرینگ لە پێناو ڕێکخراوترکردنی ڕاپەڕینی خۆرسکانەی دوور لە سەرکردایەتی کردن بهاوێژرێت، هەرچە ندە پێنگافە کان دەرەنگن، بەڵام دوور نییە کارمایەی لایەنەکان بتوانێت هەندەک لە ئازار و مەترسییەکانی پێش نسکۆ کەم بکەنەوە. بەداخەوە هەر لە ئێستاوە باس لە نسکۆ دەکەم، چونکە دەرسەکانی ڕابردوو ئەوەیان فێرکردووین ڕاپەڕینە خۆرسکەکان بە خێرای هەڵچوونیان دادەمرکێنرێتەوە وەو لە دیماهیشدا گە لە لایە نە ک لێی کۆدبنەوە وە بۆ ئەوەی لێکدانەوەی سیاسی و میژوویی و خۆبەشی لە مەڕ بکەن. دیارە ئەگەر یەکبوونێکی پتەو لە پێناو پاراستنی ریزەکانی خەڵکی ڕاپەڕیوو نەهێنرێتە کایە وە، نسکۆ چاوەڕوانمان دەکات وەکو چۆن لە ڕابردوودا کەڵکمان لە هەلومەرجەکان وەرنەگرت و کۆمار و شۆڕش و دەسکەوتەکانمان بوونە خۆڵەمێشی دوای ئاگرێکی کۆتا نەهاتوو.

یەکەم : لایەنە سیاسییەکانی کوردستان سەرکردایەتییەکی یەکگرتوو لە پێناو ڕاستەوخۆ ئاراستەکردنی ڕاپەڕیەکانی ڕۆژهەڵات پێکبهێنن. کات درەنگە بێژین بەرەیەکی کوردستانی ڕابگەیەنن، بەڵام دەکرێت بۆ بەرهەمدارکردنی ڕاپەڕینەکان و دڕێژەپێدانی جوڵانەوەی سیاسی و کۆمەڵایەتی یەکریزی سیاسی و تەبایی لایەنە کان ببێتە هۆکاری سەرەکی لە پێناو دەسخستنی ئەو ئامانجانەی خەڵک لە پێناویان قوربانی دەدات. دووەم: هەماهەنگی و لێکگە یشتنێکی واقیعیانە بۆ هاوکاری و بەتەنگەوە هاتنی یەکتر لە نێوان بەشەکانی کوردستاندا لە ئاستی ناوەخۆیی و دەرەکی پێکبهێنرێت. ئەم جۆرە بیدەنگییە کۆتایی پێبهێنرێت کە هەنوکە لە نێوان بەشەکاندا لە ئارادایە. چونکە ئەگەر نەتوانرێت هاودەنگی و هەماهەنگی لە پێناو بەشێکی ڕاپەڕیودا دروست بکرێت، چۆن دەتوانین لە پێناو هەموو پارچەکاندا لە یەک کات و سەردەمدا هاوکاری یەکتر بین.

سێیەم : ڕاگەیاندنی کوردی بەشێکی زۆری ئەرکەکانی لە پێناو هوشیاری هێنانەگۆڕێی هاوکاری و یەکریزی فەرامۆش کردووە، نەیتوانیوە بەشداری لەو ڕاپەڕینانە بکات کە ئێستا لە ڕۆژهەڵاتی کوردستاندا لە ئارایە. ڕەنگە لێکدانەوەکان بەوڵایەدا دەبرێن گوایە ئێرانی هاوپەیمانی شیعەکانی عێراق و دوژمنی کورد دەتوانێت هاوکاری و هاودەنگی هەنوکەیی لە پێناو بەرفەترکردنی ڕاپەڕینەکانی ڕۆژهەڵاتی لە دڕی کوردان لە باشوری کوردستان بە سلبی بەکاربهێنێت و بەمەش لەم بەشەشدا دەسکەوتەکان دوچاری پاشە کشە پێکردن دەکرێن. دیارە ئەم بۆچوونە لە ڕووی دیبلۆماسییەوە ڕاستییەکی حاشاهەڵنەگری لە خۆگرتووە، بەڵام لە ڕووی زەمونووە و بەهۆی فشاری ئەمەریکا و ئەورووپا لە سەر ئێران کارێکی قورسە ئێران بتوانێت ئەم ڕۆڵە سلبییە کاریگەرە بگێڕیت کە ڕاگەیاندنی کوردی بەتایبەتیش ڕاگەیاندنی باشور لێی دەترسێت.

چوارەم: پێویستە ڕاپەڕینی خۆرسکانەی خەڵک کە لە شەهیدکردن و سووکایەتی پێکردنی شوانەی سەید قادری دەستی پێکردۆتەوە و هەروەسا بەشێکە لەو زنجیرە ڕاپەڕین و ناڕەزاییانەی کورد لە دڕی داموودەزگای سەرکوتکەرانەی کۆماری ئیسلامی ئێران دەستی داوەتێ. بۆ ڕاپەڕینێکی ئاراستەکراوی ڕێکخراوی سەرتاسەری لە ڕۆژهەڵاتی کوردستاندا بگۆڕدرێت.

پێنجەم : کار بۆ سەرنجراکێشانی ڕای گشتی نێودەوڵەتی و داموودەزگا نێودەوڵەتییەکان بکرێت. هەروەها کاری لێبڕوانە بۆ وەئاگا هێنانی کۆمەڵگای نێودەوڵەتی و سەرنجی میدیای ڕۆژئاوایی بۆلای ڕووداوە ترسناکە بەردەوامەکانی کۆماری ئیسلامی کێش بکرێت . پێشێلییەکانی مافی مرۆڤ لە قاو بدرێن و دروشمەکانی کورد و ڕای گشتی و بۆچوونەکان یەکانگیرو تەبابن.

پێویستە بەر لە ڕوودانی هەرکارەساتێک بیر لەو دەرەنجامانە بکەینەوە کە دوچارمان دێن. بێگومان هەر ڕاپەڕینێک دوو ئەنجامی لەپێشە. یان بەدەستهێنانی دەسکەوت و جێبەجێکردنی داواکارییەکانی لێدەکەوێتەوە، کە داواکارییەکانی کورد لە کاتی ئێستادا تەنیا دادگایی تاوانباران **بۆ لاپەڕەی ٥**

چل ملیۆن کورد چاوەڕوانی ڕاگەیاندنی دەوڵەتی کوردستانن



نزار جاف ـ شەپۆلی خۆپیشاندانە جەماوەرییە فراوانەکانی شارەکانی سلێمانی و هەولێر و دهۆک و کەرکوک، سەبارەت بە داواکرنی سەربەخۆیی بۆ کوردستان، نامەیەکی کراوە و ڕوون و ئاشکرایە کە داخوازی کورد بە بێ چەند و چۆن دەخاتەڕوو. هەڵبەتە گۆڕانکارییە خێراکانی ئەم دواییە و، ئەو کۆمەڵە پێشهاتە سیاسییانەی کە لە ناوچەکە و جیهاندا هاتنە ئاراوە، جارێکی تر گرنگی ڕۆڵی کوردی لە هاوسەنگی هاوکێشە سیاسییەکانی ناوچەکە و جیهان بەرجەستەکردەوە. ویلایەتە یەکگرتوەکانی ئەمریکا کە سەرگەرمی جەنگێکی سەخت و بێ وچانی دژی تیرۆرە، بە جوانی بۆی ڕوون بۆتەوە کە بەردەوامبوونی ئەو شەڕە پێویستی بە چەندین بنکەی باوەڕپێکراو هەیە تا پشتی پێ ببەستێتەوە. گومان لەوەشدا نییە کە ئەم بنکانەش هەندێکیان تەکتیکی دەبن و هەندێکیشیان ئیستراتیجی دەبن. ئەوەی کە زۆرینەی ناوەندە سیاسییەکانی واشینگتۆن جەختیان لەسەر کردۆتەوە، ئەوەیە کە ئەمریکا "بەپێی بڕچوونی زۆربەی چاودێران" ناچارە لەم شەڕە سەختەدا پشت بە کورد ببەستێت، چونکە بۆ گەل و سوپا و سیاسەتمەدارانی ئەمریکا دەرکەوت، گەلی کورد تەنها گەلێکی ناوچەکەیە کە بە ئاشکرا پێشوازی لە هەموو هەوڵ و تەقەللاکانی ئەمریکا دەکات سەبارەت بە جەنگی دژە تیرۆر، سەرەڕای ئەوەی کە تەنیا گەلی ناوچەکەش بوو کە بەو گەرمی و گوڕییەوە پێشوازی لە سوپای ئەمریکا بکات. لێرەشدا و، بە هۆی هەستیاری دۆزی کورد لەلای وڵاتانی ناوچەکە و، دژایەتیکردنیان بۆ بەخشینی هەر جۆرە مافێک پێی، کە ڕێگە بۆ سەربەخۆیی کوردستان خۆش بکات، زۆربەی چاودێرە و ڕاڤەکارە سیاسییەکانی ناوچەکە پێیان وابوو ئیدی ئەمریکا و گەلی کورد خۆیان لە قەرەی ئەم جۆرە بابەتە نادەن. بەڵام هاتنە سەرکاری تووندڕەوێکی وەک ئەحمەدی نەژاد لە ئێران و، بەرزبوونەوەی ئاستی دژایەتیکردنی نیشتەجێبوونی هێزەکانی ئەمریکا لە ناوچەکە و، پەرەسەندنی هەڵمەتی تیرۆریستەکان تا کار گەیشتە لەندەن و زۆرینەی وڵاتانی ڕۆژاوای خستە بەر مەترسی هێرشی تیرۆریستی، سەرەباری ئەوەی کە تا ئێستا هیچ جۆرە ئەنجامێکی ئەکتیف سەبارەت بە قەلاچۆکردنی تیرۆر لە عێراقدا بەدی ناکرێت. ئەم هۆیانە و چەندین هۆی دیکەی لاوەکی بوونە هۆی ئەوەی کە ئەمریکا پتر لە جاران پشت بە کورد ببەستێت و، جۆری هاوپەیمانییەتییەکەی لەگەڵیدا لە چوارچێوەیەکی کاتی - تەکتیکییەوە بۆ ئیستراتیجی - دوورخایەنەوە بگۆڕێت. ئەم گۆڕانی هاوپەیمانییەتییەی نێوان ئەمریکا و کورد، شتێکی ئەوەندە شاراوە و نهێنی نەبووە کە ناوەندە سیاسییەکانی جیهان و ناوچەکە هەستی پێ نەکەن، بەڵکو بە پێچەوانەوە، بابەتێکی ئەوەندە زەق بوو کە دەتوانرێت دەربڕینەکەی ئەم دواییەی "ڕەجەب تەیب ئۆردۆگان"، سەبارەت بە داننان بە کێشەی کورد لە تورکیا، بە یەکێک لە بەڕوبوومە دیارەکانی دابنرێت. ئەم وەڕچەرخاندنە لە هەڵوێستی یەکێک لە دوژمنە هەرە سەرسەختەکانی کورد لە ناوچەکەدا، ڕاگەیەندەری کۆمەڵێک پێشهاتی نوێیە لە ڕۆژهەڵاتی ناوین کە زۆرینەیان بە قازانجی دۆزی کورد دەشکێتەوە. ئەمریکا، کە ئیسرائیلی بە تەنها بنکەیەکی باوەڕپێکراوی خۆی دەزانی و، هەرگیز هیچ وڵاتێکی تری ناوچەکەی لەو ئاستەدا دانەناوە، تەنانەت ئێرانی سەردەمی شای گۆرپەگۆڕیش، وەک پۆلیسێکی پاسەوان بۆ ناوچەکە تەماشا دەکرد. سەبارەت بە تورکیاش، ئەوا دوو هۆکاری سەرەکی گرنگ کۆتایی بە پێگە و بایەخی ئەم وڵاتەی لەلای ئەمریکا هێنا، یەکەمیان، هەرەسهێنانی بلۆکی ڕۆژهەڵات و، کۆتایی هاتن بە ڕۆڵی تورکیا وەک قەڵغان و، ڕووانگەیەک بۆ سەر وڵاتانی ئەو بلۆکە. دووەمیشیان، چڕبوونەوەی تەوژمی ئیسلامی سیاسی لە تورکیا و، گرژبوونەوەی هەستی دژایەتیکردنی ئەمریکا و، سەرهەڵدانی چەند باڵێکی توند و تیژی وەک ئەلقاعیدە لە تورکیا، ئەم دوو هۆیە گرنگە بوونە هۆی ئەوەی کە واشینگتۆن چیدی نازی گرانی جەنەرالەکانی ئەنکەرە هەڵنەگرێت و، هێدی هێدی بە دوای بنکەی بە بایەختر و"ئێسک سووکتر"دا بگەڕێت. دەشکرێت ئەو کێشمەکێشەی نێوان ئەمریکا و تورکیا دەربارەی هەڵوێستێکی ڕەق و تۆندی کۆشکی سپی لە دژی هێزەکانیPKK، کە بە پێچەوانەی داخوازییەکانی ئەنکەرە کۆتایی هات، بە سەرەتایەکی ئاشکرا بۆ دەسپێکی ئیستراتیجییەتێکی نوێی ئەمریکا سەبارەت بە کێشەی کورد لە تورکیا. لەلایەکی تریشەوە، ئەمریکا هەرگیز پشتێکی قایمی بە وڵاتە عەرەبییەکانی وەک سعودییە و ئوردون و وڵاتانی کەنداو و، مەغریب نەبەستووە، چونکە باش دەزانێت کە سیستەمی سیاسی ئەو وڵاتانە لەسەر زەمینەیەکی لەق و جوڵاوە و، لە هەر کات و ساتێکدا بێت گۆڕانیان بەسەردا دێت. ئەمە و، دەشبێت ئەوە ڕەچاو بکرێت کە ئەم وڵاتانە ئەوەندە بوێرنین کە هاوپەیمانییەتی خۆیان لەگەڵ ئەمریکادا بە ڕاشکاوانە ڕابگەیێنن. هەر بۆیە لە گێژاوێکی لەم جۆرەدا و، لە دوای ئیسرائیلەوە، ئەمریکا تەنها دەتوانێت پشت بە کورد ببەستێت. ئەوەی کە مایەی تێڕوانین و بایەخی ناوەندەکانی ئەمریکایە، ئەوەیە کە گەلی کورد لە چل ملیۆن کەس پێکهاتووە و، هەر چل ملیۆنەکەش تینووی سەربەخۆیین و، ئەگەر بێت و ئەمریکا یارمەتییان بدات و، ئەم خەونە دێرینەیان بۆ بەدی بهێنێت، ئەوا خۆشەویستی و دۆستایەتی ئەو گەلە دەستەبەر دەکات. لێرەشدا ئەگەر بڕوانینە پرۆسەی دانانی دەستووری نوێی عێراق، دەبینین کە هەموو ئاراستە سیاسییەکانی عەرەب یەک دەنگ و، یەک هەڵوێستن لەمەڕ داخوازییەکانی گەلی کورد و، هەوڵی ئەوە دەدەن کە هەموو ئەو ڕێگەیانە بگرنە بەر کە کۆسپ دەخاتە بەردەم داخوازییەکانی گەلی کورد. سەرکردایەتی سیاسی کورد لەم قۆناغە هەستیار و گرنگە میژوویییەدا، دەبێت زۆر وشیارانە بزاوتە سیاسییەکانی ئەنجام بدات و، دەبێت لە هەموو کاتێک زیاتر داکۆکی لەسەر داخوازییەکانی گەلی کورد بکات و، نابێت هیچ جۆرە نەرم و نیانییەک سەبارەت بەو داواکارییانە نیشان بدات. میژووی نزیکی گەلی کوردمان باشترین بەڵگەیە بۆ ئەوەی کە سیاسەتی نەرم و نیانی لە بەرامبەر نەیارەکانیدا هەمیشە بە زیانی گەلی کورد شکاوەتەوە و، کاروانی سەرفرازی نەتەوایەتی ئەوەندەی تر دواخستووە. ئەمڕۆ کە هەموو بارودۆخەکە گونجاو و لەبارە بۆ گەلی کورد، کاتی ئەوە هاتووە کە سەرکردایەتی سیاسی کورد لەبری ئەوەی کە مانۆڕی سیاسی ڕازیکردنی ئەملا و ئەولا بەکاربهێنێت، تەماشای ئەزموونی تەیموری ڕۆژهەڵات و بۆسنە بکات. هەڵبەتە وانەکانی میژوو هەمیشە باس لە سەرکەوتنی ئەو کەسانە دەکەن کە لیست و ئاستی داخوازییەکانیان قورس و زۆر بووە، نەک ئەوانەی کە بە دەستێکی لەرزۆکەوە و، بە لیستێکی چەندین جار گۆڕاودا لەگەڵ نەیارەکانیان دادەنیشتن و دانو ستانێکیان دەکرد کە هەر لە سەرەتاوە ئەنجامەکەیان لە دەست دابوو. ■■■

نەخشەیەکی ئەمریکی بۆ دامەزراندنی دەوڵەتی کوردی

ڕۆژنامەیەکی عێراقی، ڕۆژی ٨/١١ ئەوەی بڵاوکردەوە کە ئێستا" ئەندامانی کۆنگرێسی ئەمریکی، ڕاپۆرتێکیان بە دەستەوەیە کە لە ڕاستیدا پرۆژەیەکە بۆ دامەزراندنی دەوڵەتێکی سەربەخۆی کوردی لە باکووری عێراق. ڕۆژنامەی "المؤتمر" زمانحاڵی کۆنگرەی نیشتمانی عێراقی کە ئەحمەد چەلەبی جێگری سەرەکۆمەزیران، سەرۆکایەتی دەکات، دەڵێت: لەگەڵ ئەو بەڵێنەش کە سەرۆک بۆش لە ٦/٢٦ی ڕابردوودا لە سەردانەکەیدا بۆ ئەستەنبوڵ بە سەرانی تورکیای دابوو، کە ئەمریکا یارمەتی تورکیا بۆ لەناوبردنی چالاکی کوردە جودا‌خوازەکانی پارتی کرێکارانی کوردستان، بدات، لەگەڵ ئەوەشدا، ئەندامانی کۆنگرێس، ڕاپۆرتێکی ترسناک تاووتوێ دەکەن، کە پرۆژەیەکی ئەمریکییە و هانی دامەزراندنی دەوڵەتێکی سەربەخۆی کوردی لە باکووری عێراق دەدات تا ڕێگە بۆ دەوڵەتی کوردستانی گەورە خۆش بکات. ڕۆژنامەکە ئەو وتەیەی گواستۆتەوە کە بە گوێرەی سەرچاوەکانی کۆنگرێس، ڕاپۆرتی ناوبراو لە لایەن سەنەتەری لیکزلینەوەی واشنگتۆن بۆ کار وباری خۆرهەلاتی ناوەڕاست، ئامادە کراوە. لە دریژەیدا دەڵێت:" ڕاپورتی ناوبراو، بە دریژیی باسی ئەو گۆڕانکارییە ستراتیژییانە دەکات کە ڕووەدەدەن لە حاڵەتێک کە ئەمریکا پشتگیریی دامەزراندنی دەوڵەتێکی کوردی بکات، بە گوێرەی ڕۆژنامەکە، ڕاپۆرتەکە "گەرەنتی بوونی دەوڵەتێکی هاوڕێ و هاوپەیمان بۆ وڵاتەیەکگرتووەکان و ئیسرائیل و هەروەها پەرەپێدان و وەبەرهێنانی سۆزی ملیۆنەها کورد لەگەڵ وڵاتە یەکگرتووەکان دەدات. لە ناوچەیەکی ستراتیژیی کە لە سەرەتادا چەند شوێنێکی گرنگ لە عێراق و لە داهاتووشدا ناوچە کوردنشینەکانی ئێران و تورکیا و سوریا بگرێتەوە، بە تایبەتی کە وڵاتە یەکگرتووەکان بەرەنگاری ڕق و کینەیەکی عەمیاربوو و گەشەسێنەری گەلانی عەرەبی بووەتەوە هەروەها ڕاپۆرتەکە باس لە گرنگی "دۆزینەوەی هاوپەیمانێکی ستراتیژی بۆ دەوڵەتی ئیسرائیل کە بێتە قوولاییەکی سیاسی و سەربازی و ئابووری و بازاڕێکیش بۆ کالاکانی. دەکات. ئەوەش ڕوون دەکاتەوە کە کوردەکان لە کرانەوە لەگەڵ ئیسرائیلدا هیچ گرفتێکیان نییە بەهۆی مێژوویەکی کۆنی پێوەندی و پشتگیریی سیاسی و سەربازی بۆ کێشەی کورد لە سەردەمی سەرۆکی کورد "مەلا مستەفای بارزانی"یەوە بە گوێرەی بڕچوونی ڕۆژنامەکە.

ڕاپۆرتەکە جەخت لەسەر ئەوە دەکاتەوە کە دامەزراندنی دەوڵەتی کوردستان؛ هێزێکی ستراتیژی و سەربازی ئابووری پێکدەهێنێ کە توانای دۆزینەوەی هاوسەنگییەکی ڕاستەقینەی هەبێت لە نێوان ئێران و دەوڵەتانی عەرەبدا. ئەمە جگە لە لاوازکردنی هەر ڕەوتێکی تۆندڕەو کە پرۆسەی دیموکراتیکردنی عێراق بیهێنێتە ئاراوە، هەروەها بەرەنگاربوونەوەی هەر ئەگەرێکی هاوبەندی ئێرانی و سووری لەگەڵ هەر لایەنێکی هاوسۆز لەگەڵ ئەم دوو وڵاتە کە بە هۆی ئەوانەوە دەسەڵات بگرێتە دەست.

ڕۆژنامەکە بەگوێرەی ئەو سەرچاوە ئاگادانەی کە زانیاریان پێداوە؛ باسی پێویستیی ستراتیژییەکانی دامەزراندنی دەوڵەتی کوردی لە عێراقدا دەکات، هەروەها باس لە وەرچەرخانی میژوویی لە شەڕی دژە تیرۆردا دەکات کاتێک کوردەکان بهێنرێتە ناو ئەم بۆ لاپەڕەی ٥

خۆپێشاندان لە شاری دوسلدۆرف بۆ پشتیوانیکردن لە ڕاپەڕینی کەلەکەمان لە ڕۆژهەڵات



دۆسلدۆرف ـ لوقمان بەرزنجی ـ لەسەر بانگەشەی ٩ حزب و ڕێکخراوی سیاسی و کەسایەتی وڵاتپارێزی کورد و ئامادەبوونی پتر لە ٥٠٠ کەس لە ڕەوەندی کورد لە ئەڵمانیا سەعات دوونیوی پاش نیوەڕۆی ڕۆژی ١٣ی ئەم مانگە خۆپیشاندانێک گەورە لەبەردەم باڵاخانەی پەرلەمانی شاری دۆسلدۆرف پایتەختی ویلایەتی نۆردراین فیست فالن ی ئەڵمانی سازدرا. بۆ پشتیوانکردنی ڕاپەڕینی گەلەکەمان لە ڕۆژهەڵات و ناڕەزای دەربڕین لەسەر هەڵوێستی سیاسەتی دەوڵەتی ئەڵمان و ڕاگەیاندنە گشتییەکانی ئەڵمان لە. چاوپۆشکردنیان لەسەر ئەو کارە دڕندانەی ڕژێمی کۆماری ئیسلامی ئێران کە دەرهەق بە گەلی بۆ لاپەڕەی ٧

شاری کۆڵن ی ئەڵمانیا گەورەترین بەیەک گەیشتنی لاوانی جیهان دەگرێتە خۆ



کۆڵن ـ لوقمان بەرزنجی ـ شاری کۆڵن لە ئەڵمانیا یەکێکە لە شارە هەرە جوانەکانی ئەڵمانیا، لە ڕۆژانی ١١ تا ٢١ ئەم مانگە گەورەترین بەیەکگەیشتنی لاوانی کاتۆلیک دەگرێتە خۆ. ئەم بەیەکگەیشتنەش ڕووداوێکی زۆر مەزنە سەبارەت بە کڵێسەی کاتۆلیک لە جیهاندا . وامەزەندە دەکرێت پتر لە ٨٠٠ هەزار لاو لە ١٦٠ وڵاتانی جیهان و ٧٠٠٠ قەشە و ٤٠٠٠ ڕۆژنامەنووس لە سەرانسەری جیهان ئامادەی ئەو بەیەکگەیشتنە بن .جێگەی وەبیر هێنانەوەیە ئەم بزنەیە بۆ یەکەمین جار پاپا یوحناپولس لە ساڵی ١٩٨٥ پێشنیاری بۆ کرد و یەکەمین بە یەکگەیەشتنیش لە ساڵی ١٩٨٦ لە ڕۆما هاتە گرێدان. ■■■

PEYAMÎ Kurd

Jimare 50 | Salli 1 | 19.08.2005

Rojnameyekî heftaney gistiye

Nexşeyekî Amrîkî bo damezrandinî dewletî Kurdî

Laparey 2

Raperînekanî rojhelatî Kurdistan le nêwan hokar û ancamda

Laparrey 2

40 MilyonKurd



çawerwany rageyandinî dewletî Kurdistanin

Laparey 2

قینۆس فایەق

عێراق، تازە بەکەڵکی کورد نایەت

ئەمڕۆ لە جاران زیاتر مەترسی نشوستی ئەزموونی دیموکراتی و فیدرالی لە عێراقدا کەوتۆتە ئاراوە، لە دوێنێ زیاتر لە ناو خەڵکدا دڵەڕاوکێ هەیە

لاپەڕەی ٦

حەمە سەعید حەسەن

مەلا و ئاسایش

دەزگای زاری کرمانجی کە تازەکی لە سۆران کراوەتەوە، لە ٢٠٠٥/٧/١٨دا لە جوندیان کۆڕێکیان بۆ ساز کردم، تێیدا باسی ئەو (ئازادی و دیموکراتی)یەم کرد کە لە سایەی ئیسلامدا هەبووە و هەیە.

لاپەڕەی ٦

پرسی بارمتەکردن و پێگەی کورد لەو نێوەندەدا..

خوێندنەوەیەکی کۆمەڵایەتی بۆ پرسی بارمتەکردن و رفاندن و دواتر ئازادکردنی تاک بەرامبەر بڕە پارەیەکی زۆر، لەڕوانگەی بەسەرهاتی کوردێکەوە.

لاپەڕەی٤

ئیسماعیل بێشکچی خەڵاتی کۆڕی زانیاری کوردی پێ بەخشرا

لاپەڕەی ٥

د. تاهیر حیکمەت یەکێک لە چالاکانی "هاودەنگ":

دردۆنگی وبێ باوەڕی بەیەکتر پێش بە پێکهاتنی بەرەیەک لە هێزە سیاسییەکان دەگرێت

بۆ لاپەڕەی ٨